

Nûbihar









KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



- ▶ Beriya her tiştî samîmiyet **Süleyman Çevik**
- ▶ Şîroveya Mem û Zînê ya Perwîz Cîhanî **Zana Farqînî**
- ▶ Bi Remezan Alan re hevpeyvîn **Ömer Faruk Yekdeş**
- ▶ Dîsan Ergatîv **Perwîzê Cîhanî**
- ▶ Ro ser zarawaya kirmanckî xebata gramerî
Amadekar: Ayhan Meretowar
- ▶ Abdurrahman Durre **Rahmetullah Karakaya**
- ▶ Günter Grass, qedirşinasî û em **Abdullah Încekan**
- ▶ Eşîrên Herêma Botan-IV **Eşîra Teyan**
M. Munir Timurtaş
- ▶ Welatê zehf tê bihîstin û kêr tê nasîn: **Dêrsim**
Murad Celalî
- ▶ Dendikên zebeşan **Mûrad Dildar**
- ▶ Bîna kulîlka sinçî **sidîq gorîcan**
- ▶ Serhildana Bedirxan Beg û şêxên **Neqşîbendî**
M. Nezîr Basneyî
- ▶ Di civatan de rewşa jinan: Zêna **Dr. Ömer Uluçay**
- ▶ Bîr û boçûnek li ser romana Kurdî... **Omer Dilsoz**
- ▶ Girî **Cemîl Denlî**
- ▶ Prof. Dr. Şukriye Resûl... **Abdulkim Gunaydin**
- ▶ Di çanda Kurdî de dawet **Dilazad**



Ji refên Nûbiharê!



Li ser navê Pak Ajans Yayınçılık
Ltd. Şti. (adına)

Xwedî û berpîrsiyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)
Süleyman Çevik

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş
Merkezi No: 22/29 Vezneciler/
Beyazıt - İstanbul
Tel&Fax: (0212) 519 00 09
www.nubihar.com
nubihar@gmail.com

Navnîşana Nameyan
P.K. 80 Fatih - İstanbul

Nûnertiya Almanya
Burhan Kaya
kizilkaya_burhan@yahoo.de
Tel: 0234 - 7922968

Kovara Nûbihar ji 3 mehan carekê;
Payîz, Zivistan, Bihar û Havînê
tê weşandin.

Berg û rûpelsazî
Dawud Rêbivîr

Çapxane
Alioğlu Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San.
Tic. Ltd. Şti Orta Mh. Fatih Rüstü
Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa/İST.
Tel: 212 612 95 59

Yayın Türü: Yerel Süreli

Berdêla abonetiya salane
Tirkiye: 25 YTL
Welatên din: 25 EURO, 30 \$

Jimareyên Hesaban
Hundirê Tirkiyê:
Postgiro (Posta Çeki)
Süleyman Çevik: 658265
Süleyman Çevik, İş Bankası Laleli
Şubesi: 1084-0363459
Derveyî Tirkiyê: Süleyman Çevik,
İş Bankası Yavuz Selim Şubesi:
1079-30100-3118770

Mesûliyetê ramanên
nivîsaran aîdê nivîsaran e.
Berhemên hatine şandin bi şûnê
mayen vegeztandin.

Beriya her tiştî samîmiyet Süleyman Çevik	5
Şîroveya Mem û Zînê ya Perwîz Cîhanî Zana Farqînî	5
Masî saloxê bejna te didan Rojen Barnas	11
Dîk Nizar Qebbanî	12
Remezana Alan: Rehên tedrîsata me hatiye qutkirin Hevpeyvîn: Ömer Faruk Yekdeş	13
Semaya zemîn û asman Huseyn Şemrexî	20
Dîsan Ergatîv Perwîz Cîhanî	21
Careke din li ser "hat" û "çûn"ê Zilkif Xweşhevî	27
Ro ser zarawaya kîrmanckî xebata gramerî Amadekar: Ayhan Meretowar	32
Seydayê Abdurrahman Durre û 'Kurdbname' Rahmetullah Karakaya	37
Günter Grass, qedirşinasî û em Abdullah Încekan	42
Yûsif Mahmûd Derwîş	44
Eşîrên Herêma Botan-IV Eşîra Teyan M. Munir Timurtaş	45
Welatê zehf tê bihîstin û kê m tê nasîn: Dêrsim Murad Celalî	50
'Eşqa Yezdan Hêsarek Pîrr Muhkem e Mewlana Celaleddînê Rûmî	52
Dendikên zebeşan Mûrad Dildar	53
Bîna kulîlka sinçî sidîq gorîcan	55

Nameya Bîst û Yekemîn	
Bediuzzeman Seidê Nûrsî	56
Şerm	
Mihemed Feraşînî	58
Newrozname	
Mesud Serfiraz	60
Ken fêrî min bike Kamran Simo Hedilî	60
Serhildana Bedirxan Beg û şêxên Neqşîbendî	
M. Nezîr Basneyî	61
Manqûrd	
Cengiz Aytmatov	65
Ez û tu	
S. Ahmet KAYA	69
Li ser Dewrêşê Evdî	
Abdulqadîr Gok	70
Di civata Kurdan de rewşa jinan: Zêna	
Dr. Ömer Uluçay	74
Cejn û xeyal	
Dilşad Mutî	77
Bîr û boçûnek çend-alî li ser romana Kurdî	
Omer Dilsoz	78
Hîrê rojê 'emrî	
Mehmed Elî Sadiq	81
Girî	
Cemîl Denlî	82
W. K. Merdimîn ra şîrî	84
Di mînaktiya Prof. Dr. Şukriye Resûl de jinên Kurd	
Abdulahkim Gunaydin	85
Beq û dûpişk	
Seyda Ronahî	87
"Çû", lê rêç hîn li wir in	
Hesen Polat	89
Bîbexşîne	
Osman Îzol	90
Di çanda Kurdî de dawet	
Dilazad	91
Rovî û qerraş	
Evdirehîm Çekîn	93
Ferhengok	95

ji editor

Beriya her tiştî samîmiyet

SÜLEYMAN ÇEVİK

ceviksuleyman@hotmail.com

Di van demên dawîn de piştî ku ji hêla dewletê ve li welatê me hinekî zemîne rehetiyê hate meydanê, em dibînin ku gelek derdor û cemeatên îslamî jî di vê bazarê de dezgehên xwe ava dikin.

Ev kesên ku berê tu heqên Kurdan qebûl nedikirin û daxwazên Kurdan bi “nîfaq”ê nav dikirin, îro meriv bi xebatên wan ên li ser Kurdan şaşmayî dimîne...

Di navbera gotin û kirinên wan yê berê û îro de ferqeke mezin heye. Helwesta gelek a berê li hemberî Kurdan û xwedîderketina wan a îro, tev bi hesab in.

Hem wê demê hem jî îro hinek hêzên serdest di meseleya Kurdan de li gor şertan û demê ji van kesan helwestek dipan, ewan jî helwest nîşan didan û îro jî didin.

Di guhertina meselên esasî de heta ku dewlet tiştê neke, xelkê Tirkîyê hinek tiştê nakin, hinek naxwazin bikin û hinek jî jixwe newêrin tiştê bikin. Berê dewlet pêşî li tiştan vedike, di meseleyên esasî de gavan davêje hê wê wextê xelk jî radibe li pey wan guhertinan dimeşe...

Di meseleyên wiha de dibêjin, gelo dewlet li vê meselê çawa

dinêre; yanê “meşrûbûn” yan jî “nemeşrûbûna” tiştê bi nêrîna dewletê kifş dibe. Ev sîstem, li ber çavê însanan dewletê miqedes dike, xwedî derdikeve û însana dike qurbana nêrîna xwe...

Ji roja ku ev dewlet ava bûye kesên ku dixwazin sîstema vê dewletê biguherînin û kesên muxalîf gelek kê m in. Ekseriyeta xelkê vî welatî rejîmê çiqas îznê bide ewqas li hemberî neheqiyên derdikeve û nerazibûna xwe dibêje. Binêrin, bi sedan neheqiyên ku dewletê li Kurdan kirine hene lê di civa-ka Tirkan de kê m kesan rabûye ev nexweşiyana anîne ziman. Lê dema dewlet pêşîya tiştê vedike, tu mêze dikî hema herkes li dora wê meselê dicive û lê xwedî derdikeve.

Meseleya me û van derdoran jî bi vî şiklî ye. Piştî ku ji hêla dewletê ve çend gav hatin avêtin, di meseleya Kurdan de sekna wan guheriyê. Heta dewlet tiştê neke tu qîmeta kirinê derdorên sivil tune. Meselen li universîteya Mêrdînê vebûna beşa Kurdî, weşana televîzyona TRT6ê û hinek tiştên din li ber çavê gelek kesan zimanê Kurdî “meşrû” kiriye.

Teqrîben 20 sal berê,
hê kesek di piyasa
îslamî de tunebû,
Nûbiharê aveke
berdabû coyekê. Wê
demê tenê ji Kurdên
îtaetkar re tehemûl
hebû. Em li ber çavên
kesên ku îro li Kurdan
xwedîtiyê dikin jî
“meşrû” nebûn

Li pey van hemleyên dewletê ew kesên ku newêribûn yan jî nedixwestin xwe nêzîkî Kurdî bikin û li hemberî Kurdî derdiketin îro yek bi yek dikevin piyasa Kurdî jî...

Hevalên ku teqîp kirine dizanin; ji sala 1992yan virde heta îro em kovara Nûbiharê û kitêbên Kurdî diweşînin.

Teqrîben 20 sal berê, hê kesek di piyasa îslamî de tunebû, Nûbiharê aveke berdabû coyekê. Wê demê tenê ji Kurdên îtaetkar re tehemûl hebû. Em li ber çavên kesên ku îro li Kurdan xwedîtîyê dikin jî “meşrû” nebûn.

Îro qismen ev nêrîn guheriye, lê li vî welatî civatên meqbûl ew in yên ku doza tu tiştî nakin.

Di wan salên 1990î de em li ber çavê gelek “nijadperest” û “maceraperest” bûn... Her merivên ku biqasî ji dewleta xwe hez dikirin, ewqas jî ji her xebata ku li ser navê Kurdîniyê dihate kirin nefret dikirin...

Îro dewlet û rayedarên wê, bi îmkanên dewletê ji bo Kurdî zemînê xebardana ava dikin. Di vî rêya ku dewletê vekirîye de hinek derdorên sivil jî dimeşin... Eger di vî rêyê de hinek kes ji bo xelkê me yê ku ji her alî ve mexdûr bûye tiştên baş bikin elbet emê pê kêfxweş bibin.

Lê eger di vî siyaseta de hesabên din hebin, eger ev siyaseta tenê ji bo tetmînkirina hisiyatên “Kurdên nav xwe” be, wê demê bivê-nevê ew kirinên wan wê di teraziya samîniyetê de mehkûm bibin.

Yan dilê wan çawa ye bila xwe wisa nîşan bidin, yan jî rûyê wan

çawa ye bila wisa dilê xwe jî paqij bikin...

Helbet emê nebin ji wan kesên ku ji bilî avakirinê tim xirab dikin; di derxistina pûçên hinek cemaetan de feydeyek jî tuneye. Lê xuyaye ku ev tevger tev bi hesab tên kirin. Lewra di nav wan de Kurdan nikaribû bi rehetî zimanê xwe xeber bida. Eger bi rastî jî li gor şertên biratiyê bi me re muamele bikirana, tehemûla wan biqasî “Tirkbûna” wan jî “Kurdûna” me re jî hebûya heqê me tunebû ku em îro rabin wan bixin teraziya samîniyetê.

Qiyasa berê û îro karekî zehmet e. Li gor resmîyetê di nav Tirkan de, li welatê Tirkiyê Kurd tunebûn. Zimanê wan, çanda wan û tarîxa wan welhasil her tiştê wan înkâr dibû lê ji xeynî çend însanên xwedîwîcdan pê ve tu kesî jî vî bêwîcdaniyê re dengê xwe dernexist...

Misliman bêdeng man, hinekan bi zaneyî hinekan jî bi nezani gotin, em bira ne û xwestin ku bi rêya biratiyê Kurd doza heqên xwe yê însanî nekin... Gelek Kurdên me jî bi rastî wisa fikirin ku eger Kurd bibin xwedîyê statûyekê wê misliman zerarê bibînin...

Xwedêgiravî maleke mislimanan hebû, Kurdan ew mala xirab dikirin; dema faydeyek bigîhana Kurdan wê ew mala wan xirab bibûya... Di “wekhevûna” Kurdan û milletên din de gelo çî zera milletên din hebû?

Her ku Kurdan doza heqê xwe dikirin ewan cubbeyê biratiyê li xwe dikirin... Kurdan xwe li cihên taybet yan jî li cihên resmî nikaribûn îfade bikirana.

Di nava van derdorên de cihekî îfadekirinê tunebû.

Li welatekî ku li ser navê Kurdî her tişt tehlîke yan jî dijmin bête dîtin, bi navê Kurdayetiyê meriv nikare xebatan bike.

Di salên 1990î de li ber çavê herkesî kesên li ser Kurdî dixebitîn tehlûke bûn û her merivî bi vî nezerê li Kurdan mêze dikir.

Dewletê Kurdî wekî tehlîke didît û her merivê civata Tirkan di dunyaya xwe de bi çavê rejîmê li Kurdan mêze dikirin.

Kurdê meqbûl ew kes bû ku doza heqê xwe nedikir; Kurdê doza heqê xwe dikir çawa li ber çavê dewletê merivê bi tehlûke bû li ber çavê hezkarên vî rejîmê jî wisa bû...


Heta ku dewletê ew perdeya qedexekirinê li ser Kurdî hinekî ranekir, mislimanên Tirkiyê ji bo Kurdan, zimanê Kurdî tu xebatên wan nebûn.

Bi xebatên ku me di wan salan de dikirin em li ber çavên wan “meşrû” nebûn. Loma Nûbihar li gor wan “nijadperest” bû. Tiştê ji xwe re “meşrû” didîtin, dema me bikira dibû “nîfaq”. Ne ku em problem bûn, nêrîna wan, mêtîyê wan problem bû.

Îro em çiqas serbilind bin heqê me ye... Lewra ji wê demê heta îro bi kirinên xwe me samîniyeta xwe îspat kiriye.

Her hevalê ku xwe nêzîkî Nûbiharê dibîne, serbilind be...

Serbilind be, lewra piştî bîst salan gotina te derket..●



Şîroveya Mem û Zînê ya Perwîz Cîhanî

ZANA FARQÎNÎ

Ehmedê Xanî, berhemên wî, ramanên wî, bîr û baweriyên wî û kesatiya wî ya wêjeyî û ramanî, nemaze di van deh-pazdeh salên dawî de hîn bêhtir tîr nîrxandin û li ser van waran jî xebat, lêkolîn û berhem tîr amadekirin. Bi taybetî der barê ramanên Ehmedê Xanî de angaştên ji hev cuda tîr derpêşkirin. Bi gotîneke din ku em bibêjin; nivîskar û lêkolîner li ser Xanî û şahesera wî *Mem û Zînê* xwedîhizir û fikirên cihê ne. Ev yek jî tiştê gelek balkêş û girîng e ku divê bala meriv lê be.

Îcar ez bi xwe hez nakim ku li ser vê rewşê rawestim û van cudahiyan diyar bikim. Daxwaza min tenê ew e ku ez bi çend xalan li ser xebata birêz Perwîz Cîhanî bisekinim ku bi navê “*Mem û Zîn, Ehmedê Xanî; şîroveker: Perwîz Cîhanî*” bisekinim ku Weşanên Nûbiharê ev berhema navborî ya balkêş û girîng çap kiriye.

Perwîz Cîhanî demeke dûr û dirêj li ser berhema nemir a Ehmedê Xanî xebitiye û gelek nusxeyên wê vekolane. Nivîskar bi awayekî klasîk pêşî ma-

likên (beytên) berhemê dide, dûre bi sernavê “hevberkirin” jî cudahiyên heyî yên di navbera nusxeyan de nîşan dide. Piştî vê bi navê “peyvnasî” îcar peyv, têgih û qalibên berhemê rave dike. Di peyvê re jî di bin sernavê “Ciwankarî” de hunerên wêjeyî yên di berhemê de diyar dike û nimûneyên vê yekê dide xuyakirin. Piştî van hemiyan îcar nivîskar bi navê “şîrove” li ser malikên pêşkêşkirî şîrove û nîrxandinên xwe dike. Bi awayekî giştî hêja Cîhanî bi vê rêbazê berdehamî bi xebata xwe daye û pê de çûye. Li dawiyê berhemeke xwedî qewareyeke 1048 rûpelî derxistiye holê.

Min bi xwe ji serî heta binî ev berhem xwend û jê tiştin not girtin. Herweha min ji xwe re ji aliyê bêje û biwêjan ve jî, jê nêçîr kir. Heta min hin peyvên ku ji min re biyan bûn, ji birêz Perwîz Cîhanî re şandin da ku ji min re wateya wan aşkera bike. Mala wî ava, daxwaza min jî bicih anî.

Min daxuyand ku ezê bi çend xalan li ser vê xebata balkêş û

Ezê hewl bidim ku bi çend sernavan vê yekê diyar bikim. Pêşî ji aliyê ziman ve, jixwe gava ez kîjan berhemê bixwînim, ez bikim nekim bal û dêhna min diçe ser zimanê wê

**Ji bilî Perwîz Cîhanî kesî weha ev
lêker rave nekiriye û bi qasî ez dîsan
dizanim û gelek melayên me vê wek
gêrîn an jî gerîn bi lêv dikin ku ew bi
wateya lêkera bûnê ye**

hêja bisekinim, niha ezê hewl bidim ku bi çend sermavan vê yekê diyar bikim. Pêşî ji aliyê ziman ve, jixwe gava ez kîjan berhemê bixwînim, ez bikim nekî bal û dêhna min diçe ser zimanê wê. Loma ezê pêşî bi mijara zimên dest pê bikim.

Ziman

Ez mamoste Perwîz Cîhanî zûde ye dinasim û haya min pir-hindik ji ramanên wî yên li ser zimanê Kurdî (nemaze Kurmancî) heye. Hin angaşt û îdiyên wî hene ku bi rastî ez tevî wan nabim. Ji bilî vê yekê, mamoste bi devoka xwe dinivîse û li ser awayê vekîta xwe anga rastnivîsa xwe jî birijd û îsrar e. Ji bo zelalbûna van gotinên hanê ezê jêgiraneke ji nivîsa wî ya vê xebatê (rûpel 15) bidim ku nav ev e:

“Nasandana wan Mem û Zînên ku min wek jêder wec jê girtiye.

Min ev pirtûka li ber deh jêderan û daneberheva wan rûnivîsî kiriye. Ew deh jêderên min evane ne.”

Jixwe rêzdar Perwîz Cîhanî di berhemê de, bi navê ‘Rênivîsa vê Pirtûkê’ (rûpel 13) dibêje ku ‘*Min li nivîsîna vê pirtûkê da ji rênivîsa latînî ya ku bi navê Mîr Celadet Bedirxanî hatiye nasandinê, lê li berî wî li nav Kurdên Qafqazê da dihate bikarbirinê da, wec wergirt.*’ Ji van gotinan û awayê vekîtê ve xweş diyar dibe ku birêz Cîhanî li ser çî rê û rêbazê ye. Herweha min divê ez tiştêkî aşkera bikim, jêgiraneke (îqtîbasên) ji vê xebata Cîhanî, bêyî ku ezê destê xwe bidime wan veguhêzim nav nivîsê.

Li aliyê din ji bilî ku zêde îtîbar bi devoka xwe ya herêmi dîke, di zimanê wî de jî hevgerînek nîne. Ez jî bo vê rewşa hanê jî çend peyvên wek nimûne derpêş bikim:

ajewe-ajeve, aşkera eşkere/eşkera, avêt-avît, awir-avir, belaw kirin-belav kirin, bigewde- bigevde, diyargeh-diyarge, kewin kevin, navend- nawend,

neynûk neynik, paqij-paqîş, piştîvan-piştîwan, ruske-riske, şargeh-şarge, vexon vexwin, xo-xu

Digel van yekan, hin peyvên hevpar ên Kurdî û Farisî bi awayê zimanê Farisî bi kar anîne û tevî zimanê xwe kirine. Çend mînak:

nadiyar (nediyar), napak (nepak), narewa (nerewa), naferman (neferman), naşîrîn (neşîrîn), abrû (birû)... Min bi taybetî di nav kevanekê de awayên peyvên ên bi Kurdî nîşan dan da ku ez balê bikişînim ser wan. Di Kurmancî de li şûna pêrkîta /-na/ya Farisî em pêrkîta /-ne/ya Kurmancî bikar tînin; wekî *nexweş, nezan, neçar, nemêr* û hwd.

A rast ji aliyê ziman ve, anga ji aliyê vekîtê û rêziman ve ez dikarim gelek mînakan bidim ku şaş in û hewce nake ku mirov li serê nîqaş jî bike, te divê mirov bi alfabe û rastnivîseke cuda jî binivîse. Herweha nabe ku mirov li gorî devokeke herêmi jî rastnivîsa zimanekî çêke.

Di warê ziman de min divê ez li ser çend xalên girîng ên din jî rawestim û ramana xwe aşkera bikim. Yek jê nivîsîna /bê-/yê ye ku bi awayê /bî-/ya Farisî hatiye nivîsandin. Birêz Cîhanî, ji hemû kesên ku wan Mem û Zîna Xanî veguhastiye ser alfabe ya Kurdî ya latînî, cuda tevgeriyaye û /bê-/ya Kurdî ya ku pê rengdêr tê çêkirin, kiriye wek /bî-/ya Farisî, bi mebesta ku xwedêgiravî ew hîn xwestir li wezna helbestê tê. Herweha birêz Perwîz Cîhanî di rûpela 420an a xebata xwe de, dibêje ku ‘*Xanî li seranserî Mem û Zînê da li cihê bê ya Kurdî bî ya Farisî bi kar biriye.*’ Tiştê ku ez dizanim her du deng jî (anga /ê/ û /î/) dengdêrên dirêj in û pevguherîna wan, wezna helbestê têk nade.

Em jî berhemê, malika 240î (rûpel 226) wek mînak hildin vir:

Da xelq nebêjîtin ku ekrad

Bî me’irifetin bi esil û buniyad.

Min dest neda rastnivîsa malikan, min hema ew wisan hildan û nivîsî. Bala we kişandibe ne /bê-/ lê /bî-/ hatiye tercîhkirin ku min ew reş kiriye. Li aliyê din, ji ber ku bi /bê-/yê rengdêr tê çêkirin divê ku bi peyvê ve be. Lê cihê hatiye nivîsandin. Carinan jî ev /bê-/ wek xwe hatiye hiştin. Malika 241 (rûpel 228) jî weha ye.

Enwa’île milel xudankitêbin

Kurmanc tenê di bê’hisêbin

Di vê malikê de /bê-/ hatiye tercîhkirin ku min ew reş kiriye û tiştê din jî ev e ku îcar bi dabirê (apostrofê) hatiye veqetandin. Di van her du malikên nimûneyî de şaşiyên vekîtê jî hene. Gerek ew weha bûna.

*Da xelq nebêjtin ku ekrad
Bêmerîfet in bêesl û binyad.
Enwa'ê milel xwedankitêb in
Kurmanc tenê di bêhisêb in*

Xaleke girîng jî ev e ku birêz Cîhanî di malika “*Da xelq nebêjtin ku ekrad/ Bî me'irifetin bi esil û buniyad*”, li şûna /bê-/yê /bi/ bi zanebûn tercîh kiriye û ku dibêje awayê” *Bême'irifetin bêesil û buniyad*” şaş e. Ez bi xwe qet tevî vê ramanê nabim ku ji aliyê mantiqa zimên ve şaş û hele ye. Bi awayê mamoste Cîhanî be, wateya hevokê têk diçe û daxwaza Xanî ew e ku bide diyarkirin Kurd bimerîfet in û biesil û binyad in.

Mijareke din jî mijara diyarkera /di/yê ye ku hêja Perwîz Cîhanî der barê vê de xwedî ramanê cuda ye. Mamoste li ser vê yekê di rûpela 96an de, di bin sernavê “*Peyvnasî*”yê de weha dibêje. Bêyî ku ez dest bidim zimanê wî, ez vê beşê hildim vir:

'Di: de, amîrek ji amîrên peywendê ye. Ev amîra li dû navên pirane, yên rewşdar û xudandar ra tê û wana û rewşnavên wan û xudanên wan bi hev va girê dide. Weke: kiçên di/de cuwan, kurrên di/de jêhatî. Ev amîra zortir li devokên dewrûberên Mehabadê weke, devoka Menguran da maye. Li devoka Badînan da jî zortir weke; 't' tê rabêjkirinê. Weke: kurrêt baş.'

Nemir Celadet Bedirxan hem di Hawarê de hem jî di xebata xwe û ya Roger Lescot de behsa vê mijarê kiriye. Di Hawarê de gotiye ku /di/ tenê ji bo rewşa pirjimar tê bikaranîn. Lê îcar di xebata xwe ya muştêrek de diyar dike ku ev diyarker (artîkel) hem ji bo rewşa yekejimar hem jî pirejimar tê bikaranîn.

Li hêla din ev diyarker di hin devokên Kurmançî de tê bikaranîn û nemaze di stran û kilamên gelêrî de ev /di/ xweş tê dîtin. Em dikarin kilamên şahê dengbêjan Şakiro wek nimûne bidin ku di gelek kilamên wî de ev yek heye: *Wekî kilameke li ser Geliyê Zîlan a Şakiro ku tê de dibêje “Saet şeşê di şevê bû.”* Dîsan mîna kilama Gula Ermenî û Hecî Mûsa Beg,



ku Gulê dibêje “*Ez nayê ser dînê di îslamê.*” Jixwe di berhemên me yên klasîk de jî tê dîtin, ku yek ji wan Mem û Zîna nemir Ehmedê Xanî ye.

Îcar ev forma /di/ di devoka Kurdên me yên Behdînan de çawan ku hêja Cîhanî diyar dike wekî /-êt/ derbas dibe; mîna *hevalêt me*. Di devoka Kurdên me yên Qefqasiyayê de jî mîna /-êd/ e; wekî *lawêd padişê*. Em baş pê dizanin ku hevalên di min, bi ser hev de civiyaye ango bi ser hev de çûye û bûye *hevalêt min*. Forma din jî dîsan ji ber qewam û rûdanên di zimanê devkî de ketiye vê rewşê.


Ev diyarkera me di zimanên Ewrûpî de jî heye ku di Îngilîzî de /the/ û di Almanî de jî /der/ û /das/ e.

Xaleke din a girîng ku mamoste destkarî lê kiriye û bi ya min fikira wî hele û şaş e, lêkera gêrîn e ku di hin malikan de wekî xwe maye. Mînakek ji malika 81ê (rûpel 144):

*Hazir wî dibû meqamê me'lûm
Ger xadimê wî digêrrî mexdûm*

Di heman rûpelê, di bin sernavê “*Peyvnasî*” de lêkera gêrînê weha rave dike: “*digêrî: dikî (belkî jî dikirî be, bi wateya tu dikî. Xanî li gelek cîhan da li cîhê ku bêje tu dikî, dibêje tu dikirî, yan li cîhê ku bêje bû, yan hate kirinê, dibêje kiriya.)*”

Tiştê ku ez pê dizanim û agahdar im, ji bilî Perwîz Cîhanî kesî weha ev lêker bilêv nekiriye û bi qasî ez dîsan dizanim û haya min jê heye, gelek



melayên me vê wek gêrîn bi lêv dîkin ku ew bi wateya lêkera kirinê ye. Ango digêrî mexdûm, yanî dikî mexdûm e. Li ser vê yekê jî ez beşdarî raman û hizirên hêja Cîhanî nabim.

Di bin vî sernavî de ez dixwazim dêhn û balê bikişînim ser ravekirina şaş a hin peyvan e jî. Em pêşî malika 238an (rûpel 224) bidin:

Safî şemirand vexwar durdî

Manendê durrê lisanê Kurdî

Lêkera şemiradin, hemen di bin malikê de, di beşa peyvnasiyê de weha rave û îzah kiriye: “Şemirandin: dûr havîtin, firredan, rijandin- şumurandin: hejmartin, hesap kirin.”

Dîsan di malika 660î de (rûpel 412) şemirandin derbas dibe. Pêşî em malika nimûneyî bidin piştê em bala xwe bidin ravekirinê.

We zû şemirand ji bo çi sersal

Hûn rast bibên ku bûye e'hwâl

Di beşa peyvnasiyê de îcar ravekirin weha ye: “Şemirandin: kutakirin, dest jê kişan.”

Ev lêker gelek baş tê zanîn û bikaranîn, ku wateya wê jî terikandin, terk kirin, dev jê berdan e. Heta peyveke din jê hatiye çêkirin ku ew jî mişemir e û tê maneya metrûkeya Erebi.

Peyva din jî heyşet e ku di malika 1321ê de (rûpel 651) dibihure.

Naçar ji heyşetê diçû dûr

Hemderd dibû digel şetê kûr

Peyv ji aliyê birêz Cîhanî ve weha hatiye ravekirin: “Heyşet: hewş, mal û avadanî, gund û bajar.”

Ev peyva navborî di hin nuxseyan de wek hêşet

jî derbas dibe (bnr Ehmedê Xanî Mem û Zîn, Şîrove û Kurdiya îro: Jan Dost, Weşanên Avesta, r. 397). Ez wateya hêşetê weha dizanim: 1. kenar, taxa kenar, taxa li biniya kelê 2. ava, cihê şên 3. sed, bend.

A rast der barê ziman, gramer, vekît û wateya peyvan de gelek tiştên ku bîn gotin û mirov li ser wan bisekine, di xebata hêja Perwîz Cîhanî de hene. Tenê ji bo ronîkirin û zelalkirinê min xwest ez van çend nimûneyan derpêş bikim û li ser wan ramana xwe diyar bikim. Niha jî dixwazim derbasî mijareke din bibim.

Berginda peyvan

Hêja Cîhanî di bin sernavê “peyvnasî” de peyv, term, têgih, qalib û biwêjên ku di Mem û Zîna Xanî de dibihurin dest nîşan kirine û bergindên wan ên Kurmancî dane. Bi gotineke din, ji bo zelalkirina wan peyvan ku bi piranî ew bi Erebi û Farisî ne Kurdiya wan dane û ji xwîner û xwendevanan re ravekirine da ku beyt baştir bîn fehmkirin û mebesta Xanî jî bê zelalkirin. Jixwe ev terzeke xebata li ser klasîkan e.

Lê bi ya min diviya ku kok û eslên peyvan bihatina diyarkirin, maneyên wan ên rast û mecazî bihatina xuyakirin û dîsan bihata aşkerakirin ku ka di metnê Kurdî de ew bi kîjan wateyê hatine bikaranîn. Di xebatê de hebûna vê beşê baş e, lê belê ez wisan difikirim ku qels maye. Xwezî hîn berfirehtir bûya ku ez dizanim mamoste Perwîz Cîhanî li ser ferhenga Kurdî jî dixebite û ji vî warî agahdar e û şareza ye jî.

Kîteya malikan

Em tev dizanin ku hejmara kîteyên (heceyên) Mem û Zînê deh (10) e û birêz Cîhanî jî di xebata xwe de, hîn di destpêkê de dide xuyakirin ku kêşeya Mem û Zînê bi behreya hezec e û bi awayê “mefûlo, mefa'êlon, fe'ûlon” e.

Lê mixabin ku hejmara kîteyên beytên Mem û Zînê yê latînkirî hev nagirin. Hejmara kîteyan geh ji dehan kêm geh jî zêde ye. Bi dayina çend mînakên naskirî ez dixwazim balê bikişînim ser vê rewşê. Pêşî malika 216an (rûpel 212).

Ez mame di 'hikmeta Xudê da

Kurmanc di dewleta dinê da

Rêzika pêşî deh kîte ya diduyan jî neh kîte ye. Diviya ku rêzika pêşî jî deh kîte bûya û hevgirtinek di nav nîvmalikan de hebûya.

*Bifikir ji Ereb heta ve Gurcan
Kurmanç çî bûyne şubhê burcan.*

Ev malika 220 (ji rûpela 214) e û rêza pêşî yazdeh kîte ya duyemîn jî neh kîte ye.

Ez malikeke din derpêş bikim ku me ew li jorê di mijara ziman de dabû:

*Da xelk nebêjtin ku ekrad
Bî me'irifetin bi esil û buniyad.*

Rêzika yekem xwedî neh kîteyan û ya duyem jî xwedî sêzdeh kîteyan e. Em dibînin ku zêde pûte bi tîpguhêziyê nehatiye dayin û gava malik ji alfabe ya Erebî li alfabe ya Latîni ya Kurdî hatine veguhastin, di warê hejmara kîteyan de hevgirtinek çênebûye.

Sadenekirina sernavên beşan

Birêz Cîhanî her beyt şîrove kiriye û li ser peyvên wan sekiniye, lê çî heyf ku qet dest nedaye sernavê beşên Mem û Zînê. Bi rastî sernav hewceyî ravekirin û sadekirina zimên in, da ku xwîner bi hêsanî bikaribe ji wan fêm bike. Lê mixabin mamoste têkilî wan nebûye.

Herweha mamoste li hin deveran bi rîya telmîhê, mesela bal dikişîne ser hedîs an jî ayeteke Quranê. Pêşî bi tîpên Erebî wê dide paşê Kurmançiya wê dide. Lê carinan tenê bi Erebî daye û qet kurmançiya wê nedaye, heta carinan tenê dibêje ku ev ayet e ji Quranê û ev gişt bi herfên Erebî ne. Kesê ku nikaribe tîpên Erebî bixwîne, yan bi Erebî nizanibe dê bikaribe jê sûd wergire gelo? Bi ya min ev rewş kêmasiyeke gelek mezin e ji bo vê xebatê. Hemin pêwîst dîtiye ayetê binivîse, diviya bû ku wergêra wê ya bi Kurdî jî bidaya. Ji bo vê yekê ez mînakekê bidim. Di rûpela 276an de behsa ayeta 54an a sûreya Maîde dike. Ev ayet bi Erebî hatiye dayin, lê kurmançiya wê nehatiye dayin.

Şîroveya hin malikan

Bi taybetî min bala xwe da şîroveyên hin malikan bê ka birêz Perwîz Cîhanî çawan ew şîrove kirine. Hemin gotin hat ser şîrovekirinê ez hez dikim bibêjim ku tiştêkî gelek asayî ye ku her kes bi

Birêz Cîhanî her beyt şîrove kiriye û li ser peyvên wan sekiniye, lê çî heyf ku qet dest nedaye sernavê beşên Mem û Zînê

awayekî cuda nêzîkatî li mijaran bike û tiştên cuda derpêş bike. Bi gotineke din, kî çawan bixwaze dikare wisan bibîne. Her kes li gorî zanebûn û paşxaneyê xwe diyardeyan analîz dike û digihije hin raman û baweriyên. Digel vî qasî dîsan min xwest ku ez hizira nivîskar hîn bibim bê ka ew çawan wan dinirxîne.

Ji van çend malikên nimûneyî, ku min ew bi zanebûn ji bo nivîsa xwe hilbijartin, malika pêşîn, malika 218 (rûpel 213) e. Malik ev e:

*Wan girt bi şîrî şehre şohret
Tesxîr kirin biladê himmet*

Birêz Cîhanî diyar û aşkera nake bê ka ew şehre şohret kîjan e. Tenê bi awayekî serkî dadixuyîne ku mêrxasên Kurdan bi şûr û mêrxasiya xwe bajarên binav û deng zeft kirine. Lê mamoste Perwîz ji bo malika 225an (rûpel 216) a “Kurmanç dibin bi xûn mulettx/ Wan jêk vedikin misalê berzex” dibêje ku Xanî îşaret bi şerê Çardêranê dike. Gelo em jî nikarin bibêjin ku qest ji “Şehre şohret” bajarê Qudsê ye ku Selhedîne Eyûbî ew ji xazçarêzan stendibû?!

Niha ezê sê malikan li dû hev derpêş bikim (malikên 615, 616 û 617, ku di rûpelên 397 û 398'an de ne) û pêşî ezê şîroveya birêz Cîhanî bidim, paşê ezê nirxandina xwe li ser wan bikim.

*Serraf eger bibîte Buqrat
Texmîn biketin bi weznê qîrat
Bazar biket ji bo Felatûn
Mecmû'ê xezayinê di Qarûn
Sunma semenê di wan nigînan
Nabit bi wuqûfê dûrbînan*

Li gorî Cîhanî ev Buqrat ne ewê bijîşk û hekim e, Buqratekî din heye ku ew jî endazyar e û pirtûkek li ser matematîkê nivîsiye. Divê em bibêjin ku ji bilî Cîhanî her kes li ser fikira hevpişk e ku ew Hîpokratê hekimê Yewnanî ye. Herweha ji bo Eflatûn (Platon) jî dibêje ku ew fîlosofê binav û deng ê Yewnanî ye. Herweha mamoste dîsan diyar dike (binêre rûpel

Cîhanî hunerên wêjeyî yê wêkî teşbîh, mecaz, kînaye, îstiare, îham, telmîh, cînas, teşxîs û mubalexe bi mînakan radixe ber çavên xwîneran

398) ku “Peyvên Hîpokrat, Platon û Qarûn telmîh in ji bo serhatî û çîrokên wan kesane.”

Gelo em tenê dikarin weha bi serkî ji van malikan behs bikin û bibêjin ku Xanî hema wisan ew nav bi kar anîne? Bi ya min na, divê em baş di van malikan bifikirin ku ev nav hemû bi mebest û armançê hatine bikaranîn. Nav giştî sembol, remz û hêma ne. Îcar li gorî Cîhanî gustîlên di destên Memo û Tacdîn de (ku ya Memo morî û ya Zînê yaqût, ya Tacdîn şûşeya bilorîn û ya Stiyê jî elmas e û wan bi hev guhartine), evîna madî û manewî dinimîn. Cîhanî dide xuyakirin ku gustîla yaqût ku rengsor e, evîna manewî û ya elmas jî ku rengspî ye, evîna madî û cîhanî temsîl dikin.

Divê mirov bipirse, li gorî tesewufê, divê evîna manewî di ser a madî re be, nexwe çima nemir Xanî nîrx û qîmeta van her du gustîlan bi hev re, bêyî cudahiyekê, dinirxîne û dibêje li gorî kesên zana yê dûrbîn hemû xezîneyên Qarûn nake heşt-yeka bihayê van gustîlan! Xanî Baba bihayên van ji hev cuda nekiriye.

Herweha divê mirov li ser gotina heşt jî bisekine, bê çima hejmara heşt hatiye bikaranîn. Divê em bibêjin ku birêz H. Mem, di xebata xwe ya “Mamosteyê Sêyemîn Xanî” de li ser van hêmayan zêde serê xwe êşandiye û ew analîzeke weha dike ku li gorî sistema ramanî ya îslamî heşt sembola bihiştê û dîsan li gorî hesabê ebcedê nîşana dinyayê ye. Herweha sedema ku ji bo Platon bazara van gustîlan tê kirin jî ev e ku em dizanin Platon xwedî teza dewletê ye, lê belê di dewlata wî de, hêmanên azadî û dadê kêman. Yaqût û elmas hêma ne û yaqût azadiyê ku rengê azadiyê jî sor e, elmas jî dadê (edaletê) ku rengê wê jî spî ye, dinimîn. Ango eger ev her du hêman jî di dewletê de hebin, ew dewlet dibe wêkî bihiştê, yan jî ew dewlet hêjayî dinyayê ye.

A rast ez dikarim çend malikên din jî der barê vê mijar û dabaşê de pêşkêş bikim ku di wan de

navên Arîsto (Erestetalîs) û Platon (Eflatûn) derbas dibin, ku bi ya min Xanî bi zanebûn û bi mebest ev nav di şahesera xwe de bikar anîne û ew gişt hêma ne.

Ciwankarî

Di bin vî sernavî de ez dixwazim hinek ji mijara hunerên wêjeyî yê ku di Mem û Zînê de hene behs bikim ku mamoste bi hostayî ew tespît kirine û bi mînakan ew derpêş kirine. Di çend xebatên li ser Mem û Zînê de ez rast hatim ku ji vî warî hatibû behskirin û nimûne jî hatibûn dayin. Ez bi xwe heta niha leqayî berhemeke welê nehatime ku weha bi berfirehî, bi kitekit li ser hunerên wêjeyî yê di Mem û Zînê de, hem jî bi Kurmancî hatibe sekinandin.

Cîhanî hunerên wêjeyî yê wêkî teşbîh, mecaz, kînaye, îstiare, îham, telmîh, cînas, teşxîs û mubalexe bi mînakan radixe ber çavên xwîneran û vî aliyê hunerî yê Xanî bi me dide zanîn ku bê çawan ew di warê hunerên wêjeyî de jî çiqas xurt û şaraza ye.

Daxwaza min ji birêz Cîhanî ew e ku xwezî ev mijar tenê wek xebat û berhemeke cihê bihata amadekirin. Bi rastî berhema wî gelek xwedî hecm e û ev mijar bi ya min di nav vê rewşa hanê de winda bûye. Digel her tiştî, dîsan jî ev beş wek xebateke cihê bi ya min divê bê amadekirin û dê baştir balê bikişîne ser xwe û ez hewce dibînim.

Kesatiya Xanî

Mijareke din a ku bêhtir li serê tê nivîsandin û nîqaş li serê tê kirin jî, kesatiya Xanî ye bê ka ew fîlosof e an na. Li ser wesfên wêkî mutesewif, ramanger, mamosteyê pêşîn, helbestkarê neteweyî, bav û hîmdarê ramana neteweyî, şairê ramanwer hema bibêje ku lihevkiyaneke giştî heye. Lê çawan me diyar kir, der barê fîlosofbûna wî de di navbera wan kesan de yê ku li ser Xanî xebat û lêkolîn kirine, hin cudahî hene. Mamoste Perwîz Cîhanî jî yek ji wan kesan e ku dibêje Xanî ne fîlosof e, lê arif e.

Digel vî qasî birêz Cîhanî di bin sernavê “Gelo Xanî fîlosof/fîlosof, sofî, yan arif bûye?” de (rûpel 34) dibêje ku “Xanî der barê zanista felsefeyê de

melevanekî bêheval bûye û berdewam dike ku dema mirov li hizir û bîrên xwe yê felsefî û ayînî radigihîne meriv pê dihesse ku ew ne filosof, ne sofî belkî arif e.”

Lê ez jî dixwazim pirseke weha bikim aya kesekî arif çawan dikare bibêje:

*Ez mame di hikmeta Xudê da
Kurmanç di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm.*

Mijara tesewif û felsefeyê bi ya min hewce ye mirov ji kesên pispore û otorîteyên wan waran re bihêle. Pêwîst e ku berhemên Ehmedê Xanî ji van aliyan ve bi temamî bîrên vekolîn û nirxandin û encamek ji wan bê derxistin. Tenê min divê ku ez bibêjim tesewif ji felsefeya Yewnan a kevnar bi temamî ne serbixwe ye.

Encam: Min xwest bi çend xalan vê xebata girîng li gorî zanîna xwe binirxînim û nirxandinên xwe bi nivîseke weha aşkera bikim. Tiştê gelek asa ye ku xwendinên mirov ji hev cuda bin û der barê berhemên weha de mirov bigihêje ramanên cihê. Bi gotîneke din çawan mafê nivîskar û lêkolînerê heye ku bi nêrîn û perspektîfa xwe berhemê analîz bike, her wisan mafê xwîner jî heye ku der barê wê xebatê de bibe xwedîraman û hizirekê û li gora xwe wê binirxîne û rexne bike.

Min jî xwest piştî xwendina xwe ya li ser vê xebata balkêş ramanên xwe aşkera bikim û li gorî zanebûna xwe balê bikişînim ser hele û şaşîyan, ser nakokî û ramanên daner û nivîskar. Gotina dawî; spas û mala te ava Perwîz Cîhanî, dest û pêçiyên te terr bin ●

Masî saloxê bejna te didan

Rojen Barnas

Masî saloxê bejna te didan
Ji dema avjeniya d’Avaşîn
Û hîva çardeşevî bi ser te de xwar
Ji hesûdiyê piçekî şermîn.

Min binê avê didît, wekî neynik
Derzî lê xuyan dibû ji zelalî
Û gava te kezîyên xwe dida alî
Geştêrkên zindî bûn, li te gûzik.

Astxîka ermen yezda evînê
Afrodîta yewnan mirariya deryaza
Bereder bûn ji ber Meryema Nesran
Nexwe, wê b’ heyranî, bihatina dîtîne.

Masî saloxê bejna te didan
Hê didin...
Hê didin...
Û hê jî didin.

Dîk

Nizar Qebbanî*

Ji Erebi: Selman Dilovan

Li taxa me dîkek heye
yekî sadîst û xwînrêj
her sibeh
pirtikên mirîşkên taxê ji wan dîke
nikulan li wan dide
diçe ser wan
berî wan dide
wan terk dîke
û jixwe nayê bîra wî navê çîçikan

Li taxa me dîkek heye
her sibeh diqîre
mîna Şemşûnê hêzdar
riya xwe sor berdide
şev û roj li serê me dixê
di nav me de diaxive
di nav me de distirê
di nav me de zinayê dîke
ew e yekê bi tenê
yê ku her bimîne
hêzdar û hukimferman

Li taxa me, li wir dîkek heye
yekî belakir û faşîst
xwediyê fikrên Nazî
dizî desthilatdarî bi tankan
dor girt li azadiyê, li azadîxwazan
welatek ji holê rakir
gelek ji holê rakir
zimanek ji holê rakir
bûyerên dîrokê û
çêbûna zarokan ji
ji holê rakir navê kulilkan

Li taxa me dîkek heye
di cejnên neteweyî de

li xwe dîke cilên generalan
xwarina wî doxînsistkirin e
vexwarina wî doxînsistkirin
û ji doxînsistkirinê serxweş dibe
siwar dibe li gemiyên ji laşan
û têk dibe artêşên ji xeyalan

Li taxa me dîkek heye
ji eslekî Erebi
fetih kir cîhan bi hezarê jinan

Li taxa me, li wir dîkek heye
yekî ummî û nezan
pêşvaniya çend çeteyan dîke
qet hîn nebûye
ji bilî şer û bêbextiyê
çandina heşîşê
û hîleyên veguhostina peran
cil û bergên bavê xwe difirotin
gustîla daweta xwe rehîn datanî
û didizî didanên mirriyan

Li taxa me dîkek heye
temamê hunera wî
ku berê şexwera xwe ya şer
bide serê peywan
Li taxa me dîkek heye
yekî bi hêrs û teredînî
rojêkê weke Heccac diaxive
dimeşe bi pozbilindî mîna Me'mûn
diqîre di minareya mizgeftê de
"yê pak û bêqisûr ez im ez
dewlet ez im, qanûn jî ez"

Ma wê çawa baran li me bibare?
çawa yê simbil şîn bibin?

xêr bi ser me de bê
û bereket çêbibe?
ev welatek e ne Xwedê;
lê dîk in lê hukimferman

Li welatê me
dîkek diçe, dîkek tê
û zordestî her eynî zordestî ye
têk diçe hukmekî Lenînî
êrîş dîke yekî Emrîkî
û însan e her ku dibe qurban

Dema dîk di sûka gund re
bi kubarî dimeşe û liba dîke
pirtikên xwe yên nazenîn
dibiriqin li ser milên wî
beratên şerê azadiyê
hingê hemî mirîşkên gund
bi heyrantî diqîrin
„yê dîk! mezinê me, mîrê me
ey generalê doxînsist, fehlê
meydanê!

tu hezkiriyê ber dilê milyonê jinan î
pêdiviya te heye gelo
bi cariyeyekê
bi xizmetkarekê
yan bi masaja laş û can?"

Dema ku sultan ev çîrok bihîst
emrê cellad kir ku dîk serjê bike
û bi dengêkî bi hêrs got
"çawa dîkek ji dîkên taxê
dîke ku desthilatdariyê bistîne ji min?
çawa diwêre ev dîk?
ez im yekê bi tenê
ez im yê bêşîrk!"

* Nizar Qebbanî (21.03.1923 Şam – 30.04.1988 London) di nav şairên modern ên Ereban de yek ji yên herî girîng e. Wî pir rexne li civat û mentalîteya Ereban girtiye, loma jî pir nîqaş li ser hatine kirin. Piştî ku li Zanîngeha Şamê huqûq xilas kiriye, weke sefir li bajarên Beyrûd, Qahîre Madrid û Londonê xebitiye. Di sala 1966an de dev ji sefiriyê berdaye û wexta xwe ji peşvan û şîrê te veqetandiyê ku hê di şazdehsaliya xwe de dest pê kiribû. "Dersa weneçêkirinê", "Dîk", "Nan, Heşîş û Hîv", "Belqîs" (Li ser kuştina jina xwe ku bi bombê hatê kuştin) ji şîrên wî yên navdar in. Ummî Kulsûm û gellek stanbêjên din şîrên Nizar Qebbanî kirine stran.



REMEZAN ALAN: Rehên tedrîsata me hatiye qutkirin

HEVPEYVÎN: ÖMER FARUK YEKDEŞ

Remezan Alan yek ji wêjevan û rexnegirê Kurdî ye. Xeynî helbestên wî ku di kovarên wek *Nûbihar* û *Nûdemê* de hatine weşandin, romanek wî bi navê *Saturnê* di sala 2002an de di nav Weşanên Avestayê de derketiye. Di ber van de li ser teoriya edebiyatê û romanê xebatên wî hene û di van waran de lêkolînên wî bi zimanê Tirkî û Kurdî di kovaran de weşiyane. Lê di salên dawî de wî dev ji Tirkî nivîsînê berdaye û tenê bi Kurdî dinivîse. Alan parêzerê fikra bi Kurdî nivîsîn, avakirina zimanek entelektuel û akademîk e. Bi min ev, wesfa wî ya xweser e. Alan di 2009an de xebatên xwe yê ku paldayê bingehek teorîk in di pirtûkeke bi navê *Bendnameyê* de berhevkeriye û di nav Weşanên Avestayê de weşandiye. *Bendname* ji 21 nivîsan pêk tê. Nivîsên wî -ji edebiyata klasîk bigire heta edebiyata modern, ji helbestê bigire heta romanê, ji nivîskar bigire heta xwendevanan- li ser mijarên curbicur bin jî, bi gotina nivîskar meriv dikare wî xebatek “li ser rihê edebiyata Kurdî” binirxîne. Em li ser *Bendnameyê* û bi wasîta wê li ser edebiyata Kurdî bi Remezan Alan re axivîn:

Ömer Faruk Yekdeş: Hûn di *Bendnameyê* de balê dikişînin ser Kurdî-nivîsînê. Em lê dinihêrin dema ku li ser Kurdan tiştêk tê nivîsîn, dibe ku ji ber daxwaza nivîskarê ku bê teqdîrkirin an jî bê fêmkirin, bi zimanê biyanîyan, li Tirkîyê jî bi Tirkî tê nivîsîn. Di vê rewşê de Kurdî-nivîsîn dibe tercihek. Hûn di nivîsa xwe ya "Reddiyeya Mînorîyekê" de balê dikişîne ser vê û dibêjin, "Ewê ku bi Tirkî, bi zimanekî biyanî dinivîsîn; di heman demê de bi 'em' an 'me'yeke dîtir, di nav afdiyeteke biyanî de diaxivîn, dema dibêjin edebiyata me, şairê me, berhemên me" qesta wan ne edebiyata Kurdî ye. Hûn li xwe jî mikur tînin û dibêjin, "ez jî demekê di nav wê 'em'a biyanî de çûm û hatim". Niha pirsê min a ewil ev e, hûn di kîjan pêvajoyê de ji 'em'a dîtir vegehrînin 'em'a Kurdî, keremê kin serboriya xwe di vî warî de ji me re bibêjin.

Remezan Alan: Wekî gelek Kurdan ez jî di nav edebiyat û zimanê Tirkî de mezin bûm heta demekê, min jî tesîra xwe ji wê mufredatê girt ku ziman û edebiyata xwe dida hînkirin û hezkirin. Ev hezkirin elbet ne bi awayekî xwezayî bû, lê encam û serencama wê bi rengekî xwezayî dixebitî. Ji ber wê yekê wekî gelek kesan min jî di destpêkê de bi Tirkî nivîsand û vê yekê jî heta demekê dom kir. Tu jî dizanî ku di van salên dawîn de gelek sebeb çêbûn ku mirov vegere ser rehê xwe, li ser hebûna xwe ya şexsî û kolektîf bikeve nav pirs û gumanan. Ez dibêjim qey nîfşê min zêdetir bi vê yekê re rû bi rû man. Axir piştî demekê, ku nêzikî dozdeh salane, ez jî li zimanê xwe vegehrîyam. Min got



tiştê ez dinivîsim çima bi Kurdî nebe? Kurdî jî rê û mecal hene ku mirov pê binivîse. Carina ji ber halê mecbûr nebe, hema bêje ev dozdeh sal e, ez xebatên xwe bi Kurdî didomînim. Elbet ev "vegera li xwe", ne tiştêkî hêsan e, pêvajoyeke gelek bi jan û sancû ye jî. Ji ber ku tu car din xwe di her hêlê de saz dikî, epîstemolojîya xwe diguherîni, tiştê li ser navê dîrok û heqîqetê hînbûyî cardin di ber çav re derbas dikî... Teşbih xelet nebe, mirov kirasekî nû li xwe dike, kirasekî ku em û meya wî cihê ye... Ev e di vê pêvajoyê de ye ji bo nasnavê nû kirpeke taybet û jidil dikeve nav terkîba edebiyata me, zimanê me, herweha dîroka me... Tu yê bêjî ew nasnav her daîm ne li ber destan e? Belê, lê ger te ew ji bîr kiribe an tu asîmîle bûbî ango tu ji tesewwira wî dûr ketibî, wê demê sitara te em û meyeke din e. Min got ya, bixwe-hesînê re tu xwe diguherîni û nivîsandina bi zimanê xwe jî destpêka herî baş a wê xwe-hesînê ye. Ez dibêjim serboriya min kêr zêde bi vî rengî ye.

Ö.F.Yekdeş: Dema we di nava edebiyateke biyanî de, bi emek dîtir dinivîsî we biyanî-

bûnek, xerîbiyek hîs dikir yan ev rewş ji we re xwezayî dihat? Wê demê haya we jê hebû ku ew kiras, kirasekî xerîb e?

R. Alan: Na, na, min niha got ku di vê pêvajoyê de tiştêkî masûmane jî heye. Di vê pêvajoyê de tu gelek caran bi xwe nahesî ku tu guheriyî, ruhê te guheriya an hatiye dizîn. Piştî ku firsend çêdibin û tu pê dihesî ku tu jî çand, ziman û nijadek din têyî, ew xwezahiya mel'un têk diçe. Belê di pey re kêfxweşiyek, he-wildaneke enerjîk, daxwaza guhertina dinyayê jî rû dide... Lê dibe ku di wê demê de tu şoqek jî derbas bikî, lalîtiyek jî li te bi-qewime...

Ö.F.Yekdeş: Dema we ya lalîtiyê jî çêbû?

R. Alan: Na, ji aliyê ziman de avantajê min a weha hebû ku di malbata me de piranî Kurdî dihat xebardan. Li navçeyê me zimanê sîkakê jî Kurdî bû. Belkî dema me televizyon seyr dikir, me maç mêze dikir an em diçûn mektebê ziman dibû Tirkî. Ji lalîtiyê qesta min tiştêkî mecazî bû, dûçarbûna bi şoqeke çandî û nasnavî bû.

Ö.F.Yekdeş: De baş e, piştî ku we dest bi nivîsandina Kurdî kir yekemîn pirtûka we romana bi navê *Saturn* bû. *Bendname* pirtûka we ya duyemîn e. Piştî berhemek edebî, we berhemek jî derbarê rexneya edebiyatê de nivîsî. Hûn di pêşgotina *Bendnameyê* de dibêjin, "hêvî ew e ku ev bend, ji bo rexneya ku her kes ji "tunebûna wê" gazinan dike, bibin destpêkek". Di nivîsa "Berterefkirina Kêmasiyekê" de jî, hûn ji hunermendê Kurd gazinan dikin, ya rast hûn ji qismekî wan

Qesta canê her tiştê me hatiye kirin. Dema bi vî meqamî be, pir normal e ku hinek jî rabin û bi endîşeyên civakî û kolektîf tevbigerin. Û bixwazin karekî wisan pêk bînin ku bi wî karî kêmasiyeke edebî bê berterefkirin.

gazindê dîkin ku xwe wek rêveker an jî pêşeng dibînin. Ev meseleya “destpêkê” pişt re jî îddiaya pêşengî û rêvekeriyê çi ye?

R. Alan: Hema bêje her xebat, ji bo edebiyata me destpêkek e. Nexasim ji bo edebiyata me ya nûjen û cureyên wê. Hele rexne, ji hemûyan zêdetir li vî qalibî rûdinê. Mirov di vî warî de çi binivîse, dê di nav terkîba “destpêkê”ê de cihê xwe bigire. Elbet li parçeyên din ên welêt em zelal nizanin ka çi hatîye nivîsandin. Lê halê hazir, di nav wan tiştên ku heta niha hatîye nivîsandin de, em dibînin ku rexne qîsmekî pir hindik cî digire. Gerçî *Bendname* rasterast ji metodên rexneyî an tenê ji metodên rexneyî hereket nake, lê dema min ferq kir ku tê de rehên rexneyê jî hene, min bi xwe re dît ku ez bibêjim “hêviya min ew e ku bendên wê ji bo rexneya Kurdî bibin destpêkek”.

Ku em bêne ser pîrsa du-yem... Ew rêvekerî an pêşengxwazî, hinek jî ji karakterê edebiyata Kurdî tê. Ger zimanê vî edebiyatê nehata qedexekirin, zeîfkirin an bêrewackirin, dê girseyeke mezin a ku ji qabîliyeta hunermendiyê bêtir bi endîşeyên kolektîf mucehhez e derneketa holê, û me yê jî evçend qala wan nekira. Li vir elbet ez behsa du aktorên edebiyata Kurdî dikim. Yek nivîskar e. Ev aktor kêma zêde

tê nasîn. Lê yê din (ewê ku da’wa rêvekerî û pêşengiyê dike) zêde nayê nasîn. Min di kitêbê de jê re “nivîsende” got. Nivîsende kî ye? Nivîsende ew kes e ku pariyek bi mebest û armançê dest davêje pênûsê. Dema dinivîsîne hêviyên wî yên rojane û pratîk ji nivîsandinê hene. Ka ew berhem dê bi kêrî çi bê? Dê fonksiyoneke çawa îcra bike? Pişt re jî dibe ku ji bo edebiyateke ku hatiye derengxistin, perçiqandin, pêpêskirin, bibe mîna keke pêşîn... Îcar di vî helwestê de ji endîşeyên afirîneriyê bêtir, endîşeyên kolektîf û nasnavî hene ku ji uslûba edebî bêtir peyama zimanekî fonksiyonel girîng dibe. Û elbet wek encamekê jiholêrakirin û berterefkirina kêmasiyekê derdikeve pêş. Ka min bi berhema xwe tiştê ku di edebiyata min de nehatiye xebitandin an kêma hatiye xebitandin, min pêk anî an na!.. Elbet hebûna vî aktorî jî ne ji ber xwe ye. Me gava din got, li ser xetê normal nîne serboriya me. Qesta canê her tiştê me hatiye kirin. Dema bi vî meqamî be, pir normal e ku hinek jî rabin û bi endîşeyên civakî û kolektîf tevbigerin. Û bixwazin karekî wisan pêk bînin ku bi wî karî kêmasiyeke edebî bê berterefkirin. Lêbelê bi vî refleksê ilûzyonek jî çêdibe. Mirov dibêje qey bi rastî jî bi vî helwestê kêmasiyek ji holê hatiye rakirin û mirov jî bûye lehengê vî

serkeftinê. Halbûkî ji bo edebiyatê tiştê muhîm ne miqdar û kemiyet e; wesf e, wesfekê edebî yê ku mirov jê razî ye.

Ö.F.Yekdeş: Mirov dikare bêje hinek têrkirina arzûyên şexsî jî di vî helwestê de rol dileyîze.

R. Alan: Bêguman ew jî tê de, lê ez dibêjim qey bêtir bi vî endîşeya kolektîf ve girêdayîye, lê divê mirov li hemberî tiştêkî daîm şiyar be. Endîşeyên kolektîf jî dema di nav pîvanên edebî de nehatibin ziman, wê demê derdê wan jî nayê kişandin. Ji ber wê yekê ew kesên ku bi çavê pêşeng û rêvekerî û rêberêkî edebiyatê li xwe dinihêrin, divê mirov îcraata wan hinekî bi guman bişopîne. Ji bo ku edebiyateke bi rêkûpêktir, ev guman jî şert e.

Ö.F.Yekdeş: Mamoste, we behsa nivîskar û nivîsendetiyê kir, ez dixwazim ji wir werime vira. Bi rastî jî dema ku min pirtûk (*Bendname*) xwend, bawerîya min bi Kurdî zêdetir çêbû ku ew tovê zimanekî zanistî di xwe de dihevine. Qet nebî di warê ilmê civakî de bi asanî pirtûkên teorîk bi Kurdî dikarin bêne nivîsîn. Lewre zimanê *Bendnameyê* bi min têra xwe bi rêk û pêk û afirîner bû. Hûn di nivîsên xwe de gelek têgehên zanistî bi kar tînin. Em bêjin *gotinzanî*, *gotinokza*, *vegotin*, *vebêjer*, *nîşanek*, *binyatgerî*, *netewperwera çandhez* çend heb ji van têgehên in. Hûn van têgehên ji ku derê digirin an jî li ser çi bingehê wan diafirînin.

R. Alan: Ez dibêjim heta mirov mecbûr nemîne, mirov hewara xwe nagihîne van gotinan. Bikaranîna van gotinên ha jî, bi rastî di warê ragihandinê de an

axaftina rojane de gelek asteng in. Ji ber ku hinek jê hîç nehata ne bikaranîn, wek bêma'ne jî têne ber çavên mirov. Ev têgeh kengê bivênevê dibin? Dema ku mirov dikeve ser rêya teoriya edebiyatê an li gor disîplîneke edebî tehlîlan dike... Wê demê têgehên bi vî rengî tîn di hembêza mirov de rûdînen. Lê divê mirov bihemete be. Lewra ji aliyê gotinên çêkirî de tecrubeyeke me ya têt-bedel çêbûye. Îro gelek gotin hene ku mirov dibêje ev ji ku hat, heta mirov nikare ji hinekan re kokekê jî peyda bike. Di vî xebatê de hin têgeh ji ber mecbûriyetê hatine çêkirin, lê hinek jê jixwe rûniştî ne, mesela wek vebêjer, vegotin... Nivîsênde an ji bo strukturalîzmê binyatgerî, mirov dikare van bide rûniştandin. Jixwe ji aliyê ve mirov mecbûr e jî. Hin war, xwediyê repertûarekê ne. Lê belê ji bo ku zimanekî fêsih carna mirov destê xwe nede wan dê çêtir be ez dibêjim.

Ö.F.Yekdeş: Lê belê dema min ev yek got, mebesta min ne rexne bû. Bi min, ji bo firebûna ziman, afirandina hinek kelîme û têgehên ilmî zerûrî ne. Mesele li vir, ka ev kelîme û têgeh li ser çi kokî tîn avakirin û gelo koka ku kelîme li ser têt avakirin maneya ku têt qest kirin di xwe de dihewîne an na? Mesele min xwendina xwe ya teorîk bi zimanê Tirkî kiriye, lê dema min nivîsên we xwendin, piraniya têgehên ku we bi kar anîne bê zehmetî min fêm kirin. Mesele min negot binyatgerî, an jî vebêjer ji ku tîn û têne kîjan maneyê. Lewre dibêjim yekî eleqedarê van mijaran dema van têgehên bibîne, bi rehetî dê têbigihêje ka ev têne çî ma'nê û

bibîne ku karê afirandina kelîme û têgehên bi serketiye. Ev yek jî ji bo pêşketina ziman pêdiviyek e. Ziman tiştêkî statîk û sekinandî nîn e. Li vir dixwazim, pîvanên we yên di afirandina têgehên de çî ye, wana hîn bibim.

R. Alan: Ew têgeh du sê heb ne têt de, yek jî ne malê min e, jixwe gelekên wan tîn bikaranîn. Belkî zêde nayên bikaranîn, ew jî çî diqewime? Ancax dema tu derbasî warekî taybet dibî û di wî warî de hin tesbîtan dikî bi kar tînî. Îcar ew têgeh quweta xwe çiqas ji tradîsyona ziman bigirin, xwediyê kokekê bin, ewqas baş e. Dema di xwendinê de, xwendina pêşîn de werin fêmkirin ser seran, ser çavan. Lê belê dema dudilîyek çêbû, divê mirov lê binêre. Mesela ku mirov îro li ser zimannasiyê bixebite, jixwe mirov mecbûr e hin têgehên biafirîne. Lê dîsa jî ezê bibêjim kok pir muhîm e. Kok, quwetê dide wê têgehê ku bijî. Dîsa jî wekî ku min got çend heb ne têt de, yek jî ne malê min in.

Ö.F.Yekdeş: Mesela beriya we kesên ku nivîskar û nivîsênde bi kar anîne hebûn?

R. Alan: Qesta te bêtir "nivîsênde" ye. Ez dibêjim tune bûn. Na, hebû, di xebata Hesênê Metê de hebû. Dema wî hin çîrokên gelêrî dabûn hev, li ser "Nivîsênde: Hesênê Metê" nivîsandibû. Dema min nivîsa Roland Barthes xwend, min ev têgeh, wek "nivîsbend" bi kar anî. Piştê ji ber van endîşeyên han, min got mirov tiştêkî heyî bi kar bîne, mirov maneyeke duyemîn lê zêde bike, rêyêke maqûltir e. Hesênê Metê ew di maneya "berhevkar" de, berhevkarê

ku dîsa jî kedek lê xerc dike, ji bo uslûbê karkeriyekê dike kar anîbû. Min jî wek maneyeke duyem, di şûna "écrivant/yazman" de kar anî, di şûna wî kesê ku ne uslûbeke wî heye û ne jî tenê endîşeyên wî yên edebî hene.

Ö.F.Yekdeş: Niha jî dixwazim em hinek li ser zimanê pirtûkê, di heman demê de jî li ser zimanê rexneyê bisekinin. Em dikarin bêjin yek ji problema rexneyê şêwaz û zimanê wê ye. Gelek nivîskar balê dikşînin ser hişkbûna zimanê rexneya edebî. Hûn di xebata xwe de, li aliyêkî têgehên rexneya modern bi kar tînin, bi şêwazekî zanistî dinivîsin, li aliyê din jî di xebateke zanistî de gotin û mînakên gelêrî bikar tînin. Mesele dema hûn balê dikşînin ser fikra nivîskarekî dibêjin, "me bi darê Jusdanis girt û got", dema behsa kolajê dikin dibêjin, "li ser qumaşekî kevin pîneyên îroyîn hene", dema hebûna nivîskar û tunebûna xwendevan destnîşan dikin dibêjin, "afir heye lê ker tuneye." Li ser zimanê rexneyê hûn dixwazin çî bêjin?

R. Alan: Ji aliyê vegotina mecazan de Kurdî gelek hatiye xebitandin û gelek jî mînakên wî hene. Çî edebiyata devkî, çî jî ya nivîskî... Çîra mirov jê îstifade neke? Dema mexsed serwestkirin be, carna tu dikarî di nivîseke teorîk de jî hewara xwe bigihîni van mecazan. Mirov dikare jî guhnasiya van bêjeyan û ta'ma wan a folklorîk sîd wergerre. Lêbelê mirov nikare nivîseke teorîk tenê bi alîkariya wan li ser piyan bihêle jî. Dibe ku ji ber hindîkbûna wan û di cî de bikaranîna wan xweşî te çûbe.

Lêbelê tenê bi wan têgehan, mirov nikare metnan şîrove bike, li ser wan vegotîneke teorîk ava bike. Belkî cureya "ceribandinê" guncavtir e ji bo têkeliyeke wîsan. Lê dema em ji ceribandinê derbasî tehlîlekê bûn, wê demê zimanê vegotîneke pariyekî mirûz-tahl û notr dikeve dewrê.

Ö.F.Yekdeş: Belê niha dixwazim li ser rexneriya we bisekinim. Hûn di pêşgotinê de dibêjin "ez xwedriste me". Xwedriste tê çi maneyê, bandora xwedristebûyînê di şewaza rexneriya we de çi ye?

R. Alan: Niha wek tu ji dizanî Seydayê Xanî di kitêba xwe de dibêje, "ez ne perwerî me xwedriste me". Di vê gotinê de qedereka giştî jî heye. Ne tenê ji bo Xanî, ji bo peyrewên wî jî xêzkirina qederekê heye. Çi ye ew qeder? Em ji temarê xwe yê herî zindî û jîndar hatine qutkirin. Hin îstisna çêbûne di nav dîrokê de, lê belê wîsa li ser xetke domdarî me fîretê nedîtiye ku em ji dibistana seretayî heya medreseyê (bi qewlê îro heya zankoyê) xwe perwerde bikin ango bêne perwerdekirin. Lewre jî her kes di quncikê xwe de, ka çi ji destê wî hatiye, xwe bi xwe, wek otodîdaktekî xwe perwerde kiriye. Hinek di wê maneyê de min bi kar anî. Ku tu bi vî çavî lê binêrî, em tev jî xwedriste ne, otodîdakt in. Ji mektebekê, ji ekolekê nayên.

Ö.F.Yekdeş: Bê ekolbûyîn, ji mektebekê nehatin, tesîra wê li ser nivîskar û rexneran çi ye?

R. Alan: Ew bi xwe re fîretetek jî tîne. Ji ber ku xwedristeyî, mirov hinekî wêrek dike, cûretê dîde mirov ku mirov tiştên radi-



kaltir bibêje. Bi qewlê Edward Said amatorî, ji mereq û keşf-kirinê re vekirî ye û elbet zêdetir nêzîkî wijdanekê ye... Lê belê wekî gelek rewşê, di vê rewşê de jî dualiyek heye. Bi qasî enerjîya mereq û keşfê, sî û gûmanek jî heye li ser gotinên te. Ji ber ku di xwedristeyiyê de bivênevê ne kemilandinek, ne temambûnek heye. Lê me got, ev ne ji me di-qewime. Rehên tedrîsata me hatiye qutkirin û em wek qederekê bi perwerdehiyeke xwebixwe re rû bi rû mane. Yanê xwedristehiyeke ku şagird û mamosteyên wî heman kes in. Ev qeder di dema Xanî de jî wîsan bû, ev e piştî wî ewqas sal jî wîsan e. Belê di vê qederê de îmkân jî hene; wek wêrekîyê, mereq û daxwaza keşfê... Lêbelê wekî ku me got ji bo karekî wek rexneriyê binê şik û gumanekê jî xêz dike. Çima wîsan dibêjim? Ji ber ku îro rexnerî, bêtir wek karekî akademîk tê qebûlîkirin. Ew kesên ku di vî warî de pêşve diçin tu lê dinihêrî serborîyeke wan a akademîk heye. Belkî di vî aliyê de nivîsên me pariyek vê bêtalîhiyê di xwe de dihevine. Bi vê balkişandinê ("Ez xwedriste

me"), belkî jî dixwazim bibêjim, hêza van nivîsan jî û qelsiyên wan jî ji eynî qederê ne.

Ö.F.Yekdeş: Me li ser rexneriyê xeber da, em bi wê dewam bikin. Di nivîsa bi navê "Daxwaza Nivîsandinê, Roman û Wek Xwendevanek Jina Kurd" de hûn saîqa nivîsandina Kurdî wek berterefkirina kêmasiyekê dibînin û dibêjin ku romana Kurdî ji tipîktîyeke dîrokî û ekonomîk quwetê nagire, bi gotîneke din romana Kurdî ne tekamuleke xwezahî ye, navê mudaxeleyeke rewşenbîrî ye? Di vê çarçoveyê de hûn rexneriya edebiyata Kurdî bi çi awayî dinirxînin?

R. Alan: "Berterefkirina kêmasiyekê" di vê kitêbê de wek temayek li ber çavan hatiye girtin. Bi rastî jî rehek wîsan di edebiyata Kurdî de heye. Jixwe ew reh dibe sedem ku ne nivîskar bêtir nivîsê de derdikevin pêş. Dema ku we fonksiyonek wîsan pêk anî, ji metnê bêtir helwesta we bi serê xwe dibe tiştê pîroz û hûn dibêjin, binêrin min ev kêmasî ji holê rakir û ev yek bes e ku ez bibim fîgûreke serkeftî. Elbet me kêliya din jî hinek behs kir, ev ne qaîdeyekî edebî ye. Ji ber ku we "çi" nivîsandiye jî ne muhîm e ji bo edebiyatê. We "çawa" nivîsandiye, we çi tiştên nû lê zêde kiriye, hûn çiqas serkeftî ne li gor pîvanên estetîkî. Lêbelê me got, di berterefkirinê de helwest û armanc derdikeve pêş. Îcar ev helwest bêguman rexnerkirina metnan hinekî zor dike. Ji ber ku di vê yekê de hem qedereke kolektîf heye û hem jî ev yek bi hêrs û hesabên nivîsê de ve girêdayî ye. Eger

li hemberî we hêz û îqtidarek hebe, gotibe, welah zimanê we tune, hebe jî tiştêkî ne resen e, bermayîyê zimanên din e, hûn nikarin bi vî zimanî çîrok û romanên binivîsin hwd... Wê demê jixwe ev refleksa ha, berterefkirina kêmasiyekê, dê bibe tiştêkî zerûrî. Li pişt perdeya, li paşxaneyê ve refleksê hinek ev yek heye. Li hemberî wê red-diye dijminane tezekî dijber jî radişe pê. Lewma rex-nekirina van metnan hinekî zor e. Mirov dudil dibe. Gelo ezê li pey kîjan pîvanan bikevim? Ezê tenê metnê li ber çavan bigrim, di nava metnê de biaxivim, diyalogekê daynim, ji aliyê estetîkê ve metnê şirove bikim?.. An derî metnê, ew şert û mercên ku wê metnê diafirînin jî enstrûmanek in? Yanê peywendiya metnê jî, ku îro jê sosyolojiya edebiyatê afiriye, muhîm dibe. Nexasim, dema hûn milletekî bi vî rengî bin, her tiştê we demekê hatibe qedexekirin û tunekirin, û ancax di demên nêz de hebûna we hatibe qebûlkirin, lê ew jî ne bi teqdirkirineke jidil, lêborîneke jidil, wê demê ew refleksa bergirî dê li ber destê we be. Dema ku rewş jî ev be, hûn hinekî din berpirsiyar dibin ji karê xwe. Wê demê hûn dibêjin lazim e ez neheqiyê li kesî nekim. Jixwe em tev xwedriste ne, em hemû wek hev in... Dibe ku nivîskarên Kurd jî metnên baş nexwendibin, belkî jî faydeya metnên mezin mehrûm mabe... Wê demê hinekî awirekî musamahakar li vir peyda dibe. Lê ev yek jî ne bawer im rêyeke rewya be.

Ö.F.Yekdeş: Ji gotinên we tê fêmkirin ku xwedristetî û

berterefkirina kêmasiyekê du problemên serekeyê estetîkî û hunerî ne di edebiyata Kurdî de. Ji bilî van, sedemên din çi ne ji bo wê pirsgerêkê?

R. Alan: Sedem pîr in elbet. Lê mirov dikare sedemên din jî wek binbeşên van sedemên sereke rêz bike. Mesela mufredatê edebiyatê çawa ye? Edebiyata ku em hîn bikin, ew kesê ku bi wê mufredatê bûn hezkarê edebiyatê û pişt re jî roj hat dest avêt pênûsê, ew kesê jî metnên çawa îstifade bike? Ji ber ku nivîsandin hinek jî tiştêkî muessîr e. Tu tesîr digirî, lê tu jî dixwazî bibî dengêkî xweser. An li hember dinyayê, bi hebûna xwe ya şexsî an kolektîf, tu dixwazî bersîveke xweser bidî... Jixwe di sayîqên nivîsandinê de tiştên wisan hene. Lê belê ka dê ev daxwaz çawan bikevin şiklekî edebî, modelên wî dê çi bin? Ev bi serê xwe pirsgerêkek in, elbet dîsa bi bêmektebbûnê ve girêdayî ne. Lê îro em bêjin fîrsetên cihê jî çêbûne. Mese-la Tirkî çiqas zimanekî serdest be jî di heman demê de îmkanên zimanekî biyanî ye jî bo ku mirov xwe bigihîne metnên edebiyata dinyayê jî. Çi metnên fiksiyonî, çi ên teorîk.

Ö.F.Yekdeş: Gelek nivîskarên Kurd hene li Ewropayê dijîn. Ez behsa wêjevanên Kurd ên diyasporayê dikim. Ew dikarin edebiyata dinê bê werger, ji zimanê orijînal bişopînin. Digel wê pirsgerêkê ku hûn destnîşan dikin, di xebatên wan nivîskaran de jî dixuyên. Hûn wê rewşê bi çi ve girê didin?

R. Alan: Mirov nizane dema ew kes dinivîsînin xwe bi çi dig-

rin? Tecrubeyên din, edebiyatên din ji bo wan çiqas dibin tiştêkî bandorker? Mirov van nizane. Belê, edebiyat çiqas ji zimanekî lokal hereket bike jî malekî gelemperî ye. Tecrubeya însanekî Afrîkî û yekî Rojhilata Navîn ji aliyê însanî ve pîr dişibin hev. Dema em bêjin bi rêya zimanekî biyanî mirov ji wan tecrubeyan, tabî li vir ez behsa tecrubeya nivîsandinê dikim, îstifade kir, jê tesîrên erênî girt, ji vir elbet dewlemendî derdikeve. Jixwe wek modernîzasyonê edebî ew gelên derengmayî, cureyên edebiyata modern bi rêya wergerê transfer kirine. Tu lê dinêrî wek projeyê rojavabûnê, bivênevê ew temas pêk hatiye. Dema te tesîrek ji wê derê girt û ew bi zimanê xwe kir, jixwe ne mimkun e ku ew tiştên tradîsyonel wek xwe bimînin. Guhertin, bi temasên wisan çêbûne, her wisa xetên melez û derbasdar jî. Lê ez dibêjim me hê ev îmkan baş neemilandine.

Ö.F.Yekdeş: Gotina we rast e, belê wek min berê jî got, di berhemên nivîskarên Kurdên diasporayê de jî pirsgerêkên estetîkî û hunerî hene, gelo ev rewş bi helwesta nivîskaran ve girêdayî ye an jî wek ku hinek kes dibêjin Kurdî têra zimanê raman û hestên me nake, pirsgerêka ziman bi xwe ye?

R. Alan: Ev gelek caran hatiye mînaqêşekirin, tu bi xwe jî dizanî ku bersîva wê jî hema bêje her kes bi eynî meqamê dide. Ezê jî eynî tiştan bibêjim. Nexêr, ev kêmasiyê şexsî ye. Em çima kêmasiyên xwe yê şexsî rûbarî hincetên kolektîf dikin? Îro tecrubeyên Kurdan ên

diyasporayê gelek in. Çûnûhatina ji bo xwendinê dîsa. Îro di nav Kurdan de gelek kes hene ku baş Îngilîzî, Fransîzî, Almanî, heta ewan zimanên din dizanin. Dema ew kêmasiyên estetîkî yên ku em behs dikin bi rêya vê temasê ji holê rabûn, emê çima guneh têxin stûyê zimanê Kurdî?

Lê bi rastî ez gelek caran şaş dimînim, ew nivîskarên ku bi salan li Ewropayê mane, di berhemên wan de, mijarên diyasporayê ewqas derbas nabin. Hema bêje çend kitêb ne tê de tu lê dinêrî, vegotîneke kevin a çîrokbêjîyê, bîranîn û serboriyên zaroktiyê, bêriya welêt derbas dibe. Ev tiştê xwezayî ye elbet û mirov nikare bêje filan tiştî binivîsinin, ev çi ne!.. Na, bi van gotinan meqseda min ev e. Nivîskarê Kurd, ji tecrûbeyên derveyî ve hinekî girtiye, tu dibêjî ev kes qey çûne di gettoyan de mane, tenê di nav qulika xwe de jiyane û tenê nostaljiya welêt agirê nivîsandinê li wan geş kiriyê... Îro li ser navê rexneyê dema we behsa krîza temsîlê, kêmasiyên edebî û estetîkî kir, hûn ji modelên îlhamê ketin şikê, wê demê hûn mecbûr in berê xwe bidin nivîskar bi xwe. Wê demê tu dibêjî dibe ku hê di wê gava pêşîn a zanîneke azamî de, hê di wê darsa pêşîn a elîfbêtikê de hin kêmasî hebin? Ji ber ku bikaranîna cureyekê jî hewcedarê bingehekê ye. Wê demê tu dibêjî nivîskarên Kurd lazim e hinek teoriyê jî bixwînin.

Ö.F.Yekdeş: Em dikarin bêjîn niha di edebiyata Kurdî de pirsra "çi" nivîsinê, ji ya "çawa"

Çi digot di Mem û Zînê de Ehmedê Xanî: "Qirtasiyeya me bêpenahan"! Kurdî-nûsîn hê jî karekî wisan e. Rûpel û kaxezên bêpiştan in. Û di vê qederê de parçebûna wan, bêstatûbûna wan (Başûr ne tê de), aktorên herî mezin in

nivîsinê zêdetir rol dileyize, bi gotîneke din mijar, beriya teşeyê tê? Ku ev jî dema em edebiyata xwe bi ya dinê re miqayese bikin, tê maneya derengmayin û kêmasiyêke estetîkî.

R. Alan: Ev jî belkî ji ber vê ye ku her daîm em behs dikin. Eger jiyaneke me ya normal hebûya, tekamûla me jî wek milletên din di nav rê û rêzîkeke xwezayî de bûya, dibû ku me ev tiştina di wextekî gelek zû de çareser bikira. Tu lê dinihêrî her daîm hatiye midaxelekirin, qutkirin. Ewê tekamûlê firset nedîtiye li ser lingê xwe bimîne da ruştê xwe îsbat bike. Ev mudaxleyên bi vî awayî jî di nivîskariya Kurdî de bûye tiştêkî tîpîk, rewşeka berbiçav.

Ö.F.Yekdeş: We behsa tunebûna jiyaneke normal kir, wisa dixuyê tunebûna tekamûla rewşenbîriya Kurdî li ser derdora rexneriya Kurdî jî bandorker e. Dema ku xebatek tê kirin di kovaran de têra xwe nayê minaqeşekirin û xebat û ked şexsî dimînin. Ev gazinda we jî bû di derbarê xebata Haşim Ahmedzade de. Gelo ev aqûbet tê serê

Bendnameyê an ew bûye sebebê hinek minaqeşe û goftûgoyan?

R. Alan: Çi digot di *Mem û Zînê* de Ehmedê Xanî: "Qirtasiyeya me bêpenahan"! Kurdî-nûsîn hê jî karekî wisan e. Rûpel û kaxezên bêpiştan in. Û di vê qederê de parçebûna wan, bêstatûbûna wan (Başûr ne tê de), aktorên herî mezin in. Elbet li gor vê yekê jiyaneke tanzîm bûye ku karûbarên nivîskarî û rewşenbîrî jî jê tesîrek girtine. Mesela ji ber vê yekê edebiyata Kurdî û pirsgirêkên wê ne mijareke aktûel in. Di nav kesên nivîskar de jî ne meseleyên aktûel in. Ji ber wê yekê xebatên gelek hêja jî, ku ya Ahmedzade yek ji wan e, di bin siya bêdengiyê de derbas dikin emrê xwe yê herî ciwan.

Ö.F.Yekdeş: Pirsra min a dawîn jî di derbarê refleksa xwendevanan de ye? Hûn di derbarê *Bendnameyê* de rexneyên çawa digrin, eleqeyêke bi çi celebê dibînin?

R. Alan: Heta niha kesekî an keseka jê nerazî min nedît. Ev e tu jî jê razî yî. Weşangerê kitêbê jî dibêje eleqeyêke baş û ciddî heye. Di çend programên televîzyonê de jî cih girt. Lê enteresan e hê bi rêya nivîsê (ku em vê hovpeyvînê lê nekin) ez lê rast nehatime ku mijar û guftûgoyên wê ketine ser rûyê rûpelan. Herhal sedema vê yekê wekî me niha got bêaktûelbûna edebiyata Kurdî ye. Hêvî ew e ev bêrewaciya dûdirêj a salan di vê serdemê de têk here.

Ö.F.Yekdeş: Zor spas, mala we ava.

R. Alan: Mala te jî ava●

Semaya zemîn û asman

Huseyn Şemrexî

zemîn
dibê ax, dike axîn
dev zuha, lêv terikî
her dem dibêje: Asman, asman, asman...!
mîna werdên sofîyan
lê di bîra tarî ya dil
ne li panava ronî ya ezman

asman
zêrê sor ê xorê
girêdaye li gerdena gewr a zemîn.
û bi rîşiyên keskesorê
bestandîye kofîya kohan

li seraya sipêhrê, berbû-stêran
bi tebeqên tije yelmûm
govend gerandine li dora bûka zemîn.
ji kêfa gîhanê, asman
birûskan vedide bi niqirîskan
diyarî dike mirariyan ji ewrê çavan.
û terkên dêm û lêvên bûka zemîn
şayik û têrav dike
bi melhema xunava hêsiran

deryaya dilê zemîn
kef bi devan ketiye, ji kêfan
her û her dilêrîne bi zimanê pêlan.
û mar û mûr û masiyan
gerandiye govend û dîlan
di ava delavê evînê da.
û îdî bi ava evînê dilivin
hemî dilê dilopan
ji birca kevanê, asman
bi awirên tîrêjên çavan
sincirandiye tenê tenûra can
û şikandiye hezar şîşên sor

di canê canana hejarcan.
hingavî ji bûkxaneyê
volkanê evînê liviyan
û mij û xwêdana geliyan hilkişîyan
lê ev dax û key, xweş dihate bi zemîn
ji lewra zemîn ji mêrga mergê
distewîne mêweyan
diseridîne teneyan
dîrsikîne daran
û dibişkivîne bi kulan bi hezaran gulan
û bi helbestên siruştê bi hezaran pirtûkan

bayê zemîna bengîn
bi dengê tenbûrê
bi lorîna bilûrê
kelecanê tîne canê zeryaya razayî
siwar dike berbûyên mijê, li maşîneyên
hewayî
û digewimîne li ber deriyê baregaha asman

şalûlê dilê zemîn
di sînga cîhanê ya derabekirî da
bi zengilê zimanê lal
vedibêje hestên xwedawendî
vedijîne ji mergistanan
hestiyên rizyayî
û hişyar dike ji nivînan
tovên razayî.
îdî zemîna gewrik
bona evîna asman
her danekî dipoşe kirasekî:
danekî, kirasê jîyanê yê keskiyê
danekî kirasê xezamên pîrîtîyê
danekî jî kefenê berfa mergiyê.

Dîsan Ergatîv

PERWÎZ CÎHANÎ

Hêja Abdullah Încekan di hej-mara 114an a kovara *Nûbiharê* de, nivîsarek balkêş li ser mijareke herî girîng û dijwar, li ser rêzimana Kurdî nivîsiye. Ew mijar jî mijara ERGATÎVê ye. Ergatîv doxeke (Kasus, Fall) ji şeş doxên rêzimana Kurdî ye ku ta niha kêm kesî li ser wê nivîsiye. Mijara ERGATÎVê mijarek ji mijarên rêzimanê Kurdî ye ku dijiwartirîn pişka rêzimanê Kurdî tê jimar-tin. Çimkû doxa ERGATÎVê li nav zimanên ku roja îroj gelê Kurd bi darê zorê bi wan perwerde dibe, tune. Ew hinda jî bûye heger ku fêrbûna vê mijarê ji bo me Kurdên jêrdestên zorbêjan dijiwartir bibe. Lê tiştê ku mirov pirr pê diêşe; ew e ku pişka zore rêzimannivîsên me ji bo nivîsîn û amadekirina rêzimana Kurdî, zimanên deverê yên serdestbûyî ji xwe re dikin bernivîs û nimûne. Li nav zimanên deverê yên ku Kurd bi darê zorê wan hîn dibin, Farisî, Erebi û Tirkî yên serdest in. Her çend ku Farisî zimanekî Hind û Ewropî ye, lê ta niha jî rêzimana wê li ber rêzimana Erebi tê nivîsînê û pirr aloz û

nivîşkan e. Tirkî jî li wê rêkê de wekî Farisî lê hatiye. Ka ew kesên ku bi rêka van zimanan rêzimana Kurdî dinivîsin, tûşî gelek şaşyan dibin û aloziyên mezin dikin nav rêzimana Kurmancî da. Ew kesana bêy wê hindê ku dîna xwe bidin zimanên Hind û Ewropî, yan li ser rîşalnasî (Ety-mologie) û rêzimana Kurmancî bihizirin û li dû re peyvên nû û biwêjên rêzimanî yên watedar biafirînin, her li ber xwe de û bêy li ber çavgiirtina van rê û şûnan dest pê kirin û peyvên sosret û bêwate kirin nav zimanê Kurdî de. Peyvên wekî: hevedudanî, qertaf, qedînek, qedandî...

Bo nimûne ew kesana mutemmema Erebi ku hîç mafê wê bi rêzimana Kurmancî re tune-ye, wergerandine Kurmancî û peyvên sosret yên wek: qedînek, qedandî ji rêzimana Kurmancî re çêkirine. Lê mutemmema Erebi ne bi wateya kutakirin û retkirin û qedandinê ye, ew bi wateya tekûzkirin û kemilandinê ye. Lê qedandin wate kutakirin, retkirin. Her wisa li ber yüklema Tirkî peyva lêker hatiye sazkirinê, ku

Hêja Încekanî bi nazikî û hûrbîniyek taybet û bi kûrbîniyek mamostayane ev mijar veçirrandiye û ez bawer dikim, bi wê nivîsara wî gelek kunc û rexên vê mijarê yên teng û tarî ronahî û fireh bûne

ne di cî de ye. Lêker bi xwe di wateya xwe de fail wate bikir û kara ye. Lêker wate kesê ku lê dike. (baran lê dike, xaniyan lêdike...) Bera xwe bidene van peyvana: lêker, lêxer, lêder, lêner, têker, çêker, şênker, rêker, xêrker, fêrker... hemû li wateya xwe de bikir in, wate karekî dikin, ne ku bi xwe kar yan kirdar bin. Eva bû nêzikî sed salan ku Kurd li cihê fîla Erebi û verba latîni de peyvên kar û kirdar bi kar dibin, êdî pêdivî nebû ku em herin peyvek daterrîşandî û bêwate li cihê kirdar û kar de bixebitînin. Lê em çî bikin, ridên û meqes ketiye destê wan de û çawa dilê wan dixwaze, dibirin û didirûn û pîne dikin. Lê pînekirina wan bûye: "Kuniya ji piniyê mezintir".

Lêbelê cihê dilxoşiyê ye, ku berebere kesên zimanzan peyda dibin, ku ne bi rê û rewîştên Tirkî û Erebi û Farisî, belkî bi rê û rewîştên zimanên hind û Ewropî rêzimana Kurdî vediçirrin û lêvedikolin.

Yek ji wan kesên rêzdar, hêja Încekan e, ku li vê nivîsara xwe de ew hinda nişan daye.

Hêja Încekanî bi nazikî û hûrbîniyek taybet û bi kûrbîniyek mamostayane ev mijar veçirrandiye û ez bawer dikim, bi wê nivîsara wî gelek kunc û rexên vê mijarê yên teng û tarî ronahî û fireh bûne. Ez bi xwe destxoşî û mandînebûnê dibêjim wî hevkarê hêja û herdem jê re daxwaza serketinê dikim. Lê di gel wê çendê nihêrîneke min ya biçûk li ser wê nivîsara hêja Încekanî heye.


Ji bilî bikarbirina çend hûrdepeyvên ne li cî da, şaşiyek

Încekanî di vê mijarê de heye. Ew jî ew e, ku hêja Încekanî dinivîse: "Gava ku fail cînav (zemîr/pronoun) be, di demên derbasbûyî de divê (debê) ew jî di halê Casus Obliquus de be..." Eva dirust e. Lê dema ku mirov nivîsara wî didomîne û van hevokana dixwîne, mirov we têdigihêje, ku mebesta wî ew e ku tenê cînav di wê dox û rewşê de ditewin, ne navên di. Lê wisan nîne. Li wê rewş û doxê de hemû navdêrên rêzimanî û navên taybetî çî nêrza û çî mêza ditewin.

Hêja Încekan li dû re diçe û dinivîse: "Gava fail ne cînav be, kelîmeyeke din be, divê meriv van paşpirtikan li ber çavan bigre..." Û li dû re navên taybetî yên nêrza û mêza nimûne BARANî ji bo navê mêran û ZOZANê jî ji bo navê jinan diîne. Lê tenê navê mêza ditewîne û navê nêrza netewandî dihêle. Kêmasî jî her di vir de ye. Çawa ku navê mêza tê tewandinê, navê nêrza jî tê tewandinê. Tewandina navê taybetî û hemû kirdeyan (bikir, fail, subjekt) bi cînavan ve girêdayî ye. Çawa cînavên nêr û mê, wî û wê ditewin, divê ku subjektên wan jî bitewin. Ji bo zelalbûna mijarê em her nimûneyên ku hêja Încekanî îname, digel cînavên wan bidin ber hev û li tewandina wan binêrin.

Wî berê pîrr dilîst. Wê berê pîrr dilîst. Niha em li cihê wan cînavana de du navên taybetî danên: Eger em li cihê wî de BARANî û li cihê wê de jî

1 Baran li gelek cihên Kurdistanê navê jinane jî, lewra min li cihê Baranî navê Azadî aniyê.



Bergê kitêba Abdullah İncekan

ZOZANê deynin, ew nimûneyên ku hêja Încekanî îname, divê weha lê bîn: Baranî berê pîrr dilîst. Zozanê berê pîrr dilîst. Baranî= wî. Zozanê= wê.

Wê got= Zozanê got.

Wî got= Azadî got.

Mirov dibîne, ku hêja Încekanî ji bo vê mijarê devokên bakûrojawayê Kurdistanê li ber çav girtine, ne ku rêzimana Kurmancî ya giştî. Her çend ku ew tewandina navan li bakurê Kurdistanê de roj bi roj lawaztir dibe, lê hê jî li gelek dever û devok û navçeyên bakurê Kurdistanê de gel evê tewanka navan bi kar dibe. Nimûneya herî ber bi çav, deverên Hekarî û Cizîrê ye. Hê jî gel li wan deverana de ewê tewankê bi başî bi kar dibe û eger kesek wê tewankê bi kar nebe, wek kesekî/e Kurdîezan tê nasînê.

Çend nimûne ji bo tewandina navên nêrza û mêza û peyvên wan bi cînavên nêrza û mêza re:

WÎ (EWÎ)**Navên nêrza (î / yî)**

Gayî bîne. Wî bîne.

Beranî bifiroşe. Wî bifiroşe.

Kurikî hilgire. Wî hilgire.

Bavî gote kurê xwe. Wî gote wî.

Bêje Ehmedî. Bêje wî.

Azadî nivîsî. Wî nivîsî.

Şivanî dot. Wî dot.

Li çiyayî binêre. Li wî (çiyayî) binêre.

Ava çemî gemarî ye. Ava wî (çemî) gemarî ye.

WÊ (EWÊ)**navên mêza (ê / yê)**

Çêlekê bîne. Wê bîne.

Mîhê nefiroşe. Wê nefiroşe.

Keçikê hilgire. Wê hilgire.

Dayê gote kiça xwe. Wê gote wê.

Bêje Zozanê. Bêje wê.

Gulistanê nivîsî. Wê nivîsî.

Bêrîvanê dot. Wê dot.

Li deştê binêre. Li wê (deştê) binêre.

Ava kaniyê paqij e. Ava wê (kaniyê) paqij e.

Ji bo ku mijara ERGATÎVê ji xwendevanên hêja re baş ronahî be, ez çend nimûnderên ku min ji bo xwendekarên xwe yê zanistgehê amade kiribûn, li vir jî dihînim û ji hêja Încekanî û hemû xwendevan û xwendekaran re daxwaza serkeftinê dikim.

Çend nimûne ji kirdarên (lêkerên) negerguhêz (intransitiv) û kirdarên (lêkerên) gerguhêz (transitiv) û kişandina wan li her sê demên: niha (Präsens), nehatî (Futur) û bihorî (Vergangenheit)

1. ketin (keftin), kirdarek (lêkerek) negerguhêz (intransitiv)

cînavên nedaçekî xwerû	dema niha (präsens)	d e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)				dema nehatî (Futur)
		1	2	3	4	
		bihuriya sade	bihuria qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr	
ez	dikevim	ketim	ketime	diketim	ketibûm	dê bikevim
tu	dikevî	ketî	ketiyî	diketî	ketibûy	dê bikevî
ew	dikeve	ket	ketiye	diket	ketibû	dê bikeve
em	dikevin	ketin	ketine	diketin	ketibûn	dê bikevin
hûn	dikevin	ketin	ketine	diketin	ketibûn	dê bikevin
ew	dikevin	ketin	ketine	diketin	ketibûn	dê bikevin

2. hatin, kirdarek (lêkerek) negerguhêz (intransitiv)

cînavên netewankbar	dema niha (präsens)	d e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)				dema nehatî (Futur)
		1	2	3	4	
		bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr	
ez	dihêm (têm)	hatim	hatime	dihatim	hatibûm	dê hêm/ dê bêm
tu	dihêy (têy)	hatî	hatiyî	dihatî	hatibûy	dê hêy/ dê bêy
ew	dihê (tê)	hat	hatiye	dihat	hatibû	dê hê/dê bê
em	dihên (tên)	hatin	hatine	dihatin	hatibûn	dê hên/dê bèn
hûn	dihên (tên)	hatin	hatine	dihatin	hatibûn	dê hên/dê bèn
ew	dihên (tên)	hatin	hatine	dihatin	hatibûn	dê hên/dê bèn

1. Balkêşî:

Wekî hûn dibînin, li kişandina (Konjugation) a kirdarên negerguhêz de tenê cînavên netewankbar dihên bikarbirinê û li kirdarên negerguhêz de ERGATÎV tune.

Niha jî çend nimûne ji kirdarên (lêkerên) gerguhêz di gel birserên nêrza û mêza û bêy bireser (objekt)

1. Kirdara (lêkera) gerguhêz "nivîsîn" bêy bireser (objekt)

cînavên netewank-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	Cînavên tewank-bar	Demên bihuri (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	dinivîsim	dê binivîsim	Min	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Tu	dinivîsî	dê binivîsî	Te	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Ew	dinivîse	dê binivîse	wê/wî	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Em	dinivîsin	dê binivîsin	Me	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Hûn	dinivîsin	dê binivîsin	We	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Ew	dinivîsin	dê binivîsin	Wan	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû

2. Kirdara (lêkera) gerguhêz "dîtin" bêy bireser (objekt)

cînavên netewank-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	Cînavên tewank-bar	Demên bihuri (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	dibînim	dê bibînim	Min	dît	dîtiye	didît	dîtîbû
Tu	dibînî	dê bibînî	Te	dît	dîtiye	didît	dîtîbû
Ew	dibîne	dê bibîne	wê/wî	dît	dîtiye	didît	dîtîbû
Em	dibînin	dê bibînin	Me	dît	dîtiye	didît	dîtîbû
Hûn	dibînin	dê bibînin	We	dît	dîtiye	didît	dîtîbû
Ew	dibînin	dê bibînin	Wan	dît	dîtiye	didît	dîtîbû

2. Balkêşî:

Wekî hûn dibînin, ergatîva Kurmancî tenê li demên bihorî de heye û cînavên tewangbar li ergatîvê de têne tewandinê. Her wisan kişandina kirdarê (lêkerê) ji bo hemû kesên rêzimanî çî kesên yekjimar û çî ji kesên pirrjimar her yek e.

1. Kirdar (lêkera) gerguhêz "nivîsîn" digel bireser (objekteke) yekjimar û mêza

cînavên netewang-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	Cînavên tewang-bar	Demên bihuri (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	Pirtûkekê dinivîsim	dê pirtûkekê binivîsim	Min	Pirtûkek nivîsî	Pirtûkek nivîsiye	Pirtûkek dinivîsî	Pirtûkek nivîsîbû
Tu	dinivîsî	dê binivîsî	Te	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Ew	dinivîse	dê binivîse	wê/wî	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
em	dinivîsin	dê binivîsin	Me	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
hûn	dinivîsin	dê binivîsin	We	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû
Ew	dinivîsin	dê binivîsin	Wan	nivîsî	nivîsiye	dinivîsî	nivîsîbû

2. Kirdara (lêkera) gerguhêz "nivîsîn" digel biresereke (objekteke) pirrjimar û mêza

cînavên netewang-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	Cînavên tewank-bar	D e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	sê pirtûkan dinivîsim	dê sê pirtûkan binivîsim	Min	sê pirtûk nivîsîn	sê pirtûk nivîsîne	sê pirtûk dinivîsîn	sê pirtûk nivîsîbûn
Tu	= dinivîsî	dê = binivîsî	Te	nivîsîn	nivîsîne	dinivîsîn	nivîsîbûn
Ew	= dinivîse	dê = binivîse	Wê/wî	nivîsîn	nivîsîne	dinivîsîn	nivîsîbûn
Em	= dinivîsin	dê = binivîsin	Me	nivîsîn	nivîsîne	dinivîsîn	nivîsîbûn
Hûn	= dinivîsin	dê = binivîsin	We	nivîsîn	nivîsîne	dinivîsîn	nivîsîbûn
Ew	= dinivîsin	dê = binivîsin	Wan	nivîsîn	nivîsîne	dinivîsîn	nivîsîbûn

3. Kirdara (lêkera) gerguhêz "dîtin" digel biresereke (objekteke) yekjimar û mêza

cînavên netewang-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	Cînavên tewank-bar	D e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	qîzekê dibînim	dê qîzekê bibînim	Min	qîzek dît	qîzek dîtîye	qîzek didît	qîzek dîtîbû
Tu	= dibînî	dê = bibînî	Te	=dît	=dîtîye	=didît	=dîtîbû
Ew	= dibîne	dê = bibîne	wê/wî	=dît	=dîtîye	=didît	=dîtîbû
em	= dibînin	dê = bibînin	Me	=dît	=dîtîye	=didît	=dîtîbû
hûn	= dibînin	dê = bibînin	We	=dît	=dîtîye	=didît	=dîtîbû
Ew	= dibînin	dê = bibînin	Wan	=dît	=dîtîye	=didît	=dîtîbû

4. Kirdara (lêkera) gerguhêz „dîtin“ digel biresereke (objekteke) pirrjimar û mêza

cînavên netewang-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	Cînavên tewang-bar	D e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	du qîzan dibînim	dê du qîzan bibînim	min	du qîz dîtîn	du qîz dîtîne	du qîz didîtîn	du qîz dîtîbûn
Tu	= dibînî	dê = bibînî	te	=dîtîn	=dîtîne	=didîtîn	=dîtîbûn
Ew	= dibîne	dê = bibîne	wê/wî	=dîtîn	=dîtîne	=didîtîn	=dîtîbûn
em	= dibînin	dê = bibînin	me	=dîtîn	=dîtîne	=didîtîn	=dîtîbûn
hûn	= dibînin	dê = bibînin	we	=dîtîn	=dîtîne	=didîtîn	=dîtîbûn
Ew	= dibînin	dê = bibînin	wan	=dîtîn	=dîtîne	=didîtîn	=dîtîbûn

5. Kirdara (lêkera) gerguhêz "dîtin" digel biresereke (objekteke) yekjimar û nêrza

cînavên netewang-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	cînavên tewangbar	D e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	kurekî dibînim	dê kurekî bibînim	Min	kurek dît	kurek dîtiye	kurek didît	kurek dîtibû
Tu	= dibînî	dê = bibînî	te	=dît	=dîtiye	=didît	=dîtibû
Ew	= dibîne	dê = bibîne	wê/wî	=dît	=dîtiye	=didît	=dîtibû
em	= dibînin	dê= bibînin	me	=dît	=dîtiye	=didît	=dîtibû
hûn	= dibînin	dê = bibînin	we	=dît	=dîtiye	=didît	=dîtibû
Ew	= dibînin	dê = bibînin	wan	=dît	=dîtiye	=didît	=dîtibû

6. Kirdara (lêkera) gerguhêz "dîtin" digel biresereke (objekte) pirrjimar û nêrza

cînavên netewang-bar	dema niha (präsens)	dema nehatî (Futur)	cînavên tewang-bar	D e m ê n b i h u r î (Vergangenheit)			
				1	2	3	4
				bihuriya sade	bihuriya qediyayî	bihuriya domdar	bihuriya çîrokî/dûr
Ez	du kuran dibînim	dê du kuran bibînim	Min	du kur dîtin	du kur dîtine	du kur didîtin	du kur dîtibûn
Tu	= dibînî	dê = bibînî	te	=dîtin	=dîtine	=didîtin	=dîtibûn
Ew	= dibîne	dê = bibîne	wê/wî	=dîtin	=dîtine	=didîtin	=dîtibûn
em	= dibînin	dê= bibînin	me	=dîtin	=dîtine	=didîtin	=dîtibûn
hûn	= dibînin	dê = bibînin	we	=dîtin	=dîtine	=didîtin	=dîtibûn
Ew	= dibînin	dê = bibînin	wan	=dîtin	=dîtine	=didîtin	=dîtibûn

3. Balkêşî:

Wekî hûn jî dibînin kişandina kirdaran (lêkeran) li bara jimarê de bi kirde (faîl, bikir) ve girêdayî nîne, belkû pirrjimarî û yekmimarî li ERGATÎV ê de bi bireser (objekt) ê ve girêdayî ye. Bi gotinek sade, eger bireser yekjimar be, kirdar (lêker) jî bi yekjimarî tê kişandinê. Lê eger bireser pirrjimar be, kirdar (lêker) jî bi pirrjimarî tê kişandinê. ●

Careke din li ser “hat” û “çûn”ê

ZILKÎF XWEŞHÊVÎ
zxweshevi@gmail.com

Di hejmara 113an a Kovara *Nûbiharê* de di bin sernavê “Du Lêkerên Ciyawaz û Bikaranîna Wan a Çewt” de nivîsareke min hatibû weşandin. Li ser vê nivîsarê du ciwamêran di nivîsarên xwe yên rexneyî de “îtirazek û nîv” kirine û ji hinek aliyên ve tiştên ku min di nivîsara navborî de îdîa kiribûn rexne kirine. Helbet ji ber eleqeya van her du birêzan ez xweşhal im, lê derheq “îtirazek û nîv”a wan de çend têbiniyên min jî hene. Berî ku ez bikevim nav mijarê, ji bo xwênerên vê hejmarê ji mijarê re biyanî nemînin, ez dixwazim tiştê ku min gotibû bi kurtî berçav bikim, paşê jî ezê behsa têbiniyên xwe bikim.

Kesên ku bala xwe dabin pirtûkên rêzimanî yên Kurdî dîtine ku di mijara lêkeran de lêkerên Kurdî li ser du form û rayan ve tên dabeşkirin. Forma yekemîn; forma dema bihûrî ye, forma duyemîn; forma dema niha û dema bê ye. Wate lêkerên Kurdî di dema bihûrî de û dema niha û dema bê de xwedî du şiklên ciyawaz in. Di vir de divê mirov

bibêje ku di dema niha û dema bê de yek şiklê lêkerê heye û ev jî qayîdeyê geştî ye, lê di hinek lêkerên Kurdî de di raweya fermanî ya lêkeran de formeke nû derdikeve pêşberî me. Bo nimûne:

Dema Bihûrî	Dema Niha
Tu <u>hatî</u>	Tu <u>têyî</u> (diêyî)
Tu <u>çûyî</u>	Tu <u>diçî</u>
Te <u>anî</u>	Tu <u>tînî</u> (dîinî)
Dema Bê	Raweya Fermanî
Tu <u>yê bêyî</u>	<u>were</u>
Tu <u>yê biçî</u>	<u>here</u>
Tu <u>yê bînî</u>	<u>werîne</u> / <u>bîne</u>

Wekî ku di van mînakên de tê dîtin, ev lêker di dema bihûrî de di şiklekî de, di dema niha û dema bê de di şiklekî de û di raweya fermanî de jî di şiklekî dîtir de ne. Heta li vir tu kêşeyek nîne û kesên ku bi Kurmancî zanibin van lêkeran ji xwe bi geştî weha bi kar tînin, lê carna di hinek herêman de ev form têkelî hev dibin û qayîdeyên rêzimanî têk diçin. Di vê rewşê de du awayên

Kesên ku bala xwe dabin pirtûkên rêzimanî yên Kurdî dîtine ku di mijara lêkeran de lêkerên Kurdî li ser du form û rayan ve tên dabeşkirin

bikaranînê derdikevin holê. Wate raweya fermanî ya lêkerên navborî di hinek herêm û devokan de di şûna forma dema bê de tên bikaranîn. Mînak:

1. Tu yê bêyî /Tu yê werî
2. Divê bê kirin /Divê were kirin
3. Tu yê biçî /Tu yê herî

Min di nivîsa xwe de gotibû ku madem forma lêkeran wek qayîdeyê giştî di dema niha û dema bê de yek in, wê demê dema em van lêkeran di dema bê de bi kar bînin divê em forma ku wekî forma dema niha ye tercîh bikin û forma raweya fermanî bi kar neyînin. Piştî van tespîtan ez dixwazim derbasî îtirazan bibim.

Ezê pêşî behsa îtirazên Xelîl Birînî bikim. Lewra ji ber ku îtirazên wî derheq naverokê de ne bi dîtina min “yek îtiraz” tê qebûlkirin û hêja ye ku ez pêşî bersîva wî bidim. Xelîl Birînî di 7ê Adarê de li ser malpera Kovara Bîrê bi navê “Bikaranîna Du Lêkerên Cewaz” û Zilkîf XWEŞHÊVÎ” gotarek nivîsiye, lê ez nizanim ji bo çî sernavê gotara min guhertiye? Lewra min gotibû “Bikaranîna Du Lêkerên Ciyawaz”, lê birêz Birînî di şûna “ciyawaz”ê de “cewaz” nivîsiye. “Ciyawaz” di şêwezare Soranî de di wateya “cihê” (Bi Tirkî: farklı) de tê bikaranîn, lê min “cewaz”a Birînî nebihîstiye(!) Piştî vê sererastkirinê ezê xal bi xal cî bidim îtirazên Xelîl Birînî û ezê têbiniyên xwe li ser îtirazên wî bibêjim.

1. Birêz Xelîl Birînî îtiraza xwe ya pêşîn weha rave dike: “Di ilmê zanyarî de çewtî an rastiya qaîdeyêkî rêziman rasterast nayê gotin. Hele ev zîmanê Kurdî be divê em di vî warî de gellekî hişyar bin.” Birêz Xelîl Birînî behsa “ilmê zanyarî” dike lê min vî ilmê ku behs dike nebihîstiye çî cure ilm e (!) Ji aliyê din ve eger qayîdeyên rêzimanî rasterast neyên gotin gelo çawa tên gotin? Her çend ev gotinên Birînî tevlihev û aloz bin jî dema mirov li pêşî û paşîya gotinên Birînî dinêre aşkera dibe ku Birînî dixwaze bibêje divê mirov li ser tespîtîkirina qayîdeyên rêzimanî ecele neke, eger mirov behsa qayîdeyan jî bike divê mirov fikrên xwe bispêre fikrên pîspor û zanyarên vî warî. Xelîl Birînî jî di bin vê sîbera ewlehiyê de

piştî xwe dispêre nezeriyeya Mîrê Kurmanciyê Celadet Elî Bedirxan. Lewra hêja Bedirxan di pirtûka xwe ya rêzimanê de dibêje ku veguhestina lêkera “hatin”ê di “demên koma sêyemîn” de yanî di “demên bê” de xwedî hin taybetiyên derî qayîdeyan e. Li gorî wî, lêkera “hatin”ê di dema bê de bi du awayan tê veguhestin û van nimûneyan dide:

Ezê bêm	Ezê werim
Tuê bêî	Tuê werî?

Rast e dema em hemû Kurmancîaxêfan li ber çav bigirin ev her du awa jî tên bikaranîn. Ji xwe min jî di gotara xwe de behsa vê rastiye kiribû, lê mebesta min ew bû ku ez di nav van her du forman de ya rasttir berçav bikim. Wekî min berî niha jî amaje pê kir, madem lêker bi giştî bi du forman tên veguhestin û madem forma dema niha û dema bê yek form in divê em li ser vê rêzika giştî forma “bê” tercîh bikin. Lewra lêkera “hatin”ê hem di dema niha de, hem di dema bê de wek “ê” tê bikaranîn. Ji ber hindê “ê” di dema niha de di gel qertefa dema niha “di”yê wek “diê” yan “tê” di dema bê de jî di gel qertefa dema bê “bi”yê wek “bê” tê bikaranîn. Bi vî awayî, ev qayîdeyê rêzimanî di nav xwe de yekgirtî û hêsantir dibe. Ji aliyê din ve dema em lêkera “hatin”ê di raweya fermanî de bi kar bînin bivê neyê divê em forma “were”yê bi kar bînin. Lewra di Kurmancî de raweya fermaniya rasterast a lêkera “hatin”ê bi tu awayî wek “bê” nayê bikaranîn, lê di Rêzimana Celadet de raweya fermanî jî bi du awayan tê nîşandan. Wek:

1. Were werin
2. Bila were (bê) bila werin (bên)

Dema mirov bala xwe dide van her du forman “were û werin” wek raweya fermanî ya rasterast tê bikaranîn û di şûna vê formê de “bê û bên” nayên bikaranîn. Lê di forma duyemîn de fermaneke nerasterast heye û peyva “bila” jî wek raweya xwestekî tê bikaranîn. Ji ber hindê forma “bila” rasterast forma fermanî nîne ji xwe birêz Celadet Bedirxan jî di pirtûka xwe de “bila”yê wek rawe-

1 Birînî Xelîl, *Bikaranîna Du Lêkerên Cewaz û Zilkîf Xweşhêvî*, Malpera *Bîr*, 7/3/2011

2 Alî Bedirxan Celadet, Lescot Roger, *Kürtçe Gramer*, r.195, Avesta, 2004 İstanbul

ya xwestekî nîşan dide.³ Her çend Celadet Bedirxan bingeha rêzimana nûjen a Kurdî danibe û di wî warî de berhema herî hêja û serkeftî nivîsandibe jî ev nayê maneya ku her tiştê ku cenabê wî gotine sedî sed rast in û divê tu kes fikrê xwe derheq tespîtên wî de nebêje. Lewra pirtûkên rêzimanê yên ku piştî Celadet hatine nivîsîn bi qasî ku ez dizanim hemûyan “raweya bila”yê wek raweyeke serbixwe ku di gelek wateyan de tê bikaranîn bi nav kirine. Bo nimûne Samî Tan di pirtûka xwe ya “Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî” de “raweya fermanî” û “raweya bilanî” wek du raweyên ji hev cihê tespît kirine. Birêz Samî Tan di raweya fermanî de lêkerên hat û çûnê weha bi kar anîne: “Lawo zû ji vir here.” “Sibe were mala me.”⁴ Lêkera hatinê jî di raweya bilanî de wisa bi kar aniye: “Bila bê,” “Bila bèn.”⁵ Prof Dr. Qanatê Kurdo jî di pirtûka xwe ya “Gramera Zimanê Kurdî” de lêkera “hatin”ê hem di dema bê de bi gotina wî “wextê wê bê” da hem jî di raweya fermanî de weha bi kar aniye. Ji bo dema bê; “Ezê bêm..... ewanê bèn”⁶ ji bo raweya fermanî jî weha dibêje: “were, werin”⁷

2. Birêz Xelîl Birînî xwe mecbûr dîtiye ku îtirazî her tiştî bike û îddîa dike ku min lêkera “hatin”ê di dema bê de bi lêkera arîkar a tebatî re tevlihev kiriye. Lê di vê îddîaya birêz Birînî de tevlihevî heye; lewra lêkera hatinê di dema bê de, çî wek lêkereke bingehîn çî wek lêkereke arîkar, dema bê bikaranîn forma wan yek e û ji aliyê teşeya xwe ve tu cîyawazî di nav wan de nîne, tenê ji aliyê fonksiyon û wateyê de ji hev cihê ne. Bo nimûne:

Hatin wek lêkera bingehîn: Ew hat. Ew tê. Ew dê bê.

Hatin wek lêkera arîkar a tebatî: Ev hat kirin. Ev tê kirin. Ev dê bê kirin.

3. Min di nivîsa xwe ya hejmara 113an de

gotibû ku neyîniya “were”yê nîne û “were” tenê ji bo raweya fermanî ya erênî tê bikaranîn. Lê Xelîl Birînî ji bo vê jî îtiraz kiriye û îddîaya wî ev e ku forma neyîniya ya “were”yê heye û ji bo îspata vê jî nimûneyên wisa dane: Ezê newim..... Ewê newin” Lê mixabin birêz Birînî di vê îddîa xwe de, dê ji xwe re tu palpiştekekê nebîne; lewra di serî de Celadet Elî Bedirxan hemû zimanzan neyîniya raweya fermanî ya lêkera hatinê wek “meye, meyê, mehê” destnîşan dikin.⁸ Samî Tan jî di pirtûka xwe de bi awayekî aşkera weha dibêje: “Bo nimûne dema mirov bala xwe bide “were”, mirov dibîne ku awayê neyîniya yê were nîn e.”⁹ Xelîl Birînî yê ku destpêka nivîsa xwe de xwe di bin sîwana biewleya zimanzanan de diparêze ji bo çî di vê mijarê de dijbertiya wan kiriye nizanîm? Eger Kek Xelîl Birînî di peyva “duyem” “duwem”ê de peywendiya “y” û “w”yê lêbikole ez bawer dikim, dê têbigihîje ku di hinek herêman de ji bo çî ji “meye yan mehê” re dibêjin “mewe”.

Piştî têbiniyên li ser “yek îtiraz” a Xelîl Birînî îca em bèn ser “nîv îtiraz” a Selman Dilovan. Vê nivîsa ku di 114. hejmara Nûbiharê de bi sernavê “Delîlên ku nabin delîl” hatiye weşandin de di destpêka nivîsa xwe de Selman Dilovan wisa dibêje: “Tiştên ku wan çewt dihesibîne çiqasî çewt in, ên ku wan rast dibîne çiqasî rast in, bila ev mijar ji ehlê wî karî, ji zimanzanan re bimîne”¹⁰ Bi vê gotinê Selman Dilovan bi awayekî ji awayan dixwaze bibêje ku ev mijar ne karê min e û ez ew qas jê fêm nakim û piştî vê, îtirazên xwe derheq mînakên de rêz kirine. Ji ber vê jî îtirazên Dilovan “nîv îtiraz” tê qebûlkirin. Birêz Selman Dilovan her çend naveroka mijarê hewaleyî zimanzanan kiribe jî, lê dîsa rûyê xwe tîrş kiriye û guman xistiye ser naverokê jî. Bi îhtîmaleke mezin ji bo ku îtiraza xwe ya li ser mînakên bêtir bi bandor bike tiştêkî weha tercîh kiriye. Xelîl Birînî çawa ku derheq naverokê de îtirazî her tiştî kiriye û çê û xirab tevlihev kiriye herweha Selman Dilovan jî

3 b.n, r.195

4 Tan Samî, *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, r. 252, Weşanên Enstûtuya Kurdî ya Stenbolê, 2005 Stenbol

5 b.n, r. 259

6 Kurdo Qanat, *Gramera Zimanê Kurdî*, r. 254, Koral, 1991 İstanbul

7 b.n, r. 255

8 Binêre: Celadet r.196, Qanatê Kurdo r. 255


9 Tan Samî, *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, r. 252, Weşanên Enstûtuya Kurdî ya Stenbolê, 2005 Stenbol

10 Dilovan Selman, *Delîlên ku nabin delîl*, r. 12, Nûbihar Hejmar: 114

derbarê mînakên de îtirazî hemû mînakên kiriye û rastî û çewtî têkelî hevdu kirine. Ezê niha cî bidim îtirazên Kek Selman Dîlovan û têbiniyên xwe li ser îtirazên wî aşkera bikim.

1. Selman Dîlovan pêşî cî dide vê hevokê: “Xebatên destûra bingehîn ya xweseriya demokratîk dikare bê meşandin û bilezkirin.” û li ser vê hevokê weha dibêje: “Eger ez bixwazim qala tiştêkî weha bikim, ezê bi şiklekî din vî cumleyî saz bikim, lê ji ber ku ev tercîha wî ye, ezê derbas bibim. Bi gotineke din, eger em cumlê raste-rast qebûl bikin jî, ji hêla gramerê ve şaş e. Di vî cumleyî de peyva “xebatên” pirhejmarî ye, divê lêker jî pirhejmar be. Hingê rastiya vî cumleyî divê weha be: “Xebatên destûra bingehîn ya xweseriya demokratîk dikarin bîn meşandin û bilezkirin.” Ji bo nivîsareke li ser ziman ev ne şaşiyeke piçûk e.”¹¹ Di serî de divê ez bibêjim ku min ev hevok ji malpera “Net Kurd”ê wergirtibû, lê di nivîsê de min ji bîr kiribû ku ez çavkaniyê nîşan bidim, ji ber vê jî heqê Selman Dîlovan heye ku berê tîrên rexneyan bide min. Lê sererastkirina vê hevokê ji ber ku peywendîya xwe bi peyama nivîsa min re nîne ez vê redaktoriya Selman Dîlovan li ser navê “Net Kurd”ê dikarim qebûl bikim. Ji ber ku ez di binê mineta wî de nemînim ez jî

11 n. b, r. 12



dixwazim di cumleyên wî yên jorîn de şaşiyeke rast bikim. Kek Selman di cumleyên xwe yên jorîn de du caran gotinên “vî cumleyî” dubare kirine û di cihêkî de jî gotiye “cumlê”. Kek Selman dema dibêje “vî cumleyî” peyva “cumle”yê nêr qebûl dike, lê dema dibêje “cumlê” peyva “cumle”yê mê qebûl dike. Selman Dîlovan divê bîrjara xwe ya dawîn bide “cumle” nêr e yan mê ye? Lê ji ber ku ez deyndarê wî nemînim di şûna wî de ezê bersîvê bidim. Peyva “cumle”yê mê ye û divê wek “vê cumleyê” bê bikaranîn.

2. Mînaka duyem ku Selman Dîlovan îtiraza wê kiriye ev e: “Wer ji ber perdê yedê beyda bi mu’cîz bête der/Şems û kewkeb dê hilên ‘alem teji enwarî bit.” Min di vê beyta Melayê Cizîrî de “wer”î wekî forma fermaniya lêkera “hatin”ê û “bêt”ê jî wek forma dema bê ya lêkera “hatin”ê ber çav kiribû. Divê ez li xwe mikur bêm ku dema min ev beyt wek mînak nîşan da ez ew çend li ser maneya wê hûr nebûm; ji ber ku min ji xwendinên xwe yên berê dizanibû ku di klasîkên Kurdî de lêkera “hatin”ê di dema bê de wek “bêt” û di raweya fermani de jî wek “were” tê bikaranîn. Ji ber vê pêşqebûlê jî ez ew qas li ser maneya wê nesekinim. Li ser vê mînakê Kek Selman Dîlovan dibêje ku peyva “wer”ê di vê beytê de ji aliyê wateyê ve ne fermana kesê duyem e belkî di wateya “eger”ê de hatiye bikaranîn. Heqîqeten dema mirov li beytê mêze dike wateya “eger”ê bêtir ciyê xwe digire û lê tê. Em dizanin ku şaîrên klasîk ji bo kêşa erûzê gelek caran peyv kurt kirine û ji teşeya wan a xwerû dûr xistine. Melayê Cizîrî jî peyva “eger”ê carna wek “ger” carna wek “er” bi kar tîne. Di vê mînakê de jî mumkin e ku Mela vê peyvê ji her du peyvên “we”ya Erebfî û “er”a kurt a peyva “eger”ê pêk anîbe. Ji ber vê jî ez bi ser ser û bi ser çavan vê îtirazê qebûl dikim û destxweşiya Selman Dîlovan dikim, lê ez nizanîm ji bo çî hema di bin vê beytê de Selman Dîlovan ji tiştê ku gotine wekî bikeve şikê îzahateke weha jî kiriye: “Bi tu awayî “were” û “bête der” di vê beytê de bi hev nakin. Çimkî “were” ji kesê duyem re hatiye gotin “tu”; û “bête der” ji kesê sêyem re yanî “ew”¹² Ji van gotinên Selman Dîlo-

12 Dîlovan Selman, Delîlên ku nabin delîl, r. 13, Nûbihar

van weha tê fêmkirin ku Selman Dilovan “wer”a vê beytê wek fermana kesê duyem qebûl dike û “bête der” jî ji bo kesê sêyem qebûl dike û dibêje ji aliyê kesan ve ev her du gotin hev nagirin. Dîsa Selman Dilovan divê biryara xwe bide eger “wer”ê wek “we +er yanî eger” qebûl dike min li jor jixwe heq dabûyê, lê ku “wer”ê wek fermana lêkera “hatin”ê qebûl dike kesê duyem yan sêyem ferq nake. Di vir de teşeya lêkerê girîng e. Tu vê lêkerê ji bo her şeş cînavkan jî bi kar bîni forma wê naguhere.

Selman Dilovan di gel vê nakokiya xwe dîsa jî ji mînaka jorîn re gotiye “delîlên ku nabin delîl”. Ji ber vê çendê ez dixwazim ji hin klasîkên Kurdî çend “delîlên ku bibin delîl” raber bikim. Melayê Cizîrî “were”yê di wateya raweya fermanî de, ne di ciyekî de di gelek ciyan de, bi kar tîne, ezê çend nimûneyên ku Kek Selman Dilovan jî qebûl bike weha berçav bikim:

Newaya mitrib û çengê, fîxan avête xerçengê
 Were saqî heta kengê, neşoyîn dil ji vê jengê¹³
 Ger lûlûyê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
 Wer şîrê Melê bîn, te bi şîrazî çi hacet?¹⁴
 Were saqî werîn camê muhebbet
 Ku hişyar bit dilê m'ez sîrrê wehdet¹⁵

Ne tenê di van mînakên de di hemû klasîkên me de “were” di wateya raweya fermanî ya lêkera “hatin”ê de hatiye bikaranîn û ji bo vê jî hewceyî bi îzahateke zêdetir nîne.

3. Selman Dilovan ji bo mînaka sisêyan jî weha dibêje: “Bi fikra min numûneya sisêyan jî şaş e”¹⁶ û vê mînakê weha rave dike: “Dê ji çerxa pêncemîn bêtin tenezzul kit Merîx” Dilovan îddîa dike ku min ev “bêtin” wek lêkera arîkar a tebatî qebûl kiriye û bi dîtina wî ev ne lêkera tebatî ya arîkar e belkî lêkera esasî ye û bi serê xwe ye. Carekê min di nivîsa xwe de tişteki weha negotiye Selman Di-

lovan ev wate ji ku derxistiye ez nizanim? Belkî jî ji bo tekane mînaka jorîn ku min jî qebûl kir tenê nehêle, xwe xistiye vê neqeba teng. Li aliyê din wekî min li jor jî amaje pê kir lêkera “hatin”ê, çi wekî lêkera arîkar û çi wek lêkera esasî, di yek teşeyî de ye. Ew kesên ku “were”yê di şûna “bê” yan jî “bêt”ê de bi kar tînin ciyawaziyê naxin navbera lêkera esasî û lêkera tebatî. Çawa “were” wek raweya fermanî di hemû berhemên klasîk de hatiye bikaranîn herweha “bê” yan “bêt” jî hem wek lêkera esasî û hem jî wek lêkera arîkar di hemû klasîkên me de hatine bikaranîn û di van klasîkan de di şûna “bêt”ê de tu car “were” nehatiye bikaranîn: Bo nimûne:

Ehmedê Xanî:

Şîrê hunera me bête danîn

Qedrê qelema me bête zanîn¹⁷ (Lêkera arîkar a tebatî)

Ew reng-i bikim ji nû serefraz

Da bêne temaşê nezerbaz¹⁸ (Lêkera esasî)

Feqiyê Teyran:

Baxê ku baxvan bête ber¹⁹ (Lêkera esasî)

Îro werin lêzim werin²⁰ (Hatî di raweya fermanî de)

Siyahpoş:

Sa'etek zû verêke ew bila bê²¹ (Lêkera esasî)

Di dawiyê de ez dixwazim bibêjim ku rêzîman yek ji esasên girîng ên yekgirtina zîmanê Kurdî ye. Bêguman rêzîman nayê wateya desttêwerdana zîman û çêkirina zîmanekî nû; berevajî rêzîman destnîşankirina rêzîkên zîman e ku jixwe ew rêzîk di zîman de hene, lê ev jî heqîqet e ku di gelek devokên Kurdî de hinek destûrên rêzîmanî tevlihev bûne û şaşî wek rastiyê hatine qebûlkirin. Ji bo saxkirina vana jî bi baweriya min klasîkên Kurdî divê wekî çavkanî bîn qebûlkirin û li gorî van çavkaniyan divê em form û qayîdeyên rasttir ên zîmanê xwe destnîşan bikin ●

Hejmar: 114

13 Melayê Cizîrî, *Dîwan*, r. 15, Fîrat Yayınları, İsta - bul

14 Melayê Cizîrî, *Dîwan*, r. 48, Fîrat Yayınları, İstanbul

15 Siyahpoş, *Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn*, r. 66, Nûbihar, 2006 İstanbul


16 Dilovan Selman, *Delîlên ku nabin delîl*, r. 13 Nûbihar Hejmar: 114

17 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, r. 162 Deng, 2005 Stenbol

18 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, r. 188 Deng, 2005 Stenbol

19 Feqiyê Teyran, *Dîwan*, r. 114, Nûbihar, 2003 İstanbul 20 b.n, r. 148

21 Siyahpoş, *Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn*, r. 222, Nûbihar, 2006 İstanbul



Ro ser zarawaya kîrmanckî xebata gramêrî

AMADEKAR: AYHAN MERETOWAR

Kurte

Di vê nivîsê de min dil heye ku bi ser pirtûka S. Gultekî, bizava ku bi awayekî zanistî li ser zimannasiya Kurdî hatiye û tê kirin, bînim pêşberî çavan. Ji Eliyê Teremaxî heta Şerefexan Begî, heta Ewliya Çelebî, P. Maurizio Garzonî, heta Haçatur Abovyanî û heta Von Le Cod, xebatên gelek qedirbilind li ser gramera Kurdî hatine kirin. Ji wan bi şûn de jî, Piotr J. A. Lerc, Albert, Von Le Codî, E. B. Soane, Z. Gokalp, Roger Lescot- Celadet Alî Bedîrxan, Kemal Badillî, Dr. Marûf Xeznedar, Mehaddad R. Îzady, Qanadê Kurdo, Cegerxwîn û A. Balî, berfirehî dane Kurdiya Kurmancî û kîrmanckî. Di pey wan de jî, van salên ha ku em gihîştinê, îca li ser Kurdiya Kîrmanckî, Grûba Xebate ya Vateyî, Turan Erdem, Munzur Çem, Deniz Gunduz jî, berhemên giranqedr dane. Îca va ye berhemeke dî jî, li berhemên ser rêzimana kîrmanckî zêde bû. Berhema Sebahattîn Gultekîn... Bi tevî hûrgilî nihêrtina li van xebatan, min dil heye ku weke xwendevanek û dildarekî Kurdî, li ser zimanê van berheman û li

ser hevgyrtina termînolojiya wan a rêzimanî ya Kurmancî û Kîrmanckîya me, hin pêşniyazên xwe diyar bikim.

Destpêk

Ji ber ku cîyê hîndekarî û perwerdehiyê, ji zimanê berê ve ew medreseyan welat bûne, bivê nevē, cîyê şaxdana ziman û edebiyata Kurdî, cara ewil, ew der bûne. Kesên ku cara pêşî, li ser zimanê Kurdî berhem dane, ango tehsîl kirine û mehsûl dane, ew kes bûne ku wan, di medreseyan de karê dersdariyê kiriye. Wekî dî, cîranên me yê Ermen/hay jî, ketine bin barê ronîkirina zimanê me. Ji xeynî wan, mîsyonerên Ewrûpî jî ku ji bo berjewendiyên xwe hatine welatê me, wan jî hewl daye ku hîni gramera zimanê me bibin û bi vî awayî, ji destê wan jî berhem derketine. Xebata ku li ser rêzimana Kurdî hatiye kirin, bêhtir li ser Kurdiya Kurmancî bûye û zimanê berheman jî, zimanên mîna Îtalî, Frensî, Erebi, Rûsî, Ingilîzî, Turkî û Kurmancî bûye. Li ser Kurdiya kîrmanckî, heta niha, berhemeke wisan mezîn ku berî vê serdema me hatibe dayîn, negihîştîye ber destê me.

Min dil heye ku weke xwendevanek û dildarekî Kurdî, li ser zimanê van berheman û li ser hevgyrtina termînolojiya wan a rêzimanî ya Kurmancî û kîrmanckîya me, hin pêşniyazên xwe diyar bikim

Berhemên li ser Rêzimana

Kurdî û zimanê wan

Bi awayekî dorî em dikarin weha dirêjî bidin pirtûkên rêzimanîyê: Berhema Eliyê Teremaxî, ku navê wê *Destûra Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Numûneyêd Farisî û Kurdî*, li Bexdayê, ji aliyê Marûf Xeznedar ve, bi tîpên Erebi û Kurdî sala 1971ê, hatiye çapkirin. Heta ku em bi wan berhemên zanistî yên Kurdologan nehesiyabûn, ji me tirê ku zimanê me, hema tenê bi xebata çend kedkarên sedsala bîstî, weha li hember ba û bahozên demê, li ber xwe daye. Bi xêra gotarên lêkolerên emekdar, em dibînin, bawer dikin û baş qenaet pê tînin ku ji serê çar sed salî ve ye, li ser zimannasiya Kurdî, xîretkêşan, ked û hed daye. Ji van gotaran yek jî, gotara Mamoste Qedrî ye. Çawa ku dibêje “Lê, Teremaxî, bi amaca ku hînbûna destûra zimanê Erebi, ji bo feqiyên Kurd yên ku hîn nû dest bi xwendinê dikin hêsantir bike, di sala 1000ê koçî de, ku beramberî bi 1591-1592 yê zayînî dike, bi Kurmancî, kitêbek bi navê *Destûra Zimanê Erebi Bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî* nivîsandîye. (2005, kovara Bîr, hejmar: 1 r. 193, bi heman awayî jê hatiye wergirtin.)

Peyre, P. Maurizio Garzoni ku Rojhilatnasekî Îtalyanî ye, bi navê *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*, sala 1787an, pirtûkek li Romayê, di Çapxaneyê Congregazione de, bi zimanê Îtalî daye çapkirin. Pedegogê Ermenî, Haçatur Abovyanî (1809-1848) ku li Rûsyayê, weke bavê Kurdolojiyê tê hesibandin, bi taybetî, li ser du diyalektên Kurdî xebitiye û wî wê hingê, di xebata xwe de, zimanê Kurdî, weke du diyalektan bi nav kiriye: Kurmancî û Zazakî. Di pey wî re, M. Ferdînannd Justî, sala 1880an, bi navê *Kurdische Grammatik*, li Petersburgê, bi zimanê Frensî daye çapkirin. Yusuf Ziyaeddîn Paşa, sala 1894an, bi navê *Elhedîyye-tul Hemîdiyye, Filluxetîl Kurdiyye*, bi zimanê Erebi berhem daye û li Stenbolê, di metbeeya Şîrketul Murettîbiyye de hatiye çapkirin.

Di serê destpêka sedsala bîstan de jî, ev berhem derketine: Lêkolerê Alman Von Le Cod, sala 1903yan de, li ser Zazakî, bi zimanê almanî, berhem daye. E. B. Soane, sala 1913an, bi navê *Grammar Of*

The Kurmanjî Or Kurdish Language, li Londrayê, bi zimanê Ingilîzî daye çapkirin. Keşeyê Keldanî, L'Abbé Paul Beidar, sala 1926an, bi navê *Grammaire Kurde*, li Parîsê, berhema xwe çap kiriye. Z. Oskar Mann û Karl Haddank, sala 1932yan, bi navê *Kurdsch-Persische û Mundarten Der Zaza, Hauptsachlich Aus Siwerek Und Kor*, li Berlinê, di nav Weşanên Akademiya Zanistên Prusya de, daye çapkirin. Reşîd Kurd, sala 1956an, bi navê *Rêzmana Zimanê Kurmancî*, li Beyrutê, di Metbeeya Kerem de, berhema xwe daye çapkirin. Qanatê Kurdo, sala 1957an, li Moskovayê, bi navê *Gramatika Kurdskogo Yazika Kurmancî*, bi zimanê Rûsî daye çapkirin. (Kurdo, 1990, r. 9) Kemal Badilli, sala 1965an, bi navê *Turkçe İzahlî, Kurtçe Gramerî, Kurmancça Lehçesi*, li Ankarayê, bi Ankara Basim ve Cîltevi, daye çapkirin.

Kamuran Bedirxan ku sala 1950, li Unîversîteya Sorbonê bûye endamek ji endamên hîndekariya wê derê, di Beşa Zimanên Rojhilat de dersên Kurdî daye û bi navê *Zimanê Mader*, sala 1965an, li Parîsê, berhem daye çapkirin. Ev berhema wî, sala 1977an, peyre sala 1986an di nav weşanên Ozgurluk Yolu de derketiye û vê dawiyê jî, sala 1991ê, di nav weşanên Deng de, bi navê *Turkçe İzahlî Kurtçe Gramer* derketiye. Bala me lê ye ku cara ewil, di pey Reşîd Kurd de, vî camêrî, digel têgih û terîmên Frensî û Tirkî, terîmên Kurmancî jî dane.

Berhema Roger Lescot ku bi alîkariya Celadet Alî Bedirxan hatiye amadekirin, bi orîjînalîya xwe, sala 1970yan, bi navê *Grammaire Kurde Dialecte Kurmancî*, bi alîkariya (CNRS) ANGO Naven-da Zanistên Neteweyî ya Frensî, li Parîsê, hatiye çapkirin. Peyre jî aliyê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ve, li zimanê Tirkî hatiye wergerandin û di nav Weşanên Dozê de, bi sernivîsa Roger Lescot û Kendal Nezan hatiye çapkirin. Mixabin tarîxa çapê ya vê berhemê, li serê tune.

Destpêka terîmên rêzimanîya Kurdî

Di pey Reşîd Kurd (1956) û Kamuran Bedirxan de, Qanatê Kurdo, sala 1990, bi navê *Gramera Zimanê Kurdî*, li Stocholmê, di nav Weşanên Roja Nû de, bi zimanê Kurdî berhema xwe daye çapkirin. Feqî Huseyn Sagnîç, sala 1991ê, bi navê *Hêmanê Rêzimanê Kurdî*, berhemekê, di nav Weşanên Melsa de, dide çapkirin. Wurzel Petra, sala 1992yan, li Publikationê,

1 Mamoste Qedrî, a nika, li Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê, Profesora û Gerinendeyê Enstîtuya Zimanên Zindî ye.

bi navê *Kurdisch in 15 Lektion*, di nav *Weşanên Komkar de*, berhema xwe daye çapkirin. Di pey wan re, em dibînin ku Enstîtuya Kurdî ya Parîsê dest bi Kurmancîkirina terîmên rêzimaniyê kiriye. Em dibînin ku Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, bi awayekî komxebatî û bi pisporî/profesyonelî, dest bi Kurdî kirin, yan jî Kurmancîkirina terîmên rêzimana me kiriye û bi rastî jî, gaveke gelek girîng avêtiye.

Li ser rêzimaniya Kirmanckî, zimannasê biyanî, Z. Oskar Mann û Karl Haddank, sala 1932yan, bi navê *Kurdsch-Persische û Mundarten Der Zaza, Hauptsachlich Aus Siwerek Und Kor*, li Berlînê, di nav *Weşanên Akademiya Zanistên Prusya de*, daye çapkirin. Di pey wan re, Malmisanij, sala 1992an, li Stenbolê, bi navê *Ferhenga Dumilî-Tirkî*, berhema xwe, di nav *Weşanên Deng de* daye çapkirin. (Çem, 2003, r. 356)

Sala 1996an, komek ji nuştoxên Kirmanc, li welatê Swêdê gihîştine hev û wan, bi navê *Grûba Xebate ya Vateyî*, bizaveke komxebatî damezrandiye. Wan jî, bi awayekî pisporî/profesyonelî, kedeke gelek qedirgiran, di ber Kirmanckîkirina terîmên rêzimana xwe de daye. Hîna jî germegermî didin.

Paul Ludwîg, sala 1998an, li Wiesbadenê, bi navê *Zazakî, Gramatik und Versuch einer Dialektologie*, Dr. Ludwîg Reichert Verlag, daye çapkirin. (Çem, 2003, r. 356) Selcan Zilfî, sala 1998an, li Berlînê, bi navê *Gramatik der Zaza-Sprache, Nord-Dialekt (Dersim Dialekt)* W&T Verlag daye çapkirin. (Çem, 2003, r. 357) Lerzan Jandîl, sala 2001ê, li Berlînê, bi navê *Tekstê Kursê Kirmanckî yê Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmancî*, berhema xwe daye çapkirin. Aydin Bîngol, sala 2001ê, li Berlînê, bi navê *Tekstê Kursê Kirmanckî yê Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmancî*, berhema xwe daye çapkirin. (Çem, 2003, r. 356)

Tevî van xebatan, îca Munzur Çem, sala 2003yan, bi navê *Turkçe Açıklamalı Kirmancca (Zazaca) Gramer*, li Stenbolê, di nav *Weşanên Deng de* deranî. Wî bi xwe jî, hema hema hemû terîmên rêzimaniyê, li Kirmanckî wergerandin. Grûba Xebate ya Vateyî, sala 2005an, bi navê *Rastnuştîşê Kirmanckî*, li Stenbolê, di nav *Weşanên Weşanxaneyê Vateyî de*, berhemeke giranbuha da. Hemû bi Kirmanckî ye û têra xwe rê li ber termînolojiya rêzimaniyê vekiriye. Bi dîtina min, vê koma hêja, bi vê pirtûkê, rê li ber

terîmên rêzimana “Kurdî” vekiriye. Ango Kurdiya Kurmancî jî, bi rehetî dikare jê sûd werbigire. Wan, bi awayekî têrfam û têrferasetî, ji niha ve, rê li ber geremoliya terîmên rêzimaniyê girtiye.

Her çiqas Deniz Gunduz, sala 2006an, bi navê *Turkçe Açıklamalı Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri*, li Stenbolê, di nav *Weşanên Vate de* deranî jî, bi zimanê Tirkî bû. Wî tu lêzêdekirineke berbiçav, di hêla termînolojiya rêziman de nîşan neda.

Helbet heta sala 2000î, di nav kovar û rojnameyan de, gelek gotarên xweş û hêja, li ser rêzimaniya Kurmancî hatine dayîn. Lêbelê, berhema pêşî ya bi Kurdiya Kurmancî ku bi awayekî rêkûpêkî hat dayîn, ew bû ku ji aliyê Samî Tan ve, sala 2000î, li Stenbolê, di nav *Weşanên Welat de*, derket. Samî Tan, gelek terîmên ku ji aliyê Kamuran Bedirxan ve hatibûn diyarkirin, di berhema xwe de, esas girt û ew diyar kirin. Ji van terîman, rengdêr, navdêr, kirde, lêker, rader û wekî din çend hebên dî ne. Îca gava Samî Tan, berhema xwe ya bi navê *Rêziman û Rastnivîsa Zarawayê Kurmancî*, sala 2005an, di nav *Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de* da çapkirin, çend terîmên rêzimaniyê guhertin. Di şûna “peyv”ê de, îca “bêje” bi kar aniye; di ciyê “rengdêr”ê de, “hevalnav”; tevî “hoker”ê îca “hevalkar” jî nivîsandîye. Êdî em hîna pêşqertaf û paşqertafan bûbûn; lê belê îca camêrî, “pêşgir” û “paşgir” jî derxistine pêşberî me. Di çapeke nû ya pirtûka xwe ya rêzimaniyê de, S. Tan, dê çî peyvi-keke nû li terminolojiya Kurmancî zêde bike yan dê kîjan peyvikê biguhêre, ne diyar e. Ev jî, bivê nevé, serê dildarên Kurdî, tevlihev dike. Wisan dixuyê ku em jî, dê mîna zimanzanên TDK (Turk Dil Kurumu) di hêla termînolojiya rêzimaniyê de bikevin tengasiyan.

Îca Sebahettin Gultekîn, îsal, (2011) bi navê *Ro Ser Zarawayê Kirmanckî*, Xebata Gramerî, berhemeke di nav *Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de* da çapkirin. Hem têgihên rêzimaniyê hem jî, ravekirinên li ser rêbazên rêzimaniyê, bi Kirmanckî ne. Li ser xêrê be. Ev bû nêzî deh salan e ku ez şahidê xebatên wî yên li ser Kurdiya Kurmancî û kirmanckî me. Bi awayekî aktîf, hem gava ew Kursên Kurdî, bi awayekî fermî hatin vekirin wî ders dan hem jî, herkî ku Komeleya Bipêşdexistina Zimanê Kurdî hatiye vekirin, dersa Kurmancî û Kirmanckî dide. Wer xuya ye ku wî dil heye ku di

hêla terîmên rêzimaniya Kurmancî û Kirmanckî de, lihevhatinekê/wekhevbûnekê çêbike. Tiştê ku bala me dikêşîne ew e ku S. Gultekîn, di hêla têgihên rêzimaniyê de, daye ser şopa rêzimana Kurdiya Kurmancî. Bi dîtina min, digel ku ji awayekî ve gelek baş kiriye jî, dîsa jî hin kêmasî xwe didin der.

Beşa “Termiy Gramerê Kirmanckî” gelek kurt û hindik maye. Wekî din, digel ku ji wan kombiyayîşên Grûba Xebate ya Vateyî, gelek tecrubeyên hêja derketine jî, wî, hin çekuyên/peyvîkên nû, li gor meyla dilê xwe bi kar anîne.

Meyla Vate/ Meyla S. Gultekîn/ Bi Kurmancî

herf	tîp	tîp
sey	zey	mîna/weke
nimûne	finak	mînak
hece	kîta	kîte
çeku	çekû	peyv/bêje
prefîsk/s/preverb	verkert	pêşgir ²
soffîks	peykert	paşgir
viraste	viraşte	dariştî
...	kert	pêvek/qertaf
hûmar	humar	jimar
yewhûmar	yewhumar ³	yekjimar
zafhûmar	zafhumar	pirjimar/zafjimar ⁴
awankerdiş	viraştiş	sazkirin ⁵
besît	xoser	xwerû ⁶

- 2 Mîkaîl Bilbil û Bahoz Baran, li şûna pêşgir û paşgir, “pêrkî û parkî” bi kar tînin. (Bilbil, 2008, r. 35) Gava em di ciyê “pêşgir” de bi awayê Kirmanckî, “berqertaf” bi kar bînin, dê baştir be. Bi Kirmanckî jî, bila “verqertaf” bê bikaranîn. Jixwe herfa “b” û “v” di her du diyalektan de gelek caran, bi awayekî rêkûpêkî, bi hev diguherin.
- 3 S. Gultekîn, di hemû pirtûkê de peyvika “hûmar” bi awayê “humar” nivîsandîye; lêbelê gava hatiye rûpelê 80yî, îca bi awayê “hûmar” mîna meyla kovara Vate nivîsandîye.
- 4 Di rêzimaniya Kurmancî de, heke em jî di ciyê “pirjimar” de “zafjimar” bi kar bînin, helbet dê çêtir be.
- 5 Heq heye ku bi Kurmancî jî em di ciyê “sazkirina peyvîkê” de “avakirina” peyvîkê biemilînin.
- 6 Heke bi Kurmancî jî, di ciyê “peyvên xwerû” de em “peyvên xweser” binivîsînin, dê baş be. Çi heye ku M. Çem, di berhema xwe de, ji bo peyvîkên ku bê qertaf in û bi serê xwe ne, gotiye “çekuyê besîtî” (Çem, 2003 r. 27) îca ji bo navên xweser/xwerû jî gotiye “nameyê xoserî”. (Çem, 2003 r. 32) A rast ew e ku em jî bo navên besît/yalin, peyvika “xweser” bi kar bînin.

pêrabesteyî	pêrabesteyî	hevedudanî ⁷
mana	wate	wate
hemmana	hemwate	hemwate ⁸
cins	makî ⁹	zayend
makî	mayî	mêti ¹⁰
nêrî	nerî	nêr ¹¹
kok	binke	ray ¹²
nameyê taybetî serenam	serenam	serenav ¹³
nameyê zafhûmar kome name	kome name	komenav ¹⁴
nameyê cinsî	cisiname	hevenav ¹⁵
nameyê anteyî/tewenaye tewênayîş	tewênayîş	tewang ¹⁶
îzafe	naskerî	ravek ¹⁷
temambiyaye	nasek	raveber ¹⁸

- 7 Bi Kurmanckî jî em dikarin peyvika “pêrabestî” qebûl bikin. Çi heye ku M.S. Gultekîn, di rûpelê 18an ê berhema xwe de, ji bo peyvîkên hevedudanî, peyvika “pêrabestî” nivîsandîye; îca di rûpelê 37an de, ji bo wan navên pêrabestî, peyvika “bestox” bi kar aniye û mînakên ku di rûpelê 18an de dane, eynî çend ji wan, di rûpelê 37an de dane.
- 8 Ji ber ku peyvika “mana”, bi Erebi ye, dibe ku meyla kovara Vate jî bê ser “wate”yê.
- 9 Digel ku peyvika “zayend” di rêzimana Kurmancî de ciyê xwe girtiye jî, dîsa meyla min bi xwe li ser peyvika “cins” e. Bilbil û Bahoz jî peyvika “cins” bi kar tînin. (Baran, 2008 r. 39) Lewre Mamoste Gultekîn jî, di beşa “Name” de, ji bo navên cins, peyvika “cisiname” (Gultekîn, 2010 r.36) diyar kiriye.
- 10 Heke Kurmancî jî, mîna kovara Vate, ji tiştên ku cins - yeta wan mê ye re, di rêzimaniyê de bibêjin “makî” dê xweştir be.
- 11 Heke em gişt werin ser forma “Vate” û bi awayê “nêrî” binivîsînin, xweştir e.
- 12 Em ji kê dera welatê me bipirsin, her kes dizane bê ka “kok” çi ye. Ev nesla me ya Komara Tirkîyeyê jî, hemû bi zimanê Tirkî hatine perwerdekirin û di rêzimnasya Tirkî de jî, peyvika “kok” tê bikaranîn. Bi dîtina min, em jî mîna meyla Vate, dikarin di şûna “binke” û “ray” de, “kok”ê bi kar bînin.
- 13 Meyla kovara Vate xweştir e.
- 14 Meyla kovara Vate xweştir e.
- 15 Meyla kovara Vate xweştir e.
- 16 Meyla kovara Vate jî xweş e; lêbelê meyla S. Gultekîn, hîna xweştir e.
- 17 Digel ku S. Tan jî, ji bo îzafeyê, peyvika “ravek” bi kar aniye (Tan, 2005, r. 99) heq heye ku navê ravekê, bi awayê meyla kovara Vate bê qebûlîkin. Lewre îhtîmal heye ku sibê, yek rabe û navekî di jî bibîne.
- 18 Li ba dilê min ev terîm jî, karê me zehmet dikin. Lewre ev bû serê diwazdeh salan ku em darsa Tirkî li dibistan, ji pola 6an heta pola diwazdehan didin, hîna jî zor e hînkirina wan. A baş ew e ku em bi awayê Vate, temambiyaye û temamkerdax bi kar bînin.

zemîr	caname ¹⁹	cînavk
zemîrê nîşankerdene	canameyê eşaretî ²⁰	cînavkên şanîdanê
zemîrê wayîriye	canameyê wayirtî	cînavkên xwedîtîyê
zemîrê nediyariye	canameyê nekîfşkerdey	cînavkên nebinavkirî ²¹
sifet	hevalname ²²	rengdêr/hevalnav
zerfe	hevalkar	hoker/hevalkar ²³
zerfa rewşî	hevalkarê seyînî	hokerên çawanîyê ²⁴
edat	daçek	daçek ²⁵
kar	kar	lêker ²⁶
karo passîf	karê lebatî	lêkera lebatî ²⁷
demo nikayin	demo nikayin	dema niha ²⁸
demo ameyox	demo ameyîn ²⁹	dema bê

19 Heq heye ku ev terîm, ji aliyê Grûba Vate ve jî bê qebûlîkin.

20 Nabe ku ev peyvîk jî bikeve ber peyvîka “nîşankerdene”.

21 Heq heye ku bi Kurmancî jî, tevî Grûba Vate, em peyvîka “nediyarkirî” bi kar bînin.

22 Gava em bi mentîqa Kirmanckî bifikirin, diviya ku me “embazname” bigota. Lewre ev jî divê li ber çavan bê girtin. Heq heye ku em bi Kurmancî bibêjin “bernav” bi kirmanckî jî “vername”

23 Heq heye ku em ji bo hokerê/hevalkarê, “verkar/be - kar” qebûl bikin.

24 Xweş dibe ku em di ciyê zemîrên “çawanî” û “seyînî” de, bi awayê Grûba Vate “zerfa rewşî” bi kar bînin.

25 Peyvîka “edat” hem bi Erebi, hem bi Tirkî hem jî bi Kurmancî û Kirmanckî, eynî bin xweştir e. Meyla Vate, hê xweştir e. Lewre berdat/veredat; paşedat/peydat, karê me hêsa dike.

26 Em di Kurmancî de jî, li şûna “lêkerê” peyvîka “kar” qebûl bikin çêtir e.

27 Grûba Vate jî, di şûna “passîf” de lebatî bi kar bîne, baş e.

28 Li gelek herêmên welatê me, ji bo dema niha, “nika” jî dibêjin. Em jî mîna Kirmancan, dikarin “nikayin” qebûl bikin.

29 Ev peyvîk xweş e.

Çavkaniyên ku di vê nivîsê de li ber destê min hebûn:

- Bedirxan, E. C. & Lescot, R. (1997) *Kurtçe Grameri*, İstanbul, Weşanxaneya Doz.
- Bedirxan, K. (1991) *Türkçe İzahlı Kurtçe Grameri*, İstanbul, Weşanxaneya Deng.
- Bilbil, M. & Baran, B. (2008) *Rêzimana Kurmancî*, İstanbul, Weşanxaneya Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Çem, M. (2003) *Kirmanca (Zazaca) Gramer*, İstanbul, Weşanxaneya Deng.
- Erdem, T. (1998) *Türkçe Açıklamalı Kurtçe Dil Dersleri Zazaca*, İstanbul, Fırat Yayınları.

demo viyarteo diyar | demo viyarteyo diyar | dema boriya têdeyî³⁰
demo viyarteo nediyar | demo viyarteyo nediyar | dema boriya dûdar³¹

Ji xeynî van, di berhema S. Gultekîn de, ji bo qerfata/kerta “-ê” ya zajimariya Kirmanckî, kerta “-êy” bi kar aniyê. Bi rastî digel ku xweş e û ji hin tevliheviyan re dibe derman jî, dîsa zehmet e ku di dema perwerdehiyê de bê bikaranîn.

Encam

Bi vê nivîsê, min xîret kir ku bala zimanzanên me bikşînin ser mijareke mezin. Ew jî ew e ku êdî, wa ye li zanîngehên Komara Tirkîyeyê, Kurdiya Kurmancî û Kirmanckî, bi awayekî fermî, li Enstîtuyan, ji aliyê akademisyên profesor ve tê perwerdekirin. Digel ku saziyên me yê civakî, ji hêla zanista zimanê Kurdî ve bi derengî neketinê jî, lazim e ku em di demeke herî nêz de, li ser termînolojiya rêzimanîyê, lihevkirineke lezgîn pêk bînin; da ku ji zanîngehan re bibe bingeş.

Mijara duduyan ew e ku Kurdiya Kirmanckî, bi tevî Kurmanckî, di temamê wan çavkaniyên ku li ser zimanê Kurdî weke xebat hatine kirin de, mîna du diyalektên Kurdî hatiye diyarkirin. Heta tarîxzano namedar Tqûtî, hewt seyî serrî ra ver nuseno ke “Dumbilî” yan zî “Zazayî” yew eşîra Kurdan ra yê. (Lezgîn, 2007, kovara Bîr, hejmar. 6, r. 217) Ji ber vê yekê, heta ji me bê, divê ku em di hêla rêzimanîyê de jî, xwenêzkirinekê pêk bînin ●

30 Bi awayê ku kovara Vate navê vê demê diyar kiriye, divê di Kurdiya Kurmanckî de jî bê nivîsandin.

31 Bi awayê ku kovara Vate navê vê demê diyar kiriye, divê di Kurdiya Kurmanckî de jî bê nivîsandin.

Gunduz, D. (2006) *Türkçe Açıklamalı Kurtçe Kirmanca/ Zazaca Dil Dersleri*, İstanbul, Weşanxaneya Vate.

Gultekîn, S. (2010) *Ro Ser Zarawayê Kirmanckî Xebata Gramerî*, İstanbul, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Kurdo, Q. (1990) *Gramera Zimanê Kurdî Bi Kurmanckî-Soranî*, İstanbul, Weşanxaneya Koral.

Tan, S. (2000) *Waneyên Rêzimanê Kurmanckî*, İstanbul, Weşanxaneya Welat.

Tan, S. (2005) *Rêziman û Rastnivîsa Zarawayê Kurmanckî*, İstanbul, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Vateyî, G.X. (2005) *Rastmustişê Kirmanckî (Zazakî)*, İstanbul, Weşanên Vate.

Seydayê Abdurrahman Durre û 'Kurdbname'

RAHMETULLAH KARAKAYA

Seydayê Abdurrahman Durre, di edebiyata Kurdî de, nava hesbestvanên ku di roja me de li heyatê ne, bûye hunermendekî klasîk. Helbestên wî, di sala 2006an de li Stenbolê, bi navê “Kurdbname” ji weşanên Keskesorê hatine çapkirin. Ji bo “Kurdbname”yê û nivîskarê wê yê hêja Seydayê Durre, bêminet dikarim bibêjim, ji bo zimanê Kurdî, stêrka ‘esra me ye...’ 575 rûpelên “Kurdbname”yê bi herfên Latînî, 83 rûpelên wê jî bi herfên Erebî ye...

Derya Helbestan

Helbestên ku bi herfên Latînî nivîsandine, di nava pênc beşan de hatine berhev kirin:

1. Işq û evîn.
2. Derd û birîn
3. Çîrok û dîrok
4. Felsefe û ol
5. Keşkol û pel û pol
6. Xatîme (Dawîk).

Beşa heftan jî “Fehengok” e. Di “Işq û evîn”ê de 85, “Derd û birîn”ê de 59, “Çîrok û dîrok”ê de 41, “Felsefe û ol”î de 48, “Keşkol û Pel û Pol”î de 18, “Xatîme (Dawîk)”î de jî 10 helbest hene.

Seydayê Abdurrahman Durre, helbestvanek pir xwedî huner e ku, hinek helbestên wî ji pênc-şeş rûpelan zêdetir in...

Di “Kurdbname”yê de, ji hinek helbestan pê ve, beşa “Çend şairên Kurd û zaraveyên wan”, “Kurd û Kurdistan”, “Pêşek” û “Destpêk” jî heye. Gerek di nava helbestvanên Kurd ên roja me de, hinek navên ku dîwanên wana nû hatine çapkirin jî, bête nivîsandin. Di nava van xwedî dîwanan de, divê em wan kesan ji bîr nekin: Şêx Abdurrahmanê Axtepî “Rewdeneîm”, Seydayê Mele Zahirê Teñdûrekî “Dîwan”, Şêx Mihemmed Can “Leyla û Mecnûn”, Seyid Eliyê Findikî “Dîwan”, Seydayê Mele Husnî, Seydayê Xelatî, Mele Ciwan (Nurreddin Baksî) û yên din...

Hinek helbestan du caran cih girtiye

Dîsa di beşa “Işq û Evîn”ê ya dîwanê de pênc helbest, du caran hatine çapkirin. Ev xeletî gerek di çapa nû de were rastkirin: “Dev û Lêv” him di rûpela 46an de, him di rûpela 104an de. “Mêrê Tê”,

Seydayê Abdurrahman Durre, helbestvanek pir xwedî huner e ku, hinek helbestên wî ji pênc-şeş rûpelan zêdetir in...

hem di rûpela 29an de, hem di rûpela 98an de. Di rûpela 29an de 13 dubeytî ye, di rûpela 98an de, 8 rêz lê hatiye zêdekirin. "Şêx û Şepala Erbilî", him di rûpela 75an de, him di rûpela 97an de cî girtiye. Helbestek di rûpela 90an de, bi navê "Li Kurdistanê min hildin", di rûpela 484an de jî bi navê "Dilo Rabe" hatiye weşandin. "Tilism û Sirr" jî, him di rûpela 82an de, him jî di rûpela 91an de, cî girtiye...

Pêşeka wê Mûsa Anter nivîsiye

"Pêşek", jê re rehmetyê Mûsa Anter, ku "Dîwan", di sala 1992an de bi navê "Evîna Welat-Dengê Kurdistanê" hatibû weşandin, nivîsiye...

Mûsa Anter 20ê Îlona 1992an de, li Diyarbekirê bi destê dewletê ve hate kuştin. Rehmetyê Apê Mûsa, di "Pêşek" a xwe de weha dibêje: "Di hinek dînan de, baweriyêke weha heye: Dema ku însan dimire, canê wî (rihê wî) vedigere dinyayê, dikeve bedena însanekî din. Heta ku min Dîwana Abdurrahman Durre neditibû, ev yeqînî bi min pîr sivik dihat. Lê piştî ku min Dîwana wî dît, ez jî, tev li vê baweriyê bûm. Belê bi ferqekê: Ew dibêjin ku rihê însanekê dikeve bedena însanekê. Lê ez dibêjim, ruhên ku ketine bedena Seydayê me, ne bi yek û du û siyan in! Tu dibê qey ruhên temamê rehmetyên şair û alimên Kurdan, di bedena Seydayê Durre de kom bûne.

Ma qey kî tune?

Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Mewlana Xalid, Melayê Batê, Ehmedê Xanî û Seydayê Cegerxwîn. Di "Dîwana Durre de, wek Cizîrî, eşq û tesewwuf heye, wek Feqiyê Teyran eşq û destan û tarîx heye. Wek Melayê Batê dînî ye. Bi qewmîtiyê (gelperweritîyê) jî, ji Ehmedê Xanî û Seydayê Cegerxwîn pir derbas bûye. Di felsefeya dîn de jî, wek bapîrê xwe yê Mewlana Xalid e. Di derheqê Dîwana Seydayê Durre de, ez çî bibêjim kêminî! Ji ber ku ez qenc ji ilmê wî fêhm nakim! Lê ezê bi beytekî xezûrê xwe (Abdurrahim Rahmî Zapsu), qenaeta xwe, îfade bikim. Xezûrê min, ji bo Melayê Cizîrî weha gotiye:

(...mala ku Feqîr mabû, te tijî durr û cewher kir).

Ku di vir de qesta xezûrê min ji "malê", Kurdis-tan e. Ez jî ji Seydayê xwe yê mezin Abdurrahman Durre re dibêjim: Welat ku feqîr mabû, te jî, tijî

durr û gewher kiriye! "Sed aferîn ji te re! Destê te sax be û bijî!" Ez wan çend pirsan dibêjim û yeqîn dikim ku, wê temamê Kurdan ji te re, ebediyen minetdar bin!

"Şîrê dayika welat, li te helal û xweş be!..."

Abdurrahman Durre kî ye?

Seydayê Abdurrahman Durre, di sala qirkirina Geliyê Zîlan de (1930), li navçeya Milazgira Muşê, li gundê Kêranlixê hatiye dinê. Panzdeh salan, di medresên Kurdistanê de xwendiyê. Li dora dehdonzde salan jî seydatî kiriye. Ji bilî zimanê Kurdî, Erebi, Tirkî û Farisî dizane. Di edebiyat û rêzimana Erebi, Farisî û Kurdî de zanyar e. Ji sala 1962an heta sala 1975an miftitî kiriye. Demekê li Libyayê mitercîmiya Erebi û Tirkî kiriye. Bi Erebi, Kurdî, Farisî û Tirkî deh berhemên wî yên çapkîrî û neçapkîrî hene. Di rojnama "Welat" û kovara "Rewşen" ê de, nivîsarên wî çap bûne. Endamê sazûmankar ê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye. Niha li Ewrûpayê penaber e.

Destpêka Kurnameyê

Seydayê Durre, "Bi navê Yezdanê Dilovanê Dilovîn" dest bi berhema xwe dike û weha dibêje:

*Bi dengê bulbulê sozanê Kurdistanê, dest pê ke!
Ji rengê sor gulê zozanê wê, manzûmekê çêke!*

*Li xemla kofiya kêlî, wî gulgunê werin xêlî!
Dil û can bexş û berdêlî, li wê şoxa cîhanê ke!*

*Li wê bûka key û madî, bihûne ristê azadî!
Durrên sûka Mehabadî, numune-i gerdena wê ke!*

*Li wê pîrozê, rewş û rengê ala kesk û sor û zer
-Gula Newrozê- neqşê tawusê heftrengê rojê ke!*

*Wilo wî waceb û ferzî, edake lê bi serberzî!
Bi şûrê şengê "Goderzî" xeza wî cûrê cengê ke!*

*Li Bexda. Enqere û Şamê, li Tehranê bide name!
Ji "Xanî" hilde îlhamê, "suwar be" Zîn li hespê ke!*

*Bibê îro li meydanê, suwarê wêjevanî me!
Mû'errî, Namiq û Firdewsî kanê? Hodrî holê ke!
(r.)*

Helbestvanê 'esra xwe

Seydayê Durre helbestvanekî eşq û evînê ye, derd û birînê ye, çîrok û dîrokê ye, felsefe û dîn e. Di jiyana xwe de çi dîtiye, çi kişandiye, çi bihîstiye, çi geriya ye, çi di hafiza xwe de derbas kiriye, çi fikiriye, bê tirs, bê xem, bi helbestan aniye ziman.

Ji bo wî em dikarin bibêjin, Seydayê Durre û Seydayê Cegerxwîn, du heb helbestvanên hêja yên 'esra me ne. Baxisus Seydayê Durre, mîna ku di helbestên wî de jî dixuyê, bi nêrîneke pir fireh li jiyana dinêre. Ji welatê xwe dûr e, lê çavên xwe tu carî li ser wî bernade çiyekî din... Di xeyala wî de, di hişê wî de, di zimanê wî de, di qelbê wî de, dayika welat yanî Kurdistan heye...

Seba mînakê kîjan helbestî bidim nîşan, ew xisusiyet winda nabe. Seydayê Durre, di helbestên xwe de cih dide mexlasan jî. Mîna "Seyda", "Seydakê", "Mele" "Durre" û "Durr", "Bavê Esrayê", "Bavê Iqbal"... Seyda, hevde sal e ji welatê dûr e. Lê dinêrî li Helepçê ye, lê dinêrî li Hewlêrê ye... Li Helepçê, kula dilê xwe tîne ziman.

Mîna Ferat û Dîcleyê diherike

Seydayê Durre dibe Ferat, dibe Dîcle, li her warê Kurdistanê, li her derê dinyê digere. Şewata dilê xwe, şayiya dilê xwe, eşqa dilê xwe dixê helbest, seba dîrokeke ronî dike diyarî. Seyda, îcar jî li Hewlêrê ketiye eşqê, "Şoxa Erbîlî"yê nivîsandiye:



A Durre,
R. Karakaya,
M. Sadık
Öztürk,
Muftiyê
Beykozê
Abidin
Karakaya

Helepçê

Ah û fizare! Kurdistanana min, dîlê neyar e, bindestê dijmin!
Ku bê hewar e! Piçûk û mezin, agir lê d'bare, pijî Helepçê!

Dêrsim û Agrî, Berzenc û Berzan, Erdiş û Bêgrî, Koçgirî, Zîlan
Dîsa xwîn digrî, ku Hacîûmran, xwîna şehîdan rijî, Helepçê!

Xwîna şehîdan pêl û lem dane, kund û xen û man kes tê nemane
Xirabe-w-wêran "Hiroşîma" ne, "Negazakî" ya me jî, Helepçê!

Dijminên teres gurên xwînaxar in, neyarên dexes dûpişk û mar in
Nemerdên nekes, jar jê dibarin, ku jarî berdane te jî, Helepçê!

Xeysan û Bêrût, Quds û Vîyetnam, agir û barût, bombeyên Napalm
Mig û Ilyoşin, lê bû qetlî'am, ku j'wan de jarî rijî Helepçê!

Koma Varşova! Hezar mixabin! Ku l'ber çavên we neyar û dijmin
Agir berdane Kurdistanana min, sotin, negotin we jî, Helepçê!

Millê Felahek hate şikandin—ku l'Filistînê, we 'erd hejandin,
Lê, ku b'ser me da, agir rijandin (!) kesî deng nekir qe jî, Helepçê!

Qesem bi xwîna we ya mubarek, bi wê birîna jê çû cobarek
Dijmin ku mîna we kin bi carek, derê ku bîna me jî, Helepçê!

Sonda Kawa û Goderz û Rustem, tola te hildin ku j'dijminan em!
Yanê ku Tirk û 'Ereb û 'Ecem, te ji xilas kin, xwe jî Helepçê!

Sî-çil mîlyon in, em qey tev namrin, ew roj dê were tola te bigrin,
Xortên şorişvan, Seyda bi qurban! Bijî Kurdistan, bijî Helepçê!

Dê ew dem ji bê: 'Ewr bibin sayî, roja azadî bide ronayî,
Ku b'hev ra bigrin govend û şayî! Me jî pîrr kişand, te jî Helepçê!

(r.439)

*Dîlber -me jê bala xwe da: Bejna zirav, baqên gulî-
Zulfan li dor xala veda: Lavlav li dêmên sorgulî.*

*Kofî bi morî bû zerî, tac û ferayî bû l'serî
Şoxa qebîla Omerî, dere ji çitê gulgulî.*

*Min dev kir lèvên şîrîn, derman kirin derd û birîn
Destan li nêv paxil birin, hûr- hûr gerandin sertilî!*

*Jê da ku berjêr daketim, ketme 'himêzê, raketim
Lava kirê! Pê da ketim, daxwazî, qora milmili.*

*Got: Tîremarên nav milan. Geztin gelek can û dil
Min got: Ku dermanê kulan. -tiryaqe- Şox e Erbîlî!*

*Gotî: Melayê Serhedî, Seydayê bê şerm û fedî
(Seydayê dil û bê xwedî)
Cennet, li dinyayê te dî, axret te qey navê! Bilî?*

*Min got: Bihîşt min tu yî, fal û nivîşt min bûyî
Horî sirişt min ku yî, jîna Ebed çavên kilî.*

*Got: Kevsera lêvan vexwe! Min izn û destûra te da!
Dev tu j' du sêvan dernexe, mêvan e sing û paxilî!*

*Min got: Ku Firdews berîn ew paxil û sing û ber in
Gotî: Mela! Sed aferîn! Zana û pisporê dil î... (r. 97)*

Dinyayeke pir fireh

Seydayê Durre, li Alaman li bajarê Kolnê ye, li Hamburgê ye, li Moskow e, li Viyanayê ye, li Serhedê ye, li Helepçê ye, li Hewlêrê ye, li Vatîqan e, li Stenbolê ye, li Helebê ye, li Hicazê ye... Digere, difikire, dinivîse lê agirê li dilê wî dadaye, tu carî venamire. Hey diçe geş dibe, hey diçe diçûrise. Hey diçe dibe heyv, şevê ronî dike, dibe roj, royê ronî dike... Seydayê me îcar jî li Stenbolê ye... Sala 1991an kula dilê xwe weha aniyê ziman:

Dilo rabe

*Dilo! Rabe ji nav koma neyara!
Wilo nabe! Were zozan û wara!*

*Here! Botan, here Şengal û Mazî!
Here! Cîlo ku cenga serfirazî.*

*Here! Nav ap û nav pismam û xalan
Met û xatîk û dotmam û hevalan.*

*Derê zozan û kon û çit û holan
Here nava şivan û tip û colan.*

*Ji Qers û Îdirê, Dîgor û Anî
Here Bazîdê, tirba pîrê Xanî!*

*Ku ew pîrê me Kurda ye, çi pîr e!
Li textê can û dil şah û wezîr e!*

*Ziyaret ke tu wê tirba mubarek!
Ku ew Ke'ba me Kurda ye, bi carek!*

*Wekî ku j'bo me îman e Mem û Zîn
Welat qîbla dil û can e, xebat dîn.*

*Here! Nav koçer û nav êl û wara
Binêre ka çi lê anîn neyara!*

*Binêr! Her der ku lê xwîna şehîda
Welat dayka me ye, şîrê sipî da!*

*Bihîşt Serhedê, baxê gula ye
Ku ew Quds me tê, qîbla dila ye!*

*Wekî bulbul ku Seyda lê dixwîne!
Dilê wî kul heye, nava wî xwîn e.*

*Dinale! Ev ku bû şêst û du sal e,
Dinale! Hêj dinale, hêj dinale!..*

(r.121)

Di jiyana min de Seydayê Durre

Ji piçûktaya min de heya îro, ez Seydayê Abdurrahman Durre, mîna apê xwe nas dikim. Çinku bavê min ê rehetî miftiyê Beykozê Mehmet Abidin Karakaya (7.7.1993 Stenbol), miftiyê Milazgirê Mehmet Şakir Karaman (1973- Hicaz), miftiyê Tekirdağê Ali Arslan (1995 Stenbol) û Seydayê Mehmet Sadık Öztürk (2010- Tetwan), mîna destebirayê hev bûn. Ya tê bîra min, salê du-sê caran mitleqe Seydayê Durre dihate serdana bavê min. Li Eleşgirt û Tutaka Agriyê, li Eflaniya Karabukê, li Alaçama Samsunê û li Malkaraya Tekirdağê miftitî kir. Apê Durre, ji bo ku gotina xwe ji kesî teksîr nedikir, bê minnet bû û bi cesaret bû, serê wî her tim di teqe reqê de bû. Cemaeta ku ew tê de bû, sohbekeke pir şîrîn hebû, coşî hebû, helecana hebû, mineqeşe hebû.

Roja ku dibû mêvanê me, em bêhempa kêfxweş dibûn.

Di sala 1969an de, em salek bû hati-bûn Stenbolê. Min li Lîseyê Sariyerê dixwend. Di rojnameyan de çî tevger û konferans hebûn, ez ji bo însanên navdar diçûmê wan deran. Rojeke şemiyê jî ez li Çemberlitaşê çûme tevgereke ku Alparslan Türkeş tê de hebû. Wî çaxî Partiya Cumhuriyetçi Koylu Milletî nû bi dest xistibû. Paşê navê partiyê kirin MHP. Êvarê çûme Beykozê. Min lê nihêrî Apê Durre hatiye mêvaniyê. Di nav sohbetê de wî, di heqê Türkeş de malûmateke hêja da min û got:

- Gerek em neyarên xwe rind nas bikin û ji wana dûr bisekinin...

Sala 1975an, li Edremita Balikesirê ez di Tugaya 17yan de esker bûm.. Hê du meh bû çûbûme eskeriyê...

Ji bo ziyaretê, ez gazî kirime Tugayê. Ez şaş mam, kî ye eceba rêya wî ketiye wan deran. Çûme nizamiyê, min dît ku Apê Durre, bi 'heşmet li benda min di-sekine...Bêhesab kêfxweş bûm, dilgeş bûm. Min destê wî maçî kir. Meger, lawê wî yê mezin Sait jî li wir esker bûye. Hattiye cem, wî jî ji bavê min bihîstiye ku ez jî li wir im, gazî min jî kiriye. Wê rojê, me demeke pir xweş bi hev re derbas kir. Wextê li Stenbolê bû jî, carcaran dihate cem bavê min ê rehetî. Haya me her tim ji hev hebû. Paşê mecbûr ma, koç kire Ewrûpayê!


Li Kurdistanê min hildin

Seydayê Durre, şev û roj, meh û sal nasekine, birîna dilê xwe bi "behra gotinê" dide sarkirin. Dîsa ketiye derd û kesera welat, dîsa ketiye nava 'hesret û helecana dayika dayika xwe. Dîsa xurbet, bûye barekî mîna Çiyayê Agirî, mîna Çiyayê Sîpanê, hilweşiyaye ser rihê wî, ser milên wî. Di wê helbestê de jî, daxwaza xwe ya dawî, yanî weseyeta xwe dike ji xortên welat re ●

25 Nîsan 2011 / Stenbol

Kurdname

Abdurrahman Durre



Bergê
kitêba
Abdurrahman
Durre
"Kurdname"yê

Li Kurdistanê min hildin

*Dilo rabe! Dilo rabe! Ji min bistîne dizgînê!
Gula azadî pê şa be! Li zozanê Şerefdînê.*

*Li bulbul bîne mizgîna gula Sultanê Newrozê
Ku xulxul bîne lê mîna birîndarên li "Narîn"ê.*

*Werin lê wek qulingê warê "Dalanperr" û Umranê
Wekî şêr û pilingê "sozê sê sînor" û Xoybînê.*

*Bi wê bûka belekçava xwe şabin, lê wekî zava
Ji Xaxrosê, 'heta ava Erez, Munzur û Hemrînê?*

*"Li we wesyet dikim Kurdno" dibe ku l'xurbetê bimrim!
"Ji bo xatrê Xwedê be!" hûn ji wê, min bidne anînê.*

*Li Kurdistanê min hildin, bi irf û adetê Kurdî,
Ji axa wê, me çav kildin, li paxil bidnê danînê.*

*Ji guftên "Hezretî Xanî, Cegerxwîn, Nalî û Hacî,
-Dema l'gorê min anî- bixwînin: Hûn Mem û Zînê.*

*Li ser kêla min binvîsin: "Welat qibla dil û can e"!
Bi Kurmancî bidin xwendin -li ser qebra mi- telqînê.*

*Li dû, çend pîrekan bînin, bi dil sozî bila bêjin,
Bi ser min da bilûvinin, li şûna Dewr û Yasînê.*

*Ewa ye wesyet û daxwaz û vana min, ji we merda!
"Ji bo eşqa Xwedê be!" ez dibêjim, careke dinê.*

*Li Kurdistanê min hildin, serî tê da li paxil din,
Gulê pêşkêşî bulbul din, li wê, wî bixne hêlînê. (r.484)*

Günter Grass, qedirşinasî û em

ABDULLAH ÎNCEKAN

aincekan@gmail.com

Çend roj berî ku Günter Grass, nivîskarê navdar yê Alman û xelatgirê Nobelê, were bajarê me, ez bi hatina wî dihesim û derhal ji bo bilêtê li salonê digirim. Elbet ez texmîn dikim, ku hemû bilêt hatine firotin, lê dîsa ez ji xwe re dibêjim: Grass ewqas nêzîk hatiye û jixwe kal e jî. Divê ez wî bibînim û rêyekê bibînim, ku biletêkê peyda bikim.

Xanima li ser telefonê dibêje, ku hemû bilêt hatine firotin û ez dest bi lavayan dikim, lê ew jî çare nake. Rêyek tenê li pêş min dimîne: Divê ez nîv saetek berê biçim wir û mêze bikim, ka ez dikarim têkevîm hundir yan na. Ev halê han çîrokeke ji piçûktiya min tîne bîra min: Bavê min digot, di salên heştêyî de gava me li bajêr xwarin, benzîn û zexîret dikirî, em bi rojan diketin pê kîrîrînê, carna jî em destvala dizivîrîn malê.

Îcar de were lê mêze bike: Yên me ji bo xwarin û vexwarinê diketin rêzê, yê xelkê ji bo guhdarîkirina nivîskarekî.

Li ber derê salonê ez rastî qerebalixêke mezin tîm û ez jî bi wan re dikevîm rêzê. Di dawiyê de biletêk bi destê min dikeve

û ez dikevîm hundir. Her çiqas ji nebûna bilêtan halê salonê ji berê kifş be jî, ez bi çavên xwe bawer nakim: Salona terrîkî tije ye û gelek ji wan xort û ciwan in. Bi deqeyan ez li devûdorê xwe mêze dikim: Xwedê bide meriv, dide meriv! Kal û pîr, jin û mêr, keç û xort, bi sedan li hêviya nivîskarê xwe ne...

Günter Grass tê ser sahneyê. Ew tenê tiştêkî dike: Ji kitêba xwe ya nû „Grimms Wörter – Eine Liebeserklärung“ (Peyvên Grimm – Daxuyaniya evînekê) dixwîne. Kitêb li ser herdu bira Jakob û Wilhelm Grimm e. Wek tê zanîn, du xebatên muhîm yê van herdu birayan hebûne, ku ji bo me Kurdan jî dikarin bibin mîsal. Jacob û Wilhelm xebatên xwe li ser du esasan ava dikin: Ew ji hêlekê ve çîrokên gelêrî yê Almanan berhev dikin, ji aliyê din ve jî ferhengeke Almanî amade dikin. Bi van herdu xebatan ew bingeha standartkirina Almanî datînin û bîra gelê xwe muhêfeze dikin. Îcar Günter Grass jî di neh beşan de li ser heyat û derûdorê van herdu bira dişekine û di her beşê de giraniyê dide herfekê ji alfabe yê û bi vî şiklî


Mîsal li dû mîsalê di serê min re derbas dibin: Qîmeteke mîna Celadet radîbe bîrekê îcare dike, da ku Hawarê derxe...
Hemzeyê Muksî di kîjan feqîrtî û belengaziyê de heyata xwe dewam kiriye kes pê nizane

gotinên ji ferhenga wan cardin tîne ziman û eleqeyê bi ferhengê girêdide. Di nava çîroka Jakob û Wilhelm de ew mijarê tîne ser jiyana xwe û mîsalên têkildar ji heyata xwe dide (mesela gava qala sansûrê dike, mîsalan ji heyata xwe jî dide). Bi gotineke din, berhema wî berhemeke biyografîk û otobiyografîk e. Bi pirranî ji kelîmeyên, ku di ferhenga herdu birayan de ne, ew hereket dike û mîsalan ji heyata xwe dide.

Günter Grassê heştê û sê salî xebata xwe wek xebata otobiyografîk ya dawîn nîşan dide. Ev gotina wî weke xatirxwestin bê fêmkirin jî, însan meraq dike, ka ewê li ser vê soza xwe bisekine yan na. Lewra, wek tê zanîn, ew nivîskarekî welûd e û bi her kitêba xwe li welatê xwe rojev tayîn kiriye.

Saetekûnîvekêbisûkûneteke nedîtî gel guhdarî wî dike. Xêncî kuxika çend kesan ti deng tune ye: Ne pisepisa merivan, ne zilê telefonê... Ez jî mîna mêvanên din guh didim vî camêrî û bi wî re dikevim nav cîhana kelîmeyan û tarîxa Almanan. Dû re... Dû re hemû guhdar radibin pê û bi qasî deh deqîqeyan li çepikan dixin! Elbet têkiliya vê rewşa han bi kesayetiya Günter Grass ve heye, lê dîsa jî ev qedirşînasî min bi hûzin dike, lewra ez vê şevê jî gelê xwe ji bîr nakim.

Li ber derê salonê ez bi deqîqeyan disekinim û li eleqeya gel temaşe dikim û Kurdên min tên bîra min. Ez bi xwe jî xwe re dibêjim, tiştê ku qewmekî bi hêz dike, dêmek ev e: Qîmetdayîn û qedirşînasî! Qedirgirtina ziman û çanda xwe, qedirgirtina ede-



biyata devkî - mêjûyê xwe yê neteweyî, qedirgirtina kesayetiyan...

Mîsal li dû mîsalê di serê min re derbas dibin: Qîmeteke mîna Celadet radibe bîrekê îcare dike, da ku Hawarê derbixe... Hemzeyê Muksî di kîjan feqîrtî û belengaziyê de heyata xwe dewam kiriye kes pê nizane, ji ber ku kesî xwe lê negirtiye... Xizaniya Ekrem Cemîl Paşa di nav de jiyaye, dilê meriv diêşîne... Mîsalên roja me tên bîra min...

Ez li gengeşiyên li ser standarbûna Kurdî difikirim! Çiqas perspektîfeke teng û jakoben!

Li aliyê din: Çima li mala herkesî Mem û Zîn a rehmetî, Dîwanên Mela û Feqî, kovarên Jîn, Kurdistan, Hawar û hwd. tune ne?

Bi van hîs û fikaran, di destê min de "Grimms Wörter", ez berê xwe didim malê. Bi rê de ez jî xwe re vê dibêjim: Ev tişt li ba me hebana, jixwe em jî di vî halî de nediman!

Günter Grass behsa Kurdan dike

Limalê ez berhema kumînin hin beş jê guhdarî kirine, dixwînim. Nivîskar behsa herdu birayan

û xebatên wan dike û li hin ciyan gava behsa gotinekê dike, meseleyê tîne bi anekdotan ji heyata xwe ve girêdide. Loma jî her çiqas behsa salên 1800î bibe jî, em tîne salên dû şerê cîhanê yê dudiyar. Ew bi hostatî di nava dem û dewranan de çargavî diçe û tîne xwendevanê xwe bi xwe re dîgerîne.

Gava ew qala wê dike ku Jacob Grimm di 1848an de li bajarê Frankfurtê li dêra bi navê Paulskirche wek endamê Kongreya Neteweyî tevî siyaseta dibe, mijarê tîne ser vê dêrê. Û dû re behsa wê dike, ka ew cara ewil çawa û çaxtê çûye wir.

Grass dibêje:

"Tehrûbeyaya min ya li dêra Paulskircheyê tenê ji bo sibehekê ye. Di cotmeha 1997an de, di dawiyê fûara kitêban ya Frankfurtê de, diviyabû xelata aştîyê ya kitêbfiroşên Alman ji bo nivîskarekî Tirk bihata dayîn. Komeleya Borsayê xeber da min, ku xelatgir Yaşar Kemal xwestiye ku teblîxa li ser wî ez amade bikim. Ev ji bo min hêsan bû, ji ber ku Kemal çîrokbêjekî efsûnî û nivîskarekî bi metanet bû û loma jî tim û tim li Tirkiyeyê di nav talûkeyan de bû.

Yûsif

Mahmûd Derwîş

Ji 'Erebî: Ali Karadeniz

Ez Yûsif im, baba!
 Baba, birayên min hez ji min nakin.
 Li nav xwe min naxwazin, baba!
 Min diêşînin, bi peyvan min kevir dikan
 Dixwazin ez bimirin ji bo pesnê min bidin
 Deriyê mala te dadan û ez hiştim li der
 Wan ez terikandim ji axa min
 Tiriyên min jahrî kirin, baba!
 Leyistokên min pelixandin, baba!
 Çaxa bayê sibehê hat bi porê min lîst, aqil avêtin
 Û li min hêrs bûn, û li te hêrs bûn
 Baba, ma min çi kiriyê bi wan?

Perperîkan danîne ser milên min
 Sinbil bi alî min ve xwar bûne
 Û çivîk di kefa min de razayîne
 Ka min çi kiriyê bi wan, baba?

Û ji ber çi ez?
 Te navê min danî Yûsif
 Lê wan ez avêtim birê û xistin stûyê gurg
 Gurg mihrîbantir e ji birayêd min!
 Baba, yek din bû çaxa min got:
 Min didît yazdeh stêrkan û rojê û hîvê, min didît ji
 min re secde dibûn.

Min bi alîkariya kitêbên wî berê xwe da Anatolyayê, gav bi gav li pey destana Anatolyayê ketim û teblîxek nivîsî, ku -jixwe çawa dikaribû weha neba- bû sebebê îtirazê, ji ber ku tê de behsa Kurdekî ji Tirkiyeyê û zilma ku li wê derê li ser Kurdan dom dikir, dihate kirin." (Grimms Wörter – Eine Liebeserklärung, r. 160)

Grass dût û dirêj qala teblîxa xwe dike: Ew li ser berhemên

Yaşar Kemal û nivîskariya wî di-sekine. Dû re ew mijarê cardin tîne ser Kurdan û dibêje:

"Di dawiya teblîxa xwe de min ji nivîseke Yaşar Kemal îqtibasek kir, ku tê de zilma li ser Kurdan ya li welatê xwe şikayet dike û pê re mesûliyeta demokrasiya welatên rojhilatê bi bir tîne: "Li ber şemûga qirnê bîstûyekan meriv nikare gelekî, grûbeke neteweyî, ji mafên însanî bêpar

bihê. Hêza ti welatekî ji vê re tune. Di netîceyê de hêza însanan bû ku Amerîkayî ji Veitnamê, Rûs ji Efxanîstanê avêt der û mûcîzeyê Afrîkaya Başûr anî holê. Cumhuriyeta Tirkiyê nikare weke welatekî lanetkirî bi domkirina vî şerî (ê li hember Kurdan) têkeve sedsala bîst û yekê. Wijdana mirovatîyê wê alî gelên Tirkiyê bike ku, ev şerê bêînsanî biqedîne. Xisûsen gelên wan dewletên ku sîlehan difroşin dewleta Tirk divê alî bi-kirin ku...."

Muxatabê vê gotinê Alman bûn. Loma jî min gotina xwe bi mesajekê qedand ku, muxatabê wê guhdarên xwedîpere yên Frankfurtê û siyasetvanên navdar bûn ku di qorên pêşiyê de rûniştibûn: "Kî li vir, li dêra Paulskircheyê, berjewendiyên hikûmeta Kohl/Kinkel biparêze, dizane ku Almanyaya Federal bi salan e musaade dike ku çek biçin Cumhuriyeta Tirkiyê ya ku gelê xwe bi vî şerî diqewirîne. Heta li dû salên 1990î, gava taliheke ji bo me çêbû û Alman bûn yek, tank û çekên mezin yên ordiya Almanyaya Rojhilat ji bo vî welatê ku şer dike hatin şandin. Em bûn şîrikê şer û niha jî şîrik in. Ez ji welatê xwe şerm dikim ku bûye feqîrê aboriyê ku hikûmeta wî musaadeya şerê qatîl dike û di ser de jî mafê îlticayê nade Kurdên ku ji zilmê direvin." (Grimms Wörter – Eine Liebeserklärung, r. 162)

Belê, navdarê Alman Günter Grass li mekanekî ewqas muhîm behsa êş û elemên me Kurdan dike. Ka gelo navdarên Kurdên me di civînên muhîm de behsa çi dikin? ●

Eşîrên Herêma Botan-IV

Eşîra Teyan

M. MUNİR TİMURTAŞ

Di herêma Botan de yek ji wan pênc eşîrên şilêd, yek jê eşîra Teyan e. Eşîra Teyan, di bingeha xwe de ji du bavan pêk tê: Esefatan û Raşidan. Esefatan ji Mihê Bapîr tê. Di bin rêvebiriya Mihê Bapîr de ji alî Sûriyeyê ve hatine herêma Botan û di bin mîrîtiya mîrê Cizîrê de bi cih bûne. Eşîra Teyan ên pisaxa, ji nesla Mihê Bapîr in. Ew jî, ji neh pisebavan pêk tên:

- 1-Mala Şengê. Bi Mala Ferhên têne naskirin.
- 2-Mala Şeref. Bi Mala Kerevên têne naskirin.
- 3-Mala Fendo.
- 4-Mala Xencer ê Dirbês.
- 5-Mala Exmurê Evdîrrehmên.
- 6-Mala Elî Axa.
- 7-Mala Şabazî.
- 8-Mala Mîrêk.
- 9-Mala Zeydîn

Ev her neh bavik pisaxa ne. Lê bavikê pêşivanî û axatiya eşîra xwe kirî û heta niha jî Mala Şeref ê Şengê û Mala Emerê Temer e! Evdilayê Raşidan, pisebavek e, lê pisebavekî boş e, ji wan re dibêjin Çoxzeran. Yê pêşivanê Çoxzeran

navê wî Sêvdîn e. Mîrek ji mîrên Cizîrê, keyfa wî ji Sêvdîn re tê û çoxekî xwe yanî kurkekê xwe yê zer diyarî dide Sêvdîn. Ji hingî û heta niha ji wan re dibêjin Çoxzer, yanî Çoxzeriyên navê xwe ji wê derê standine. Ji bilî pisaxa û Raşidan çend bavikên din jî yên Teyan hene:

1-Berkiyan: Di bingeha xwe de ji Kurdistanê Iraqê hatine û di Herêma Botan de bi cih bûne. Yê pêşivanê Berkiyan M. Ehmed e. M. Ehmed, bi Mihê Bapîr re dan û standin kirine, bi hevdu re rûniştine û ji hevdu re bûne quwet. Ev pisebavê Berkiyan jî ji pisaxa tên hesabê.

2-Baliyan: Eslê xwe Şêxbizîni ne. Bes ev Baliyê ku eslê xwe Şêxbizîni li herêma Botan hindik mane. Lê ev Baliyê ku niha zehf in weke ji devê kal û pîran hatî bihistin ji Şamê hatine. Ema çî Baliyê ku eslê xwe Şêxbizîni be çî ji Şamê hatibe hatine xwe bi Mihê Bapîr girtine û bi hev dûre mane ew jî bûne Teyî.

3-Elîcanan: Eslê xwe Harûnî ne. Ji gundê Elcanyayê hatine. Di dema Tetu Birahîm de xwîni

Eşîra Teyan, di bingeha xwe de ji du bavan pêk tê: Esefatan û Raşidan. Esefatan ji Mihê Bapîr tê. Di bin rêvebiriya Mihê Bapîr de ji alî Sûrî ve hatine herêma Botan û di bin mîrîtiya mîrê Cizîrê de bi cih bûne

bûne. Tetu Biraħîma yek jî pismamê xwe kuştiye. Mesela Tetu Braħîma di kovara Nûbiharê de jîmara 112, di mebesta eşîra Harûnan di rûperê 59ê de me behs kiriye." Piştî xwînîbûna wan, koçber dibin û diçin cem mîrê Şaxê Mîr Mihemed. Mîr Mihemed, Elîcana bi Teyan re rêdike zozanê Ewrexê. Ewrex bi ser bajarê Xesxêr ve ye, li qûntarê çiyayê Konqendîl ve ye. Piştî çûna Elîcanan bi Teyan re çûne Ewrexê, hinek ji Elîcanan weke yê ku bi Silo Ewrexî hatiye naskirin li Ewrexê maye heta niha jî li wir e bi xwe cihî hinek dî bi Teyan re vegerane deştê û di nav Teyan de mane û çî qeder ku eslê xwe Harûnî ne jî bes îro ji qebîleyeke Teyan têne hesabê û di nav Teyan de jî xudan itîbarek giring in. Elîcanan yê herî esîl Mala Mehmed Dana ne, ewên ku niha bi Mala H. Osman ê Biraħîm têne naskirin. Yê axatiya Elîcanan û rêvebiriya wan kirî heta roja me ya îro jî Mala Mehmed Dana ne.

Elîcana di exlaqê xwe de wek eslê xwe yê berê ku Harûnî ne serhişk in, hej tiştê bêexlaqî jî nakin; wek jin revandin û tiştên kirêt. Mînakên van tiştan di serboriyê wan de hene. Yek ji wan mînakên jî ev e:

Di dema Simailê Şahîn de ewê ku ji Mala Memedan e û hem rihspiyê wan e, kurikek dotmama xwe direvine û dibe cem mala mîrê Şaxê. Simailê Şahîn pey wan diçe mala mîr. Simailê dibêje: Mîrê min! Ev keçik û kurik dotmam û pismamê hev in û biraziyên min in. Tu ji kerema xwe re wan bide min ezê wan bibim malê û ji wan re xelêkî bideng jî bikim. Mîr jî baweriyê bi Simailê Şahîn tîne û keçik û kurik teslîmê Simailê Şahîn dike û tîne ser Ava Nêrdûş pira Baguzê. Simailê Şahîn kurik û keçikê herdukan bi şûrê xwe dukuje û wan davêje Ava Nêrdûşê.

Ji hingî heta niha keçrevandin di nav Elîcanan de çênebûye. Bi taybetî di nav Mala Memedan de bes di sala 1942ê de dema mişhetiya xelayê de çend malê Elîcanan diçin binxetê. Li wê derê keça bi navê Ezîme bavê wê dide xortekî, Ezîme wî xortî qebûl nake û bi xortek dî re yê bi navê Silêmanê Hot yê eslê xwe Deştêsêniye re direve. Pismamekî Ezîmê yê bi navê Eliyê Şahîn diçe ji bo Ezîmê û Silêmanê Hot bikuje, lê Silêmanê Hot pê agahdar dibe ku eve pismamê Ezîmê yê wî bikujin Silêman jî tim hay ji xwe dimîne. Rojekê xwe li hewşa xwe veşartîye, dinêre waye Eliyê Şahîn ji

wir ve tê. Hê Eliyê Şahîn negihayî hewşê Silêman, berê çeka xwe dide Eliyê Şahîn û wî dukuje. Li pey vê bûyerê re xet asê dibe û çûnhatin zehmet dibe û hal û tola Eliyê Şahîn dimîne li erdê û Ezîme jî nehatiye hewandin û xerêza wê jî nehatiye hewandin. Bes tiştê hatî bihîstin xerêza Ezîmayê li Mûsilê bi cih bûye.

Wek din jî Elîcanan merd in, bi tifaq in û girêdayê rêvebirê xwe ne li gorî exlaqê eşîrî.

Di edetêke Elîcanan de şevêk heye, dibêjinê Şeva Xidir-Ilyas. Di wê şevê de xwarinek tê çêkirin navê wê pêxîn e. Pêxîn ji ce, genim, garis, nîsk, nok tê tevlihevkerin, di sêlkê de bê don ser agir tê qelandin û tê hêrandin û bi vî awayî dibe pêxîn. Keçik û kurikên dilê wan ser zewcandinê hebe hinekî vî pêxînê dixwin û hinekî dema razanê tavêjin devê xwe û avê ser de nakin, wilo dimîne devê wan de û radizin ka di xewna xwe de ava kîjan malê vexwin nesîbê wan ê zewacê ji wê malê ye. Ev li gorî baweriyaya wan a kevneşopiyê.

Me di pêşiyê de jî gotibû, bavikê Teyan yê pisaxan ji 9 (neh) bavikan pêk tê, lê hinek bavikên dî jî hene ku çiqasî eslê xwe de ne Teyî bin jî, lêbelê girêdayê hinek van pisaxan ne weke Kiçanokan, Cûna Heyderan, Hîmaniyên. Evên hanê girêdayê bi mîr ve ne û bûne Teyî. Baliyan girêdayê bi Zeydîn ve ne, ew jî bi demê re bûne Teyî.

Eşîra Teyan nêzî 2400 maliye. Belkî hê jî bêhtir bin jî li gorî gotinan hinek kal û pîran ji bilî Herêma Botan Teyî li gelek deverên dî jî hene wek Dîlok, Rehayê, Wanê, Mêrdîn û Hetayê. Belê qedera Eşîra Teyan jî weke qedera her eşîrê Koçer ê Kurd sebeb şert û mercan ew jî mecbûrê rûniştinê bûne û avayî ji xwe re ava kirine û bûne xwedî gund.

Eşîra Teyan niha ji 34 gundên derdora Cizîr û Silopyayê pêk tîne:

- 1-Besta Belek: Ev gund ê Mala Şengê ye û ava ye.
- 2-Gawîte: Ev jî yê Mala Şengê ye û wêran e.
- 3-Ziristên: Yê Mala Şengê ye û ava ye.
- 4-Gêlan: Yê Mala Şengê ye û wêran e.
- 5-Hesedok: Yê Mala Fendo ye û wêran büye.
- 6-Darêxezalan: Yê Mala Fendo ye û wêran e.
- 7-Babindeq: Yê Mala Fendo ye û ava ye.
- 8-Cihbirkan: Yê Mala Şeref e û wêran e.
- 9-Bazeytik: Yê Mala Şeref e û wêran e.
- 10-Kefareşik: Yê Mala Şeref e û wêran e.



- 11-Başwan: Yê Mala Şeref e û ava ye.
- 12-Gorikan: Yê Mala Şeref e û ava ye.
- 13-Ebade: Yê Mala Exmur e û wêran e.
- 14-Xezayî: Yê Mala Elîcanan e û ava ye.
- 15-Serê Biyê: Yê Mala Elîcanan e û ava ye.
- 16-Xulana Jêrî: Yê Mala Elîcanan e û ava ye.
- 17-Şêlmûk: Yê Mala Elî Axa ye û wêran e.
- 18-Bilindedarê: Yê Elîcanan e û ava ye.
- 19-Zêrekan: Yê Mala Elîcanan e û wêran e.
- 20-Birkeh: Yê Biliyan e û ava ye.
- 21-Xirabalîsan: Yê Biliyan e û wêran e.
- 22-Milazoran: Yê Biliyan e û wêran e.
- 23-Bênderokan: Yê Biliyan e û wêran e.
- 24-Fêrisiyê: Yê Biliyan e û ava ye.
- 25-Serav: Yê Nîviya û Biliyan e û wêran e.
- 26-Karux: Yê Nîvî û Baliyan e û ava ye.
- 27-Taqyan: Yê Mala Mîrik e û ava ye.
- 28-Bedro: Yê Mala Mîrik e û ava ye.
- 29-Hevênakan: Yê Mala Mîrik e û ava ye.
- 30-Mixaran: Yê Mala Mîrik e û wêran e.
- 31-Nêrwan: Yê Mala Mîrik e û ava ye.
- 32-Çemqeran: Yê Mala Elîaxa ye û ava ye.
- 33-Avkaçûkan: Yê Mala Şeref e û wêran e.
- 34-Cêrbîrka: Yê Mala Şeref e û wêran e.

Gundên Eşîra Teyan yên li deştê ev in. Belê 6 gundên dîtir li zozanan jî hene. Ew jî ev in:

- 1-Hosyan: Yê Mala Elîcanan e.
- 2-Xenzûkê: Yê Mala Elîcanan e.

- 3-Aqê: Yê Pisaxan e.
- 4-Holê: Yê Pisaxan e.
- 5-Kalê: Yê Pisaxan e.
- 6-Kevot: Yê Pisaxan e.

Zozanê Eşîra Teyan, zozanê Şengê ye û di dema Qoçî Beg de bo wan hatiye dayin. Di bin navê Zozanê Şengê de Mila Mêrgê, Masîro, Mila Mêzergê, Meydan Mêşkan, Kanî Geniman, Mexelê Reşê, Çêlê Jinan, Girê Hesino jî hene.

Eşîra Teyan jî weke eşîrên derdora xwe çawa xwedî axa ne û bêyî axa nabe, wisa bêyî mitirb jî nabe. Mitirbên wan hene. Mitirbên Teyan Mala Sofî, Mala Qenco û Mala Ferhoyê Reş in. Koçk û dîwan bi şitexalî û stranên mitirban û bi şitat û pîtatê wan digerin. Di xêlan de dahol û zirnê ew lê didin, xêl bi wan germ dibin û govend bi wan digerin. Belê dema şerekî biqewime di neqeba du eşîran de, axa bang dike mitirbê xwe û mitirb tên û dahola şer lê didin. Lêdana dahola şer jî cuda ye. Zirne di şeran de nayê lêdan. Sebebê lêdana daholê ev e ku herkes seh bike ev şer e ji bo kesek xwe nede aliyekî û herkes here şer û hem jî dema di şer de mitirb li daholê bidin bêhtir însan dikeve germîtiya şer û bêhtir şer dike û hem yê hatin şer, ji ber mitirban nikarin birevin. Yê qehremaniyê bike jî û yê bireve jî mitirb wan dibîne. Li gorî dîtina yê mitirb ew însan an dê bê pesinkirîin an dê bê zemkirîin. Ji ber vê qasê di şeran de hazirbûna mitirban li gorî qaîdê eşîran şert e.

Mitirbê eşîran bi wan re diçin zozanan û têne deştê. Aboriya mitirban ne pez ne bazirganî ye,

bes aboriya wan ser gelê eşîrê ye. Bibe xêlê yekî diçin xêlê wî, pereyan ji xwediyê zavê distînin. Xwedê kurekî bide yekî diçin pîroziya wan ji xwe re pereyan ji wan distînin. Gel di nav xwe de penîr, şîr û her tiştan gel heyî, wan jê bêbehîr nahêlin. Belê mitirb di bingeha xwe de hunermendê gelê Kurd in. Sebeb ku xwe bi hunerê ve mijûl kirine, ji bayê peydakirina pereyan û xwedîkirna heywanan ketine û ji bêmicallî muhtacê gel mane. Dema ku muhtacê gel mane mixabin gel jî bi çavê itîbarê li wan nenêriye. Ev tê wê wateyê ku gelek, dema bêrêxistin be û bêhêz be tu tiştê xwe nikare biparêze. Berovajiyê vê, ew tiştê ku li cem wî gelî muqeddes û bi qedr in wek mela û hunermendan bê qedir dibin. Belê dema tu dinêrî li cîhanê tu dibînî ku evan hunermendan cihê xwe sira rekortmenê bacê de girtî ye.

Dema mirov li eşîrên Kurdan dinêre, gelek tiştên wan ê hevpar dibîne: Şerê eşîran bi eşîrên xerîb re û şerê wan yê xwebixwetî çêdibin. Şerê Eşîra Teyan bi Eşîra Jîrkiyan re gorî gotina kal û pîran di neqeba herdu eşîran de 118 kes hatine kuştin û sebebê şerê wan ev bûye:

Karwanekî Teyan diçe zozanan ser kaniyekê di-sekine. Ew kanî jî kaniya Gêrê Ezmanan e û bêhna xwe vedidin. Nijdeyeke Jîrkiyan liqayî wan tê û nobetçiyê wan razane ser wan de digirin û çar zilamên Teyan dikujin û direvin û diçin. Ema niza-

nin kî ne jî. Ji hingî ve navê vê kaniyê bûye Kaniya Kuştîyan. Piştîre aşkere dibe ku ev ên hatine kuştin Teyî ne. Vêca ji nûkanê çûn-hatin di neqeba wan de çêdibe, aşîtî pêk tê. Ewê ji Teyan hatine kuştin ev in:

- 1-Dormezê Hisên.
- 2-Emerê Şengê.
- 3-Heso Begîma.
- 4-Birîndarê Şewîş.

Piştî 7 salan Teyî jî diçin 9 zilaman ji wan dikujin û dikin tola zilamê xwe. Jîrkiyên hatine kuştin navê wan ev in:

- 1-Cindiyê Emo.
- 2-Salihê Emo.
- 3-Salihê Mesîhayê.
- 4-Emerê Mesîhayê.
- 5-Fendiyê Mesîhayê.


6-Faris û navê wan her sê kesên di ne diyar e.


Evên hatine kuştin di Şerê Hozê de hatine kuştin. Ev şerê qirêj wek zihniyeta qirêj wisa domaye heta jimara kuştîyan gihaye 118ê. Mixabin ev şerê eşîrên Kurdan ê xwebixwetî ji dijminê wan re bûye karê herî baş.

Di neqeba Eşîra Teyan û Batûyan de jî şer qewimiye û 10 mirov hatine kuştin. Şerê eşîra Teyan bi dewletê re jî çêbûye. Sercedevanê demê Mistoyê mîrî li cem dewletê cih girtiye û bi gelê xwe re şer kiriye. Mistoyê mîrî jî alî Elî Elîcanan ve hatiye kuştin. Heta niha jî tirba wî li nav gorîstana Cizîra Botan e. Ji wê demê pê de koçerên mîran jî koçerî ketine. Şerê Eşîra Teyan û Gowîyan, û Xelîlan û Şîrnexîyan û Kîçan, Silopiyan jî çêbûne. Di van bûyeran de gelek însan hatine kuştin, xisar û ziyan zehf çêbûne.

Ji aliyê xwendinê ve xwendayê Eşîra Teyan gelekî kêmtir in. Di dema Mihê Bapîr de Mele Ehmed û kurê wî Mele Elî hene. Belê ev her du zat, yanî kur û bav çiqasî âlim in ne diyar e. Belê di van demên dawî de xwendevanên wan yê dibistanan gorî demê wek mamosta, parêzer çêdibin.

Teyî di exlaqê xwe de serhişk in, girêdayê bi şêxan ve ne, qafdeyên eşîretiyê li cem wan esas in. Wergirtina cilê wan yê zilaman berê şal û şapik bûn û li serê wan desmal in, cemedanî dibe an jî tiştêk di. Bes dema Cumuhriyet ava bû û qanûna "qiliq qiyafetê" derxistin wê demê wer-





Kela Elo Dîno

girtina cemedaniyê qedexe bû. Dema cendirmeyan ew bigirtana cemedaniya wan diqetandin û heqaret li wan dikirin. Ewan jî çare di vê de dîtin ku cemedaniyê wergirin û şewqê deynin ser cemedaniyê, qene îdare bibe û cendirme bela xwe ji wan vekin. Eger em bêjin ma çima ne serrût in? Serûtî nabe çimkî gorî urfa wan û hem baweriya wan dikevin bin hukmê nîfaqê de û şehdebûna wan nayê qebûlkin. Dema em bêjin bila şewqê tenê wergirin dîsa nabe. Çimkî şewqe libasekî kafiran e, wergirtina wê gorî baweriya wan bi kêr nayê. Ema piştî bi zorê ev şewqe dane serê wan û mecbûrî tehemulkirina wê bûn êdî wilo bû edet. Bes wekî me gotî, şewqe û kefi bi hev re wergirtin. Ji ber vê qasê heta îro jî ew qismê zîlamên navser, divê şewqe û desmalê bi hev re wergirin. Eger bi hev re wernegirin weke ji edetke xwe şemêran dibin wilo zivir dimînin.

Wergirtina cilên pîrekên wan fistan in û sergirtî ne weke her jinên Kurd. Kefiyên serê jinên wan kesrewan in yanî navê desmala werdigerin kesrewan e.

Aboriya wan li gundan li ser çandina genim, ce, nîsk, nok û heywanan e; li bajaran li ser şuxilandina tirêmbêlan û kirîn û firotinan heywanan e. Dujinî, sêjinî, çarjinî li cem Teyan ne xerîb e. Dema yek keça xwe bide mêr next distîne û perûwan jî dixwaze. Di edetke Teyan de, dema di nav wan de yekê xuyayî bimire, şîna wî datînin û şelîtêkî bi sitûnê ve girêdidin yanî herdu serê şelîtê. Vêca heçî jina werê teziyê divê keziyêke xwe jêke bi wê şelîtê ve daleqîne. Heçî jina weha neke tê wateya ku dilê wan nemaye bi vî miriyî ve. Zîlamên wan jî dema miriyên wan çêbin ew jî çekan berdidin.

Li gorî hinek kal û pîrên Teyan, di eslê xwe de Teyî ji nîfşê Ediyê kurê Hatem ê Teyî ne. Xwîşka Edî Sufane, piştî hêsîr dikeve dibe misilman û Pêxemberê Xweda wê azad dike. Sufane, diçe xwe digihîne birayê xwe Edî û jê re behsa qencbûn û duristiya Pêxemberê Xwedê dike. Li ser vê yekê Edî diçe cem Pêxember û ew jî dibe misilman û dibe eshabiyê (heval) Pêxember. Edî sed û bîst sal umir kiriye, li Kufeyê çûye ser dilovaniya xwe. Ji Hatem re 'Hatemê Teyî' hatiye gotin; çunkî kelîma 'teyî' di zimanê Ereban de tê wateya ku ew kesê ewil mezela mêvanan çêkirî. Vêca Hatem di nav Erban de kesayetiyekî yekem e ku oda mêvanan çêkiriye. Belê tu îşaret û delîlên ku vê gotinê rast bike tune. Eşîra Teyan, eşîreke Kurd e û di herêma Botan de eşîrekî gelek kevnare ye. Heta sala 1932ê de wextê şehadeta Şêx Evdirrehmanê Garisî, Mîr Bedîrxan Celadet helbesteke xwe ya ser Şêx Evdirrehman Garisî çêkirî de bangî Eşîrê Kurdan dike. Di serî de dibêje:

Kanî Dêrşew, ka Herekol, ka Kepîr
Ka zozanên Bavê Têlî, ka kê bir.

.....
Kîçan Teyan Dûdêran koka mîran
Hacîbêran kanî Şîrnex Garisan

.....
Kanî Şêxim Evdirrehman Garisî
Ew jî kuştin sorgula me çilmisî.

Mîr Celadet Bedîrxan di helbesta xwe de bangî eşîrên Kurdan dike û ew jî Eşîra Teyan eşîrek Kurd dizane. Her çiqas me guftûgo li ser Teyan dirêj kiribin jî lê helbesta meşhûr ya Îbnul-Werdî terfîa însanan weha dike û dibêje:

لا تفضل اصلي وفصلي ابدا
انما اصل الفتى ما قد حصل

Meneya helbestê ev e: Tu ti caran nebêje eslê min û binyata min û ez ji filan qebîlê an jî ji filan şêx û axa û begî me, eslê xurtî tehqîq ew tiştê berbiçav e.

Ji ber ku em zêde dirêj nekin bi kurtayî tiştê me ji devê kal û zanyarên Eşîra Teyan yê eşîrî standî ev in. Hêvîdar im ji xwendevanên ku nivîsa me bixwîne ku kêma û kasiyek me hebe me bibexşîne ●

Welatê zehf tê bihîstin û kêmtê nasîn: Dêrsim

MURAD CELALÎ

muradcelali@gmail.com

Hinek mijar hene ku di derheq wê de nivîsandin ji bo mirov pir bi zehmet e. Dêrsim jî yek ji wan mijaran e. Lewra heya nika li ser Dêrsim, dîrok û niştecihên wê, bîr û baweriyên gelê wê, serhildan û ciyawaziyên wê yên ku li tu derên dinê peyda nabin ji van egeran hinek in. Him gelekî zêde qala wê hatiye kirin, tê kirin û bi qasî wê jî kêmtê nasîn.

Dêrsim di erdnîgariya Kurdistanê de herêmeke pir girîng e. Lewra hem bi çiya û çemên xwe, bi gelî û newalên xwe ve, him bi bîr û baweriya xwe ve û him jî bi zaravayê xwe Kirmanckî ve ji wan herêman dinê yên Kurdistanê vediqete. Herweha bi berxwedan û serhildanên xwe ve her dem di dilê hêzên dagirker de bûye kuleke xedar, hê jî şopa wê kulê tê xuyan.


Di vê nivîsê de emê qala van tiştan nekin. Egera ku bû baîs ev nivîs were nivîsîn pirtûka Andranîkê Ermen e ku piştî ku ev camêr di sala 1888ê de li Dêrsimê geriyaye, ketiye nav gelê Kurd, li çiya û banyên wê geriyaye, di derheq bîr û bawerî, edet, jiyana û çanda mirovên heremê de agahî berhev kiriye û ev

agahiyên xwe nivîsiye û li Tiffîsê di sala 1900ê de di nav Yekîtiya Weşanxaneyên Ermenyan de bi navê “*Dêrsim, Çanaparbordûtyûn Yêv Aşxarbgrûtyûn*” wekî pirtûk daye çapkirin.

Bi qasî ku em ji pêşgotina pirtûkê jî fêhm dikin, ev berhem bi Ermenîkiya kevin hatiye nivîsîn û du caran hatiye çapkirin. Di sala 2010ê de Mamoste Malmisanîj ev bi alîkariya camêrekî bi navê Serdar Uçar bi destxistiye û daye Têmûrê Xelîl. Têmûrê Xelîl Kurdekî ji herêma serhedê ye û di derbarê zimanê Kurdî de gelek xebatên hêja kiriye û hê jî van xebatên xwe berdewam dike. A Têmûrê Xelîl ev berhem ji Ermenîkiya kevn wergerandiye Kurmanckî. Ev wergera wî di nav Weşanên Deng de derçûye.¹ Piştî wê Roşan Lezgîn ew pirtûk ji Kurmanckî wergerandiye Kirmanckî û Weşanxaneya Vateyê çap kiriye.² Bi rastî Ro-

Dêrsim di erdnîgariya Kurdistanê de herêmeke pir girîng e. Lewra hem bi çiya û çemên xwe, bi gelî û newalên xwe ve, him bi bîr û baweriya xwe ve û him jî bi zaravayê xwe ve ji wan herêman dinê yên Kurdistanê vediqete

- 1 Andranîk, *Dêrsim, Rêwîtî û Erdnîgari*, Wergêr, Têmûrê Xelîl, Weşanên Deng, Diyaberkir, 2009.
- 2 Andranîk, *Dêrsim, Raywanî û Cografya*, Çarnayox, Roşan Lezgîn, Weşanxaneyê Vateyî, Îstanbul, 2010.



Têmûrê Xelil
 ev berhem ji Ermenî-
 kiya kevn wergerandiye
 Kurmancî. Ev wergera
 wî di nav Weşanên Deng
 de derçûye. Piştî wê
 Roşan Lezgîn ew pirtûk ji
 Kurmancî wergerandiye
 Kirmanckî û Weşanxaneya
 Vateyê çap kiriye

şan Lezgîn bi xebatên xwe yên di warê ziman de xwedî kedeke pir e. Li ser înternetê bi malpera xwe www.zazakî.net ê ve karekî pir kêrhatî dike. Herweha tenê bi qada sanal nasekine bi kovara Şewçîla ku du mehan carekê derdikeve û rojnameya panzdeh rojan carekê derdikeve Newepel ve jî valahiyeke mezin dadigire. Bi saya van weşanan, gelê Kurd bi wêjeya bi vî zaravayî jî dihesa. Bi rastî ez bi saya van weşanan hînî Kirmanckî bûm û hê jî hîn dibim. A ev wergera ku em qala wê dikin jî beşek ji van xebatan e.

Pirtûka bi navê Dêrsim hatiye weşandin ji 160 rûpelan pêk tê. Wergêr beşa naverok û îndeksa navan li pirtûkê zêde kiriye. Evîna di çapa Kurmancî de tune ne. Herweha navên taybet ên bi Kurdî û Ermenîkî yê bajar, war, çiya û çeman bi îtalîk hatine nivîsîn. Ev ji bo muqayesa navên îro û wê demê gelekî kêrhatî ye. Herweha hinek peyvên Tirkî yên wekî jîmaran jî bi vî qaydî hatine kifşkirin. Bi vî tehrî meriv dibîne ku wê hingê jî millet dema qala tarîx û temenê xwe dikir jîmarên Tirkî bi kar dianîn. Ev edet hê

îro jî di nav kalên me Kurdan de heye. Pirtûk du beş e, beşa pêşîn de nivîskar qala gera xwe ya Dêrsimê dike û di beşa duyan de jî bi giştî qala Dêrsimê dike.

Ji bo mirov raboriya Kurdan û cînarên wan ên li herêma Dêrsimê jiyane bizanibe, ev pirtûk gelekî baş e. Lewra dema meriv vê pirtûkê dixwîne hema hema mirov bi giştî di derheqê hemû babetan de dibe xwedî fikîr. Lewra Andranîk bi rêberiya hevalên xwe, -car caran dibêje di nav van rêberan de merivên wî jî hene- çî Kurd û çî jî Ermen dikeve nav her kesî. Ji nêz ve, bi çavê xwe dibe şahidê jiyana wan, ji devê wan bawerî û dîroka wan hîn dibe. Li ser awayê jîyan û çanda wan bi xwe tesbîtan dike û li ser wan şîroveyên xwe rêz dike. Herweha gelê wir, Kurd û Ermenan bi gelên herêmên din ve muqayese dike. Carna tu lê dinihêrî pesnê wan dide û carna jî rexneyan li wan dike.

Bi rastî gava min ev pirtûk xwend -divê ez vê jî bêjim min ya Kirmanckî xwend- hema ez dikarim bêjim ji bo min mîna romanekê hat. Lewra di vê rêwîtiya xwe de Andranîk rastî gelek şeran hati-

ye, rêya wî hatiye birîn, hatiye şêlandin, wî aniye ew kesên rêbir xapandiye ji destê wan filitiye. Di derheq exlaq, perwerde, mîmarî û têtikiliya gelê wir de nixandînen girîng kiriye.

Dema qala çanda Ermenên Dêrsimê dike, tu dibêjî hema ev Kurd in. Bo mînak dibêje ku di nav wan de bûkên nû dema teze tînen sîwarkirin û tînen mala xwe, ji xesî û xezûrên xwe re bûkîtiyê dikin, ango xeber nadin. Gava min ev xwend bi rastî ji bo min pir balkêş hat. Lewra ev edet hê niha jî di nav Kurdên me de heye. Nika diya min bi xwe pêncî salî ye û hê ji kalkê min re bûkîtiyê dike. Herweha jinapa min ji tiyê xwe, ango ji bavê min re bûkîtiyê dike. Ez nizanim gelo nika di nav Ermenyan de ev edet maye û yan nemaye. Lê hê di nav Kurdan de heye. Wekî vê hê gelek tiştên din hene.

Jixwe tiştêkî asayî ye cînar têtkevîne ber bandora hevdu, ji edet û baweriyên hevdu hildin. Lê belê ez nizanim gelo kîjan milletî ev edet -ku bi min edetêke betal e- ji kê hildaye.

Herweha dema meriv vê gernameyê dixwîne meriv dibîne

ku ji aliyê bîr û baweriyê de jî ev herdu millet gelekî hevdu çûne. Ango li gor gotina wî, Kurdên Dêrsimê dêrê wan wekî ziyaret û ciyên pîroz dibînin. Heta hinek Kurd di dema tengasiyan de diçin xwe diavêjine wan deran. Li wir lava û dua dikin.

Tiştêkî malûm e Kurd û Fille bi sedsalan li gel hevdu jiyane, ev pirtûk ji bo meriv çawaniya vê têkiliyê bizanibe berhemeke baş e. Heta li gor ku nivîskar dibêje, di nav daristanekê de rastî komeke Kurd hatine, ji bo wan bitirsînin xwe wekî Osmanî nişan dane, lê gava ku dîtine Kurd ji Osmanîyan hez nakin, wan wekî neyar dibînin, dê xirabiyekê bi wan biki, wê çaxê xwe bi Ermenîtiyê xilas kirine. Û hê gelek tiştên din, ji bo dîtina van divê mirov vê berhemê bixwîne.

Lê bi mercekî, divê mirov ji binî ve bawerîya xwe bi xebatên bi vî rengî ji destê xerîban derketine bawer neke. Lewra endamên dêran, rojhilatnasên xaçparêz, xebatkarên şirketên bazirganî û nûnerên dewletên Ewropî bi sedsalan xebatkarên xwe şandine nav gelên herêmên Kurdistanê, Afrîqayê, Hindistan û gelek deverên din. Ev endamên wan hatine nav wan gelê niştêcî, fêrî zimanê wan bûne, li ser bîr û baweriyên wan lêkolîn kirine, di derheqê dewlemendî û kêmasiyên wan de bûne xwedî malûmat, paşê di derbarê wan xebatên xwe de gelek rapor û berhem amade kirine. Bi rastî, saya xebatên wan gelek berhemên edebî ji windabûnê filitîne û di pirtûxaneyên biyanîyan de tînin parastin.

‘Eşqa Yezdan Hêsarek Pirr Muhkem e¹

Mewlana Celaleddînê Rûmî
Ji Farisî: Hayrullah Acar

Her roj ji nû ve ez barek dikêşim
Van belana ji bo karek dikêşim

Zehmeta sermê’w berfa zivistanê
Tev bo ‘eşqa şehriyarek dikêşim

‘Eşqa Yezdan hêsarek pirr muhkem e
Barê can ber bi hêsarek dikêşim

Bona her du nêrgizên mexmûrê wê
Wek meyxoran ez xûmarek dikêşim

Dil şikeft û Şemsê Tebrîz bo wê yar
Bona yar zahmeta jahrek dikêşim

1 Mewlana Celaleddîn-i Rûmî, *Kulliyat-i Diwan-i Şems*, (Neşr-i Bed - uzzaman Fruzanfer), İntişarat-i Behzad, cild, IV/1663, Tahrân, 1329.

Lêbelê gava ev xebatîna hatine kirin, pir caran ji edaletê dûr ketine, nirxandin û şîroveyan wan ji rastiyeke dûr ketine. Bi helwesta oryantîstan nêzîkî bûyeran bûne. Bi çavekî ku ew mirov namzedê bişaftin û xapandinê ne li wan nihêrîne. Lewra li gor wan ev kesana hov in, -car caran di vê pirtûkê de jî rastî ve peyvê û nêrîne tînin loma divê bînin perwerdekirin. Ango dema bişîbine rojavayîyan dê bîbîne medenî û pêşketî!

Ji ber vê gava Andranîk qala gundên Ermenîyan dike dibêje,

hema hema di hemû gundên wan de dêr û dibistan heye, di gundê dêr tune be de jî keşîş çend hefteyan carekê tê şîretan li wan dike. Lê gundê Kurdan him bi asta perwerdeya xwe jî wan kêman in û him jî bi pergala gund û malê xwe ve. Car carna mirov rastî nakokîyan jî tê.

Lêbelê evîna hemû dîsa girîngiya ve pirtûkê kêman nakin. Lewra heke ev xerîb û rojhilatî nebûna emê ji gelek agahiyên di derheqê çand, welat, wêje, bawerî û zimanê xwe bêpar bîmana●

Dendikên zebeşan

MÛRAD DILDAR

muraddildar@hotmail.com

Dilgeş ji derve nû hatibû malê. Li zanîngehê îro pîrr westiyabû. Ji xwe re çayê çêkiribû û rojname dixwend. Bi dengê telefonê rojnamê danî û telefon vekir:

“Elo”

“Elo! Dilgeş, roja te bixêr lawê min. Çawa yî?”

“Baş im dayê sax bî. Tu çawa yî, baş î?”

“Ka başî ji me re heye lawê min. Tu li ciyê dûr î, ne li hinda me yî.”

“Çi bikim dayê heta zanîngeh biqede mecbûr im li vê derê bimînim. Bavê min çawa ye?”

“Baş e ew jî wa ye li malê ye rûniştî ye. Silavan dike.”

“Ser çavan. Tu jî silavan lê bike.”

“Dilgeş, do me ji te re dendikên zebeşan şandin. Îro here ji termînalê bigre.”

“Sax bî dayê. Ez vaye derkevim dê herim bigrim.”

“Lawê min li xwe miqate be li wan deran. Te nan xwar?”

“Erê dayê meraq neke. Ez ne biçûk im.”

“Dengê kilamên Kurdî zêde veneke lawê min. Ciyê xerîb e, meriv nizane çi dibe, çi nabe...”

“Temam dayê. Bû sed caran dibêjî. Dengê kilamên Kurdî pîrr venakim.”

“Eger kêmasiyeke te hebe ji me re bêje lawê min. Li xwe muqate be.”

“Saxbî dayê. Kêmasiyeke min tune ye niha. Jixwe ezê du meh şûnde werim Diyarbekirê. Bimînin di xweşiyê de.”

“Tu jî lawê min. Bi xatirê te.”

“Oxir be.”

Dilgeş ji malê derket û çû termînalê. Dendikên zebeşan girt û dîsa da rê ji bo vegere malê. Sê sal berê bû.. Westê nû hatibû vî bajarî, ji gelek dikanan pirsîbû lê li tu ciyê dendikên zebeşan peyda nekiribû. Jixwe nizanibûn dendikên zebeşan çi ne jî. Tew li hinek dikanan gotibûn: “Ma dendikên zebeşan tên xwarinê?” Ji wê rojê şûnde dê û bavê wî ji Diyarbekirê jê re dendikên zebeşan dişandin. Dendikên zebeşan ji Diyarbekirê derdiketin û berê xwe didan vî bajarê ku li rojavayê Tirkîyê ye. Li tûrikê ku dendikên zebeşan tê de ye mêze kir û kenîya. Li papûra herî mezin ya bajêr,

Dendikên zebeşan ji Diyarbekirê derdiketin û berê xwe didan vî bajarê ku li rojavayê Tirkîyê ye. Li tûrika ku dendikên zebeşan tê de ye mêze kir û kenîya

hêdfî hêdfî dimeşiya ji xwe re.

Ji dûr ve dengê qerebalixekê hat guhên wî. Wextê nêz hatin, dît ku qerebalixê meytê leşkerekî Tirk dabûn ser milên xwe û dimeşiyar. Di şer de dîsa xortek hatibû kuştin. Nîvê bajêr hatibû cenazê. Hinekên di nav qerebalixê de slogan diqîriyan, hinek ji wan jî çêrî Kurdan dikirin. Di rojên weha de tirsek tédiket nav dilê Dilgeş. Digot qey ewê qerebalix fam bike ku ew Kurd e û ewê êrîşî wî bikin. Heta qerebalix derbas bû Dilgeş xwe da aliyekî. Piştî qerebalix derbas bû ew dîsa ket ser rêya xwe û meşiya. Lê meytê leşker ji bîra wî nedichû. Belkî jî qansî wî bû, hîn xortekî 20 salî bû belkî. Xwedê zane dê û bavê wî wê çend sal şîna wî bigirin, wê çend sal li dû wî bigirin... Li ser rê parqeke biçûk hebû. Çû li bin darekê rûnişt. Gava çavên wî li dendikên zebêşan ketin xemgîniya wî hinek belav bû. Ji nişka ve zengilê telefona wî lêket. Gava li ser telefonê navê Ferat dît rûyê wî keniya. Ji Diyarbekirê hevalê wî yê Ferat lê digeriya:

“Elo!”

“Elo, Dilgeş merheba ji te re.”

“Merheba Ferat çawa yî?”

“Sax bî Dilgeş tu çawa yî, çi dikî?”

“Li derve me. Diçûm malê. Tu çi dikî?”

“Em jî li derve ne. Li Parqa Koşiyolîyê em rûniştine û bi hevalan re çayê vedixwin. Me got xwezî niha Dilgeş jî li hinda me bûya.”

“Hûn ji dêlva min re jî çayekê vexwin. Wextê ez werim emê bi hev re vexwin.”

“Tu yê kengî werî? Diyarbekirê pirr bêriya te kiriye.”

“Du meh şûnde ezê werim. Hûn ji vê derê tişteki dixwazin?”

“Na Dilgeş tu were bes e ji me re. Heval giş ji te re silavan dikan.”

“Serçavan. Tu jî li hevalan û li Diyarbekirê silavan bike.”

“Serçavê min. Li xwe muqate be. Bi xatirê te.”

“Oxir be.”

Dilgeş bi xemgîni telefon girt. Bêriya hevalên xwe kiribû, bêriya Parqa Koşiyolîyê kiribû, bêriya Bedenên Diyarbekirê kiribû, bêriya malê kiribû... Sê sal e li vî bajarî bû lê hîn jî neelimibû vî bajarî. Te digot qey hîn li Diyarbekirê ye her şev di televîzyonê de li rewşa hewayê Diyarbekirê dinêrî. Li vî bajarê ku lê dixwend berf bibariya, baran bibariya, kevir bibariya jî ne xema wî bû. Lê li Diyarbekirê wê germahiya hewayê çend derece be roj bi roj dizanibû. Dîwarên oda wî bi wênayên Diyarbekirê xemilandî bûn. Bircên Diyarbekirê, Mizgefta Mezin, Çiyayê Çilsiwaran li vî bajarê xerîb jî ew bi tenê nehîştibû. Bilêta xwe çend meh berê digirt û roja ezmûnên wî biqediya qet nedisekinî. Balafir gava digihîşt ser Diyarbekirê, te digot qey cara ewilî Diyarbekirê dibîne, ji paceya balafirê bi kêf û meroq li Diyarbekirê mêze dikir. Di çûyînê de jî gava balafir ji Diyarbekirê radibû, te digot qey wê êdfî tu car Diyarbekirê nebîne, bi xemgîni li Diyarbekirê mêze dikir. Şêst û du roj mabûn. Şêst û du roj şûnde ewê biçûya Diyarbekirê... Şêst û du roj...

Şêst û du roj wê roj ji paş çiyayê hilbihata... Ma şêst û du roj wê çawa biqediya... Bi xemgîni rabû ku here malê zengilê telefona wî dîsa lêket. Nimra ku di telefonê de xuya dikir nenas bû. Bi meroq telefon vekir:

“Elo!”

“Birêz Dilgeş?”

“Belê, ez im.”

“Ez ji Diyarbekirê digirim. Sê meh berê me pêşbaziya çîrokên Kurdî li dar xistibû. Encama wê eşkere bû. Çîroka we bû yekemîn. Ez we pîroz dikim.”

Dilgeş şaş mabû. Nizanibû wê çi bigota...

“Elo... Birêz Dilgeş gelo hûn dengê min dibihîzin?”

“Belê belê dengê we tê.”

“Du hefte şûnde emê ji bo xelatê civînekê çêkin. Ku hûn jî beşdar bibin emê gelek kêfxweş bibin. Bimînin di xweşiyê de, bi xatirê we..”

Dilgeş telefon girt. Ji kêfê nizanibû wê çi bikira. Dikeniya û li derdora xwe mêze dikir. Yekê ew wisa bidîta ku bi tenê dikene û li dora xwe dinêre, wê bigota qey ev dîn e. Lê ji nişka ve kena li ser rûyê wî wenda bû, xemgîni hat di dilê wî de rûnişt. Hat bîra wî ku ji bo kêfxweşiya xwe pê re parve bike, li vî bajarê xerîb tu kes tunebû. Tu kes tunebû ku jê re bibêje:

“Ez di pêşbaziya çîrokên Kurdî de bûme yekemîn.”

Dev ji çîrokên Kurdî berde gava bi telefonê bi dê û bavê xwe re bi Kurdî diaxivî bi çavên dijimînan li wî dinêrîn. Tu kesê ku li vî bajarî ew pîroz bikira tune bû.

Li hevalên xwe yên Diyarbekirê fikirî. Eger niha li Diyarbekirê bûya wê hevalên wî ji bo

bîna kulîlka sincî

sidiq gorîcan

her kulîlkek helbest divê
 gul, nêrgiz
 beybûn, sosin
 ji her kulîlkê re dil dikele
 çavşîrkî dibilbisin
 kulîlka dara sêvê
 dara behîv
 û a zerdelê...
 li ba min lê
 cihê sinçiyê payedar e
 helbesta rindtirîn bo wê gupik dide li
 hundirê min
 ku tê û nayê bêhna kulîlka wê a derkenar e
 bi her hal û ruhê xwe ve dileqim ez ji
 mekanê xwe
 berê min dikeve umirzarokatiya min
 zarokatiya'm cardin derî dixê bi dem û
 rojên xwe
 ew rojên li nav zeviyan
 li ser cûyan
 ew rojên li ber berxik û karikan
 li nav devîyan
 li pey çûkan
 ew rojên li ser keviyên berfê
 sivik û hênik
 ew rojên bi hevnasîna bi meyteb û herfê
 li ser erda terr û şîn
 tev bi liv û bi meşin

ew rojên ji bêhnbeziyê dûr
 nav leyzê
 û bê maşin
 ew rojên sakin
 li ser hemd
 û bi hedde xwe
 û bi evîn
 ew rojên ji qêr û gêjiyê bê hay
 bi jiyane re aş
 ji ewran re neenirî
 ew rojên ji xirinçafîyan azade
 ji îmacînyonê veceniqî
 ji xwe dilyeqîn
 û bi helal û hazirî
 ew rojên mîna dayîka min wekê xwe
 û bi xweyarî...

ew rojên asûde welhasil
 ku bêhna kulîlka sinciyê hat
 ew rojên asûde û diledil
 xwe li zeneqa min didin
 li kû dibim bila bibim

dara sincî kulîlka sincî
 bi te wextê winda vejîya
 demnihaya min qirmîçî

25 hezîran 2011 wan

vê pêşbaziye pê re kêf bikirana. Ewê bi hev re qala çîrokê bikirana, ewê bi hev re ew pîroz bikirana. Sê sal e, li vî bajarî bû lê tu car mîna îroj xemgîn nebibû. Li derve bi sedan însan digeriyan, dimeşîyan lê haya tu kesî jê tunebû ku ew di pêşbaziye de bûye yekemîn.

Kurdî nivîsandin, bi Kurdî xwendin ji bo Dilgeş tiştêkî pîr xweş bû û tiştêkî bi qîmet bû. Ji ber ku bi Kurdî dinivîsî hevalên wî yê Diyarbekirê pîr qîmet û

rûmet didan wî. Lê Kurd bûn, nivîsandina Kurdî, axaftina Kurdî li vî bajarê ku li rojavayê Tirkîyê ji bilî dijminatîyê tiştêkî din nebû. Bi vê telefonê careke din jî fam kir ku li xerîbiyê ye û bi tenê ye. Bi hêviya ku yekî nas bibîne li dora xwe mêze kir. Lê her tiştên vî bajarî xerîb bûn. Mirovên wî, çûkên wî, kûçikên wî, darên wî, kevirên wî... Çavên wî li dendikên zebeşan ketin. Li vî bajarê xerîb tiştê ku herî nas û herî Kurd ev dendikên zebe-

şan bûn. Wekî ku bi xezineyê ke giranbuha girtibe, tûrikê dendikên zebeşan hilda û rabû. Bi çavên şil li çiyayên dora bajêr mêze kir. Ji paş çiyayên bilind, ji bajarekî gelek dûr dengê straneke bi zimanekî qedexê dihat guhên wî:

Rabe lawo em herin welatê xwe

Cî û meskenê cem bav û kalên xwe ●

Nameya Bîst û Yekemîn

BEDÛZZEMAN SEÎDÊ NÛRSÎ

Wergera ji Tirkî: Abdulkadir Bîngol

abdulkadirbingol@gmail.com

بِسْمِهِ سُبْحَانَهُ وَإِنْ مِنْ شَيْءٍ إِلَّا يُسَبِّحُ بِحَمْدِهِ

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

إِمَّا يَلْفَنَنَّ عِنْدَكَ الْكَبِيرَ أَحَدُهُمَا أَوْ كَلَّا هُمَا فَلَا تَقُلْ لَهُمَا أُنْ وَلَا تَنْهَرُهُمَا وَقُلْ لَهُمَا قَوْلًا كَرِيمًا - وَأَخْفِضْ لَهُمَا جَنَاحَ الذُّلِّ مِنَ الرَّحْمَةِ وَقُلْ رَبِّ ارْحَمْهُمَا كَمَا رَبَّيْتَنِي صَغِيرًا - رَبُّكُمْ أَعْلَمُ بِمَا فِي نُفُوسِكُمْ إِنْ تَكُونُوا صَالِحِينَ فَإِنَّهُ كَانَ لِلْأَوَّابِينَ غَفُورًا

Ey ew xafilê ku di mala wî de dêyeke wî yan jî babekî wî yan yên extiyar, yan jî xizmekî wî yan jî birayekî wî yê îmanê yê belengaz yan jî nexweş heyî! Bala xwe bide vê ayeta kerîme, lê binêre! Belê di ayetekê de, di pênc awayên cihê cihê de bo dê û babên extiyar şefqetê celb dike. Erê di dinyayê de heqîqeta herî rûmetbilind şefqeta dê û baban ya bo zarokên wan e. Û huqûqa herî bilind jî ew e ku li hemberî wê şefqeta wan qedr û qîmeta wan bête girtin. Çûnkî ewana jiyânên xwe bi lezeteke heta tu bibêjî zêde gorî jiyana zarokên xwe dikin û (ji wan re) serf dikin. Naxwe madem wisa ye, pêwîst e her zaroka ku ji mirovayiyê derneketî û nebûyî mîna cinawiran, ji wan dostên giramîdar (muhterem), sadiq û fedakar re rêzeke xalis bigre, xizmeteke

ji dil bike, razîbûna wan bi dest bixe û dilê wan xweş ke. Mam û met bab; xalet û xal dê tên hesabê.

Vaye, ku heyîna van extiyarên bimbarik li yekî giran were û mirina wan bixwaze... ev çî bêwijdaniyek e û çî adîtiyek e; vê zanibe û hiştar be. Belê tu mirina wan kesên ku jiyana xwe bo jiyana te feda kirî, bixwazî... zanibe eva hanê zilmeke çiqas kirêt e, çî bêwijdaniyek e.

Ey ew mirovê ku muhtelayê derdê debarê bûyî! Zanibe ku stûna bereketa di mala te de û wesîleya rehmetê û def'kera karesatan ew xizme te yê extiyar û kor yê di mala te de ye, ku (heyîna wî) li te giran tê. Zinhar mebeje: "Destê min teng e, ez nikarim debara xwe bikim." Çûnkî eger ne ji ber wê bereketa ku seba xatirê wan tê baya,

Ey însan! Madem ajaleke ku di sûretê cinawirê de ye, dema li mala mirovan bû mêvan dibe sedema bereketê...

helbet dê desttengiya te zêdetir baya. Vê rastiya hanê ji min bawer ke. Ez gelek delîlên vê yên mîsoger dizanim û dikarim bi te jî bidim bawerkirin. Bes ji ber ku dirêj nebe ez kurt dikim. Bila yeqîna te bi vê gotina min were. Ez sond dixwim ku ev heqîqet tam mîsoger e; heta nefsa min û şeytanê min jî di hemberî vê çendê de teslîm bûne. Ev heqîqeta ku rika nefsa min şikandî û şeytanê min dayî sekinandin, divê yeqînê bide te jî.

Belê, ew Xaliqê Zûl-Celalê ku bi şahdebûna gerdûnê gelek Rehman û Rehîm û Letîf û Kerîm e; wek çawa dema zarokê dişîne dinyayê, di pey wan re bi awayekî gelek letîf rizqê wan jî dişîne û ji henîfeya (muslix) memikan dirijîne devê wan de; (eynen welê) rizqê wan extiyarên ku bûne mîna zarokan, heta ji zarokan jî zêdetir layiqî dilovaniyê ne û muhtacî şefqetê ne jî di awayê bereketê de dişîne. Debara wana nake barê van mirovên temaker û bexîl.

إِنَّ اللَّهَ هُوَ الرَّزَّاقُ ذُو الْقُوَّةِ الْمَتِينُ
وَكَأَيُّنَ مَنْ دَابَّةٍ لَا تَحْمِلُ رِزْقَهَا اللَّهُ يَرْزُقُهَا وَإِيَّاكُمْ

Heqîqeta ku ev ayet ifade dike... aferîdeyên cur be cur yên hemû candaran bi zimanê hal diqêrin û vê heqîqeta kerîm dixwînin. Heta ne ku xizmên extiyar tenê, ya rast, rizqê hin aferîdeyên mîna pisîkan ku bûne hevalê mirovan û rizqê wan jî di nav rizqê mirovan de tê şandin jî, di awayê bereketê de tê.

Ev mînaka hanê ku min bi xwe dîtiye vê yekê piştrast dike:

Dostên min yên nêzî min dizanin ku berî niha du-sê salan her roj niv nan (nanê wî gundî biçûk bûn) tayîna min hebû ku pîrî caran têra min nedikir. Paşê çar pisîk bûne mêvanên min. Ew tayîna min hem têra min kir hem jî têra wan kir; gelek caran zêde jî dima. Vaye ev rewşa hanê gelek hate dubarekirin ku heta ji min re yeqîn çêbû ku ez ji bereketa pisîkan sûdê werdigîrîm. Ez bi awayekî qetî vê yekê îlan dikim ku; ewana jî min re nebûne bar, hem ne ku ewana di bin mineta min de ne, ez di bin mineta wan de me.

Ey insan! Madem ajaleke ku di sûretê cinawirê de ye, dema li mala mirovan bû mêvan dibe sedema bereketê; eynen welê jî... di nav aferîdeyan de yê herî birûmet mirov e; di nav mirovan de yê herî mûkemel ehlê îmanê ye; di nav ehlê îmanê de yên herî zêde layiqê rêz û dilovaniyê extiyarên nex-

weş in; di nav extiyarên nexweş de yên herî layiq û musteheqê şefqet û xizmet û hezjêkirinê ne xizm in; di nav xizman de dostê herî heqîqî û hezkirê (muhib) herî sadiqî dê û bab in... eger ev dê û bab di rewşa xwe ya extiyariyê de di malekê de bin çî qeder dibin sedema bereket û rehmetê ne. (herweha) li gorî raza رَبُّ الشُّيُوعِ الرَّكْمُ لَصَبَّ عَلَيْكُمْ الْبَلَاءُ صَبُّ eger extiyarên we yên piştquf nebana, dê mîna lehiyê bela li ser we de birijiyana” çî qeder sedema def’a belayan e tu qiyas bike.

Vaye, ey insan! Hişê xwe bîne serê xwe; eger tu nemirî tu dê extiyar bibî. Li gorî raza لَعْمَلٍ جُنْسٍ مِنَ الْجَزَاءِ eger tu ji dê û babê xwe re rêzê negirî, zarokên te jî dê bo te xizmetê nekin. Eger tu ji axreta xwe hez dikî, vaye bo te gencîneyeke girîng, ji wan re xizmetê bike, dilxweşiya wan bi dest bixe. Eger tu ji dinyayê hez dikî, dîsa wana dilxweş bike ku seba xatirê wan jiyana te di rehetiyê de û rizqê te jî bibereket derbas bibe. An na, eger tu ji wan dilgîran/aciz bibî, mirina wan bixwazî û dilê wan yê nazik û ‘zû xemgîn dibe’ bişikênî tu dê wê demê mezherê raza غَيْرَ الدُّنْيَا وَالْآخِرَةِ Eger tu rehmeta Rehman bixwazî, rehmetê li wan emanetên Rehman yên di mala te de ne, bike.

Bi navê Mustefa Çawûş zatekî dostê min hebû. Min didît ku ew di dîn û dinyaya xwe de serkeftî ye; min raza wê nedizaniya. Paşê min zanî ku sedema serkeftina wî zatî ew e ku ewî mafê dê û babê xwe yên extiyar fêm kiriye û li gorî wê tevgeriya ye; ji ber xatirê wan rehet û rehmet dîtiye; axreta xwe jî înzallah ava kiriye. Heçî kesê bixwaze bextewar be divê bişibe wî.

اللَّهُمَّ صَلِّ وَسَلِّمْ عَلَى مَنْ قَالَ : الْجَنَّةُ تَحْتَ أَقْدَامِ الْأُمَّهَاتِ وَعَلَى إِلِهِ وَصَحْبِهِ أَجْمَعِينَ

سُبْحَانَكَ لَا عِلْمَ لَنَا إِلَّا مَا عَلَّمْتَنَا إِنَّكَ أَنْتَ الْعَلِيمُ الْحَكِيمُ ●

Şerm

MIHEMED FERAŞÎNÎ

Ez hemî deman di polê de li cihê piştê rûdiniştim. Eve jî gelek diçû zora min. Ji ber çi hemî dema li piştê rûdiniştim? Çimkî wekî ez li pêşiyê dirûniştim biçûkan textê reş nedidît, ez di navbeyna wan û textî dibûme çeper! Wekî gundê me hatiye sotinê ez heşt neh salî bûm. Li gundê me dibistan nebû. Heke gundê me nehatiba sotin çêdibû ku ez niha şivan, gavan, an jî pale bam. (Ji ber hindê ez dibêjim, hindekan qencî li me kir, gundên me sotin, belê bila di nabeyna me de bit, nebêjine kesê) belê wekî gundê me sotî û em ji neçarî hatine bajarî biçûkên emrê min de diçûne pola siyê an çarê. Ez di polê de wekî golikê di nav berxan de bûm. Ez şibiya rihsipiyê polê bûm. Hewce ye ez neheqiyê jî li xwe nekim û hêja ye ku ez bêjim: golikê di nav berxan de tinê ne ez bûm. Çend hevalên dî jî hebûn ku gund sohtiyên bê dibistan. Ji ber ku ez û çend hevalên dî di mezin bûn û waneyên me jî baş bûn dibistanê em kirine di ezmûnê de. Em di ezmûnê de bi serkeftin. Me pola çarê nexwend, em dane pola pêncê û em li gel yêk derkeftine pêncê.

Xwezî derdê min tinê eve ba. Belê na. Ev derd hêj çi nebû

li pêş derdên dî. Kedxûdatiya me ya gundî ji destê me çûbû. Êdî em xîzan bûn. Hindek carna şîva şevê li me hizret bû. Ji ber hindê hem ji ber xwe hem ji ber malê, bo wî erz û eyalê hûr, lazim e ez betal nemabam. Dibistan, wane bo kesê ne xem bû. bila pare hatiban ji kî derê hatiban bila hatiban. Min jî, gelek şol kirin an jî min xwe ceriband. Ez caran diçûme pêlavboyekirinê. Caran min dew difiro, cara min di liqûntan de aman dişuştin. Min ji çi şolan şerm nedikir, tinê wekî boya pêlava ji tilên min nedixûn û ez bi wan tilên boyekirî ve diçûme dibistanê. Ji ber tilên bi boye min zû bi zû destên xwe ji berîka xwe dernediexistin, wekî min di polê de dinivîsî min gelek şerm dikir. Min digot hindek kes tilên min ên reş û sipî bibînin dê yariyên xwe bi min bikin. Ya xirabtir jî eve bû: kê m zêde di jiyana hemî kesê de evîna zarokatîyê, evîna ewilkî heye. Evîna dilê min, hem cîrana me bû, hem em di eynî polê de bûn. Min gelek ji wê şerm dikir ku ew tilên min bibîne an jî wekî sindoqa boyê bi millê min ve bibînit.

Şolê ku ez jê direvim pêlavboyekirin bû. Wexta dibû zivistan an jî baran hatiba keyfa min

Em şeveqê diçûne dibistanê. Gava dibistan xelas dibû ez bi bez dihatim. Min cilên xwe yên dibistanê ji ber xwe dikirin û ez bi bez ve diçûme şolî

dihat. Çimkî kesê nedigote min tu bo çi naçî boyê. Çimkî di wan dema de kesê pêlavên xwe boye nedikirin.

Dîsa zivistan bû, ez li malê bûm. Mamê min di firnê de bû. Bo min şolek dîtibû li dev xwe. Ez da di firnê de amanan bişom, paqijiyê bikim, caran jî poçeyan bibime ji derve. Keyfekê li min dabû bo vî şohlî, her Xwedê dizanît. Ez da têr lehmeçûnan bixwim. Bo mektebê piçekê dibû asteng belê çare nebû. Parê dida min jî gelek piçek bû. Belê ya rastî çi kesê, xwendekar bo niv rojê nedidane şolî. Ji ber xatra mamê min ez dida me şohlî.

Em şeveqê diçûne dibistanê. Gava dibistan xelas dibû ez bi bez dihatim. Min cilên xwe yê dibistanê ji ber xwe dikirin û ez bi bez ve diçûme şolî. Heta hindek caran ez berî mamosteyê xwe yê bi seyarê ve diçûte xaniyên leşkerî diçûm. Niha nizamim ew mamosteya min, ya jina leşkerî, li kî derê ye. Ewê gelek qencî li min kir. Dilê wê gelek dima bi min ve. Di ber min diket.

Caran digote min: Kurê min, tu dê xwe bikujî, hêdî here. Belê hewce ba ez di wextê şolî de li firnê bam.

Pêşiyê ji ber mamê min bêhna min li firnê dihat. Nizamim belkî ji biçûkatiyê bit, belkû ji tiştêkî dî bit, belê roja mamê min ji wê derê çûyî ez hêdîka çûme mitbexê û ez girîm. Min neşiya ez xwe bigirim. Ez girîm ji bêkesiya xwe, ji tinêtiya xwe. Belê min şerm kir ku kesekî di bibîne rondikên min. Heta dilê min hîn bûyî ez bêdeng girîm.

Roj di ser de diçûn, ez hêdî hêdî dielîmîm. Ez nelac bûm,

mecbûr bûm. Ez hem da biçime dibistanê hem jî da biçime şolî.

Rojekê ez dîsa weke hemî rojan bi bez hatibûme şolî. Nabeyna min û xudanên şolî gelek baş nebû. Ez biçûk bûm û wekî dayika min gotî: ez tablêr bûm, an jî 'tayrê mijê' bûm. Gava ez ji tiştêkê aciz bûbam min tiştê li ber çavên xwe jî nedidît, an jî xizmeta ji min dixwest zû ji bîra min diçû. Dilê min bi vî şolî ve gelek xweş nebû. Welhasil piştî boşahiya bikira, firin piçekê tena bûbû. Du sê fikir mabûn. Hema min hind dît babê min hate jor. Hem keyfa min hat hem min şerm kir ji xîzaniya me. Babê min li masekê rûnişt. Piştî silav û xêrhatinê me xwarin bo babê min îna. Ya rastî xudanên firnê jî eleqeyeke baş nîşa babê min da. Vêca tirsekê ez girtim hêdî hêdî. Min texmîn dikir ku babê min pare nînin. Min li cihê babê xwe gelek şerm dikir. Ji ber hindê ez çûme masa wî rûniştim. Min di dilê xwe de digot: ez çi bikim gelo? Ez neşê mî pîrsa para ji babê xwe bikim li ser nanî. Ji xwe ez şerm dikim tiştên dî bi wî bixivim ezê çawa li ser nanî pîrsa paran bikim. Ez dest biavêjime berîka xwe xudanên firnê dê bibînin. Ez hêdîka ji masê rabûm û çûme mitbexê. Pareyên ku firnê her roj didane min zû bi zû min zîê nedikirin. Min têra xwarina wî pare derêxistin û kirine destê xwe de û min destê xwe miçand. Ez dîsa bi şermokî rûniştîme pêşiya babê xwe. Da ku kesên li dev me nebînin, min hêdîka di bin masê de destê xwe yê pare tê de li pê wî da. Min bi dengêkî nizim gotê: Babo, ha bo te van paran. Min destekê jî berê xwe da dorexên xwe ka kesê

ez dîtîm an na. Babê min qet ev şermên ez dikim, ev hesabên ku ez di mejiyê xwe de dikim nekirin. Bi rûyekî bêşerm û bi keneke bilind got: nihê hûn dibînin: kurê min wê bi dizikî para didete min. Xudanên firnê û xebatkar jî kenîn. Belê min tiştêk jê nezanî. Bi van kenan ve ez gelek şermîzar bûm. Heta niha jî min nezaniye: gelo babê min ji şerma xwe kenî an jî keyfa wî bi min hat? Xudanên firnê û xebatkar bi kena babê min kenîn, bi min kenîn an jî da ku ez zêde şerm nekim kenîn? Piştî vê keniya bi deng û bo biçûkatîya min bûye rûreşî babê min xwarina xwe xelas kir, ji masê rabû. Bê şerm û bê xem go: li ser hisaba Memed. Ez di şermên xwe de digevizîm. Xudanan jî bi ken go: bila, ne mesele ye, tu mêvanê me yî. Ser seran, ser çavan. Babê min xatir xwest û çû.

Ez ji şermê çûme mitbexê. Mi şerm dikir bême salonê. Ne min nedîşiya ez lefzekê bikim. Rûyê min sor bûbû.

Niha jî nizamim çawa berê xwe bidime vê mesela xwe û babê xwe. Belê ez tiştêkê baş dizanim: Babê min hem kedxudayê gundî bû hem jî rihispiyê gundî bû. Rojekê tenê mala wî bê mêvan nebû û çi caran goşt ji ser sifra wî kê mî nedibû. Lazim e, wekî têtê zanîn, vê jî bêjim: Ji heyîne mirov bikevîte neyîniyê zor e, zehmet e. Ez bi dilê xwe yê biçûk texmîna xwe bêjim: babê min jî şibya min êşa, belê heta niha gelek caran çokên wî êşan û birînen wî bi kapka ve qahîm bûn.

Gotina dûmahiyê: şol û kar xemla mirovahiyê ye. Mirov bêyî wê çi tişt nîn e ●

Newrozname

Mesud Serfiraz

Bihar hatiye welatê min seranser
Li xwe kiriye xemla kesk û sor û zer

Ba w bahoz û berf jê bûye der
Şibhê baxê cinetê ye her dever

Çem bûye gerdenî li ser sîng û ber
Direşîne tav tîrên zêr û zeber

Feqî pal daye sergûzeşte tawus vekir per
Li gulistan bi zarê Avesta didin xeber

Mem ji hemû aşiqan re bûye rêber
Zîn ji delalên serwî qamet re serwer

Ewên ciwan her yek ji wan le'l û gewher
Tevde li welatê rojê dikin nezer

Ber nezer kin heyfa wî welatê şêrîn şeker
Heyfa wî welatî ku azad nejin em li ser

Serfirazê xerîb bi derd û keder
Emrê xwe li xurbetê bike heder

Ken fêrî min bike

Kamran Simo Hedîf

bayê hesretê
derûniya min dil girtiye
konê janê
bi ser şadiyê de ketiye
stêr û bêdengiya şevê
rondikên min vedişêrin
ev êş
ne dikuje
û
ne jî
min ji vê tenêtiyê derdixe
her kêlî
giyanê xweragirtinê lawaz dike
xeyal
dişemitîne nehîniyên revok
beybûnên dil
di xweliya xwe de radibine sema pîroz
paqij û zelal in
hezkirin
rê
û
hêviyên min
berî te nas kim
min ne jiyan
û
ne jî ken nas kiribû
lê bi qasî te girandim
ez negirî bûm
li ber rondikên min
gulên baxçên evîndaran çilmisîn
ez navê te
li stêran dinivîsim
û
bi ewran re dans dikim
her şev /hêviyekê
bi hêviya xwe mezin dikim
û
îşev gazî te dikim
were guhdarî min bike
were bibe bihara min
û
ken fêrî min bike

Serhildana Bedirxan Beg û şêxên Neqşîbendî

M. NEZÎR BASNEYÎ

nez.tur@hotmail.com

Mîr Bedirxan Beg, di sala 1812ya zayînî de bû mîrê Cizîra Botan. Wê çaxê temenê wî hejdeh salî bû. Digel vî temenê xwe yê biçûk jî bi jîrî û zanabûna xwe di demeke kin de biratî û yekitiya di navbera mîr û mezinên Kurdan de pêk anî. Bi vî awayî serokên eşîrên welatên xwarê, Colemêrg, Hîzan, Mûş û hinek şêx û kesên bi nav û deng pê re meşîyan.

Mîr Bedirxan dest bi xwe amadekirinê kir. Li Cizîrê atolye-yeke tifingan û yek jî a barûdê ava kir. Ji bo ilm û zanista pêşketî xwendekar şandin Ewrûpayê. Herweha teşebûsa hinek karên baş yê din jî kir. Van kirinên mîr Dewleta Osmanî xist nav tirs û telaşê û hinek memûr şandin cem mîr. Jê re gotin: Divê ew dev ji yekitiya Kurdan berde. Mûşîrê Anatolyê Hafîz Paşa memûrek taybetî şand ba mîr. Lê kir û nekir tiştê nekir serê wî û destvala ji cem zivirî.

Piştî vê yekê Dewleta Osmanî leşkerek şand ser mîr, lê ev leşkerê han jî şikest û Bedirxan Beg êdî dudilî nekir û serxwebûna xwe îlan kir. Tê gotin ku di sala

1842ya zayînî de bi navê xwe sike biriyê. Çarçoveya hukûm û nifûza xwe heta sînore Wanê, Seblaxê, Rewandîzê û Mûsilê biriyê. Herweha kela Sencarê, Sêrtê, Wêranşarê û Siwêrekê dagir kir û nifûza xwe heta kela Amedê bir. Piştî teskînkirina serhildana derdora Mûsilê, Şinoyê û Êrmiyeyê jî dagir kirin. Bi vî awayî Kurdistan bi lez û bez ber bi serxwebûnê ve dimeşîya.

Lê Dewleta Osmanî jî vê gerdanê gelek nerihet bû; leşkerê mezin berhev kir û di bin fermadariya Osman Paşa de şande ser Bedirxan Beg. Li nêzî Êrmiyê herdu leşker rastî hevûdu hatin û şerekî diwar dest pê kir. Hindîk mabû ku leşkerê Osmanîyan têk biçê, îxaneta Kurdan kete dewrê. Di demeke weha teng de Mîr Îzedînê pismamê Mîr Bedirxan Beg, ku fermandarê baskê çepê yê leşkerê Kurd bû îxanet kir û bi derdora xwe ve çû aliya leşkerê Tirkî û alîkariya wan kir. Di encamê de ev serhildana hindîk mabû ku bi sereftin û serxwebûna Mîr Bedirxan Beg û Kurdan bi dawî bibe têk çû. Bedirxan Beg û bi du kurên xwe ve


Rayedarên Dewleta
Osmanî bi nameyekê
hawara xwe digihînin
şêxên terîqeta
Neqşîbendîyan û
dixwazin ku ew bi
pend û şîretên xwe
Bedirxan Beg ji doza
serxwebûnê vegerînin

hatin girtin û ew şandin Stenbolê⁽¹⁾ Pêşyan gotiye, “Kurmê darê ne ji darê be fena darê nine.”

Di dema serhildana Bedirxan Begê Mîrê Cizîra Botan de, waliyê Eyaleta Diyarberkirê ev nameya jêrîn ji şêxên terîqeta Neqşibendiyan re şandiye û ji wan piştgirî xwestiye. Name; bi zimanê ‘Erebî û bi destan hatiye nivîsin û bi ayet û hedîsan hatiye destekkirin. Name, ji nav arşîva

Osmaniyan hatiye wergirtin. Di nameyê de rayedarên Dewleta Osmanî bi awayekî eşkere han û hawara xwe digihînin şêxên terîqeta Neqşibendiyan. Bi taybetî jî, ji biratiya olî zêdetir biratiya di terîqetê de tê bibîxistin û ji wan tê xwestin ku bi pend û şîretên xwe Bedirxan Beg ji doza serxwebûnê gav bidin şûndeavêtin. Herweha ji şêxên Neqşî tê xwestin ji Bedirxan Beg

re ragihînin ku heke ew dev ji vê dozê berde û bête aliyê Dewleta aliye, ewê ewlehiyê û payeyên bilind bidinê. Lê ji binê ‘ebayê xwe dar jî nîşan didin û dibêjin heke ew neyê rayê, hûn bi tevî mirîd û derdora xwe ve piştta wî berdin û xwe bidin aliyê Dewleta Osmanî. Berpirsiyariya hemû xwîna bête rêjandin dixin stûyê Bedirxan Beg û wî bi gotinên giran tehdît dikin.



Nameya ku waliyê Eyaleta Diyarberkirê ji şêxên terîqeta Neqşibendiyan re şandiye

Wergera nameyê ya bi Kurdî

هو الحي القيوم
*Bi navê Xwedayê dilovan û
mêhrîban*

Hemd ji Xwedê re be; hemdê şikirdaran. Selat û selam li ser serwerê me Mûhemmed û li ser tevahiya malbat û hevalên wî bin.

Piştî vê yekê em, şêxên terîqeta Neqşibendiyan; ango

şêx Saleh efendî, şêx Îbrahîm efendî, şêx Hamid efendî û şêx E'zraîl Efendî (Xwedê rewşa wan spehî bike) bi silavine tam û zêde silav dikin.

Gelî birano! Em ji mirîdên terîqeta Xalidiyan û ji dilsozên xanedana Neqşibendiyan in. Mîn xizmeteke pir ji şêxên vê

terîqetê re kiriye û min îcaze ji şêxê me û mewlayê me şêx Hacî Arif efendî yê ku Neqşîbendî, Xalidî û tûsewî (Xwedê sirrên wî pîroz bike) wergirtiye. Di destê min de nivîsara îcazê heye. Û min nûsxeyek jê ji we re jî şandiyê; da ku hûn lê binêrin û hûn bizanin ku ez ji hevalên we yên terîqetê me.

Bi vê sedemê em ji we dixwazin ku hûn şîretan li Bedirxan Beg bikin. Lewma em di terîqetê de birayên hev in.

Ji Temîmê Darî hatiye ragihandin ku pêxember (s.) gotiye: “Dîn; şîret û nesîhet e” sê caran.

Û ji Cerîr (r.) hatiye ragihandin gotiye: “Min li ser pêkanîna nimêjê, dana zikatê û şîretkirin û xêrxwestina ji her misilmanî re bi pêxemberê Xwedê re peyman girêdaye.” Di şerî’et û terîqeta me de; peyrewtiya ji siltanê misilmanan û pêşengê xwedêyekdêran/mewehhidan û xelîfeyê Xwedanê alemê re, li ser her misilmanî wacib û lazim e. Lewre Xwedê -ezze we celle- di pirtûka xwe ya mûbîn de gotiye: “Gelî kesên we bawer kiriye! Bi ya Xwedê û pêxember û xwedî emrên ji xwe bikin.”

Ebû Hureyre (r.) qiset kiriye ku pêxemberê Xwedê gotiye: “Ew kesê bi ya min bike, wî/wê bi ya Xwedê kiriye û ew kesê li dijî min rabe, teqez ew li dijî Xwedê rabûye û ew kesê li dijî emîrê misilmanan derkeve ew li dijî min derketiye û ew kesê bi ya emîrê misilmanan bike wî bi ya min kiriye.”

Ji Ebû Ûmame hatiye ragihandin dibêje: “Min ji pêxemberê Xwedê bihîstiye di hecca xatirxwestinê de diaxivî digot: ‘Xwe ji ‘ezabê Xwedê biparêzin; pênc ferz nimêjên xwe bikin, meha xwe ya remezanê rojî bigirin, zikata malê xwe bidin û bi ya xwedî emrên xwe bikin, hûn dê bikevin behîştê Xwedayê xwe.’”

Di vî warî de ayet û heûsî pir in û pirtûkên ‘eqîdê (bîr û baweriyê) bi pêwîstbûna îtaetkariya ji bo siltanê misilmanan û pêşengên xwedêyekdêran tijî ne. Û mebesta me ji nivîsîna vê nivîsarê ji cenabê we re; ew e ku hûn di terîqetê de birayên me ne û em dibihîsin ku Bedirxan Beg jî daxilê vê terîqeta Neqşîbendiyan e. Vêca li ser wî û li ser her kesî, wacib e ku muxalefeta siltanê me neke; siltanê misilmanan, piştevanê dînê mûbîn, alîkarê şerî’eta rast û durist û rêwiyê rêya rast; Siltan Ebdûlmecîd Xan. –Xwedê milkê wî berdewam bike û Xwedê heta dawiya zemên piştgiriya deshilatdariya wî bike û Xwedê bi alên alîkariyê piştgiriya wî bike. Amîn.-

Lewma di terîqeta me de peyrewtiya sineta pêxember (s.) heye. Herweha lipeyçûyîna rêça eshaban û rêça pêşiyên qenc karekî lazim e.

Ma gelo ji dewra pêxemberê Xwedê heta roja me ya îro, we bihîstiye ji pêşiyên qenc, an jî ji serwerên me yên neqşîbendiyan an jî ji mewlana Diyaûddîn; ku muxalefet

kiribin û bi ya siltanê dema xwe nekiribin? Û li cem her kesî diyar e ku rêya muxalefeta rêwiyê xwe negihîne armancê û kesên hişmend di vê rêyê de naçin.

Ji Irbadê kurê Sariye hatiye ragihandin; dibêje: Pêxemberê Xwedê we’zeke wisa belîx li me kir; ku çavan jê hêstir barandin, dil ji berê lerizîn. Kesekî got: Ya qasidê Xwedê! Ev dimîne bi we’za xwatirxwazekî!.. naxwe ka qewîtiyan li me bike. Got: “Şîreta min li we be ku hûn ji Xwedê bitirsîn û her çiqasî siltanê we bendeyeke Hebeşî be jî guhdariya wî bikin û bi ya wî bikin. Lewma bi rastî ew kesê ku ji we di pey min de bijî, ewê gelek îxtîlafan bibîne. Vêca hûn xwe bi rêya min û rêya xelîfeyên raşid; yên rêya rast dinasin bigirin. Xwe pê bigrin û bi diranên xwe yên kursiyên pê bigezînin. Hay ji xwe hebin; xwe ji wan karên di olê de hatine zêdekirin dûr bigirin. Lewma her karê li dîn hatibe zêdekirin bid’ê ye û her bid’ê jî delalet e/rêwindakirin e û her delalet jî di êgir de ye.”

Bi sedem vê biratiya me û bi xîreta terîqeta me; lazim e li ser me ku em bi qencîrînê gotinê sîdê bidine we. Hêviya me ji we ew e ku hûn şîretan li Bedirxan Beg bikin. Heke ew li ser giyan û mal û malbata xwe û xizmên xwe ditirse, ez ji aliyê siltanê me yê mezin û xaqanê me yê gewre; serokê milûkên Rûm û ‘Ereb û Ece-man ve –Xwedê rîknên dewleta wî qewî bike û her dem

rûyê zemîn bi ronahiya 'edaleta wî ronak be- bi soz û peymaneke qewî peyman didim ku heke ew (Bedirxan Beg) di vê heyamê de were aliyê me, emê ewlehiyê bidinê û emê wî bişînin bal Siltan Ebdûlmecîd û dê siltan jî heta cihê siya wî digihêjiyê, heta dawiyê qencyê pê bike; ewê ewlehiyê bidiyê herweha ewê payeyên bilind jî bidiyê.

Min ev kaxiz ji we re şandiye; da ku hûn heta dawiyê baweriya xwe pê bînin; xwe bispêrinê û da ku hûn bibin

Wisa tê xuyakirin ku ev name berî şandina leşker li ser Berdirxan Beg hatiye nivisîn. Û di pêvajoya amadekarî û avakirina yekitiya di navbera mîr û serokên Kurdan de ji şêxên terîqeta Neqşibendiyan yê bi nav û deng re hatiye şandin. Êdî ka çi qasî ev şêxên han li gorî pêdiviya vê nameyê tevgeriyabin nayê zanîn lê tê payîn. Bêguman dema kesek bi berfirehî haya wî ji dîne îslamê tune be, vê nameyê bixwîne, ewê li gorî dîne îslamê deshilatdariya Osmanî mafdar bibîne û ewê serhildanên mîna serhildana Bedirxan Beg jî wek

sedemê xilasiya jar û feqîran, herweha bibin sedem ji bo hatina Bedirxan Beg. Heke ew bi we re bê aliyê me, dê rewş veguhere spehîtirinê rewşan. Heke na, ewê guneh û webalê belengaz û feqîran jî bikeve stûyê wî û ewê li cem Xwedê û pêxemberê Wî, li cem siltanê û li cem hemî mirovan jî bibe kesek xezeb lê barî. Û heke ew bi we re neyê aliyê me, hûn li peyê neçin û nebin hevalên wî. Heta dawiyê hûn baweriya xwe bi vê gotina me bînin. Herweha heke

dijderketina Xelifeyê Xwedanê alemê binirxîne. Lewma guman di rastiya wateya van ayet û hedîsan de nîne. Lê divê em jibîr nekin ku dîne îslam ne ji van ayet û hedîsan tenê pêk tê. Qur'ana pîroz û pirtûkên hedîsan tijî ayet û hedîsên ku ferman bi 'edalet û dadiyê dikin û zilm û tahdedarî û bînpêkirina mafên mirovan jî qedexe dikin. Weke vê gotina Xwedayê mezin: "Teqez Xwedê ferman bi 'edalet, qencîkirin û dayîna mafê xizman dike, karên kirêt, guneh û zilmê jî qedexe dike. Ji bo ku hûn bifikirin û werin rê Xwedê şîretan li we dike."⁽²⁾

Bedirxan Beg bi ya we neke û şîretên we qebûl neke, me bihîstiye ku mirîd û dilsozên we pir in. Hûn bi tevî mirîd û dilsozên xwe ve jê veqetin û bi tevî mirîd û dilsozên xwe ve werin aliyê dewleta alî. Û ew dê zîyan bike û heke Xwedê hez bike ewê bibîne tiştê ku bibîne. Û dawiya axaftinê silav in.

**Ji Sahib
Mûhemmed Xêredîn
Waliyê Eyaleta
Diyarbakir**

Û weke vê gotina Xwedê teala: "Ha Gelf kesên bawer kirine! Bibin ji wanên heq û 'edaletê li ser piyan digrin û bibin şahidên dadmend û bila hêrsa we ya ji gelekî, berê we nede ser ku hûn li hemberî wan edaletê nekin. 'Edaletê bikin! Ew nêziktirê xweparastin û tîrsa ji Xwedê ye. Ji Xwedê bitirsin; lewma teqez Xwedê bi karê ku hûn dikin agahdar e."⁽³⁾

Çavkanî:

- 1- Mûhemmed Emîn Zekî Beg, Dîroka Kurd û Kurdistanê.
- 2- Sûretê nehl: 90
- 3- Sûretê Maide. 6



Manqûrd*

CENGİZ AYTMATOV

Ji Tirkî: Wehab Mistefazade

Însan gurê însan e.

T. Hobbes

Tê gotin ku wextekî bi navê Juan-Juanan gelek hebûye, gelekî bêûjdan û bêrûhmet. Ev gel, welatê Sarı-Özekê dagîr dîkin û li kesê ku dîl digrîn, îşkenceyeke ku nayê aqilan bi wan dîkin. Car-na van hêsîran difiroşin welatên cîranê xwe. Tê gotin ku evana bextiyar bûn ku dihatin firotin, lewra îşkenceyek mezin û ecêb bi ew kesên ku ji ber ciwanbûn û xurtbûna xwe ku ew nedifirotin, dikirin. Pêşî serê wan xortan rût dikirin, ta bi ta porê wan radikirin. Di eynî wextê de jî, qesabek li kêleka din deveyekê diavêje erdê, serjê dike. Ji çermê deveyê ciyê herî stûr, çermê stûyê wê bûye, ji wir dest bi gurandinê dikirine. Vî çermê ha dîkin parçe parçe û teze teze li serê rûtkirî yê xortan dipêçandine. Ji vê re “îşkenceya çermlekîrinê” digotîne. Ew ciwanên ku duçarî vê îşkenceyê dibûne, ya dimirin ya jî hafizeya xwe bi tevayî wînda dikirin, ango dibûn manqûrdek. Tê

gotin ku ji stûyê deveyekê têra pêçandina serê pênc-şeş xortan çerm derdiket. Jê û pê ve, ji bo ku hêsîr serê xwe bi erdê nexin, qalibek text çêdikirine û bi serê wan ve girêdidan û ji bo ku qîrîniya wan ya ji ber îşkenceya ku didîtin neyê bihîstin jî bê xwarin û vexwarin, li ber qiyala nîvroya rojê çend rojan ew dihiştin. Yek ji van hêsîrên ciwan û xurt ku ew dikirin manqûrd, kurê Nayman Anayê bûye.

* * *

Tê gotin ku, ew hêsîrên ji bo ku bibin manqûrd ku bi rojan di bin tîna roja welatê Sarı-Özekê de diman, gellek ji wan dimirin, ji çar-pênc kesan yek ya jî du kes sax difilitîn. Yê ew dikuştin ne birçîbûn ya jî tîbûn bûye, ji vê bêhtir ew çermê deveyan ê ku pê serê wan girêdidan bûye. Lewra ew çerm, gava hişk dibe tê serhev û êşeke ecêb bi wan re çêdike, ev jî dibe sebeba mirina wan. Ji hêlekê de çerm tê serhev û ji hêla din de jî mûyên porên wan ên ku şîn tê, di çermê serê wan re radibe. Di encamê

Tê gotin ku, ew hêsîrên ji bo ku bibin manqûrd ku bi rojan di bin tîna roja welatê Sarı-Özekê de diman, gelek ji wan dimirin, ji çar pênc kesan yek ya jî du kes sax difilitîn

* Ev efsane, di pirtûka Cengiz Aytmatov de ya bi navê *Gün Olur Asra Bedel*, (Ötügen Yay., İstanbul, 2000) de derbas dibe. Ev tekst, kurteya vê efsaneyê ye.

de manqûrd ya dimrin ya jî aqil û hişê xwe bi tevayî winda dikin.

Tê gotin ku Juan-Juanan roja îşkenceyê ya pêncemîn tên li manqûrdan mêze dikan ka sax in an jî mirîn e. Yek bi tenê jî xilas bûba Juan-Juanan xwe bextewar didîtin. Radihiştin manqûrdê ku hişê xwe winda kiriye, qalibê ku bi serê wî ve girêdayiye derdixistin, xwarin û vexwarin didanê. Hêsîr bi demê re dihat ser hişê xwe û hêza xwe dida hev. Lê ew êdî dibû manqûrdek. Ew dibû koleyekî wisa ku bedelî deh koleyên li bazaran dihat firotin. Heta di nav Juan-Juanan de edetek hebûye ku di şerekî de gava manqûrdek dihat kuştin, xwîna ku di berdêla wî de dihat stendin, berberî sê qat xwîna mirovekî azad bûye.

Kesê ku dibû manqûrd hew zanîbû ku kî ye, ji kîjan berê ye, dê û bavê wî kî ne. Dev heye, ziman tune; efendiyê wî bibêje çi wê dike, mîna heywanekî. Heywanekî wisa bin emir, revê jî nafikire. Ji efendiyekî re tirsê herî mezin, serhildana koleyan e. Lê manqûrd afirînêrên yekane bûne ku serhildan nedihat bîra wan. Afirînêrên mîna kûçik sadiqê efendiyê xwe, di bin emrê efendiyê xwe de bûne, ji têrbûna zikê xwe pê ve tu tiştêkî din nedifikirîn. Kîjan karê zahmet û qirêj hebû, bi sebreke mezin, bêdeng dikirin. Li hember germa çola Sarî-Özekê ku pir dijwar bû, encax kesên dibûn manqûrd karîbûn debar bikin. Ji ber vê yekê, li vir çêra deveyan karê manqûrdan bûye. Li vir, li vê çolê manqûrdek berberî du sê kesan bûye. Xwarin û vexwarina wî hebûya bê gazin karîbû havîn û zivistan li

vir derbas bikira. Ev rêbazî yanî manqûrdkirina mirovan ji hêla gelê koçber, Juan-Juanan hatibû peydakirin, rêbazek ku di dîroka mirovahiyê de bi wahşetbûna xwe bêhempa ye.

Nayman Ana jî yek ji wan kesên bû ku lawê wê weke kolakî ketibû destê Juan-Juanan. Ji Nayman Anayê re gotibûn ku lawê te di şer de hatiye kuştin. Lê rojekê hin bazirganên ku çola Sarî-Özekê derbas kiribûn û hatibûn li bin konekî karwanan yê ji bo bêhnvedanê rûniştibûn, behsa manqûrdekî ku li çola sarî-Özekê dîtibûn, kiribûn. Nayman Anayê jî li bin wî konî li van bazirgan guhdarî kiribû. Her çiqas jê re gotibûn lawê te hatiye kuştin jî, hisekê di hundirê Nayman Anayê de demeke dirêj e jê re digot lawê te sax e. Piştî van gotinên bazirgan, hêviya ku lawê wê sax e û tirsê ku lawê wê bûye manqûrdek dîsa di hişê wê de geş dibe. Kurmek dikeve hundirê Nayman Anayê ku ew manqûrdê ku behsa wî hatibû kirin ka lawê wê ye an na. Ji bo ku dilê xwe di cî xê, biryarê dide ku here çola Sarî-Özekê.

Nayman Ana, dest bi hazirîya çûna çola Sarî-Özekê dike. Du telfîsan tije xwarin dike. Avê jî bi xwe re dibe, lewra Sarî-Özek çolek wisa bû ku dibe av lê peyda nebûya. Ji bo vê yekê du meşk jî tije av dike. Deveya ku ewê lê siwar bibûya, Akmaya jî amade kiribû. Ev deve hem rêhevala wê bû, hem jî hêviya wê. Deveyek mîna Akmaya xurt û bi lez dimeşîya tunebûya dê çawa têteta rêya wê çola xalî ku bê serî û bê dawî bû. Bi stûyê xwe yî xurt û dirêj, bi serê xwe yî narîn, bi firnikên xwe yî ku gava bêhn distand û berdi-

da mîna basikê pinpinîkê vedibûn û dihatin girtin û bi rengê xwe yî spî, Akmaya, beramberî garaneke hêştiran bûye.

Di berbanga sibehê de, Nayman Ana jî konê xwe derket. Ji bo rêwîtiyê her tişt amade bû. Nayman Ana, her çiqas ciwaniya xwe winda kiribû jî, bedewbûna xwe hîn winda nekiribû. Jinek tenik û dirêj bû, li ser xwe bû. Li gor rêya dirêj xwe girêdabû. Çîzmeyên xwe derbasî lingên xwe kiribû, qayîşa xwe li nava xwe girêdabû, yêlekek bera ser fîstanê xwe dabû, şelwerekî fireh li xwe kiribû û mantoyek avêtibû ser milên xwe. Çitek spî jî li serê xwe gerandibû. Madem hêvî dikir ku lawê wê sax e, wê gavê ne pêwîst bû ji niha ve çîta reş bide dora serê xwe. Heger hêviya xwe ji lawê xwe bibiriya wê hingê çîta reş girêbida û heta ku sax bûya jî wê hew daniya. Di vê berbanga sibehê de kelogirî bû. Gelo di aqilê wê re derbas bûbû ku rojekê wê têkeve rewşeke wisa.

* * *

Deveya spî, Akmaya, ev bi rojan e ku di car û newalên çolê re dimeşîya, dimeşîya. Nayman Anayê di kelegema vê çolê de deveya xwe, bê rawestandî diajot. Hew gava ku li bîrek avê rast dihat û bi şev radiwestiya. Wexta dibû sibe -nedibû sibe dîsa dest bi rêwîtiya xwe dikir. Li benda dîtina garaneke deveyan bû ku hêvî dikir ku lawê xwe bibîne. Nayman Ana, ev du roj e ku li devera geliyê Malakumduçap bû. Vê derê, ew cî bû ku bazirgan gotibûn ku me li wir manqûrdek tev revî û garana deveyan dîtiye. Ev du roj bû ku ew li dora geliyê Malakumduçap ku bi

kilometreyan dirêj dibe, bi hêvî, digeriya û ji aliyekî de jî bi xof bû ku rastî Juan-Juanan bibe. Geriya û geriya, bi tenê çola dûr û dirêj dît. Çol û leylan...

Carekê di nava leylanê de bajarek dît. Mizgeftên wê, mîna-reyên wê û keleha bedena wê dixwiya. Hêviyeke mezin pê re çêbû, Akmaya da çargavan. Dibû ku lawê xwe li bazara bajêr ya koleyan bibîne. Wê ew bikiriya û wê û lawê xwe dê berê xwe bidana gundê xwe. Lê çi fêde, ev leylanek bû.

Nayman Ana ne li reviyên deveyan rast dihat, ne jî li şopawan. Tirsek kete dilê wê: ya garan ji vir çûbe çêrgeheke din? Ya Juan-Juanan deveyên xwe firotibin, wê gavê wê lawê xwe çawa bidîta? Nayman Ana gava ji gund derketibû û dabû rê, xwestekê wê tenê hebû: Bila lawikê xwe bi sax bidîta, çawa ew didît bila bidîta. Tu dixwazî bila bûba manqûrd û her tiştê xwe; xwe, paşeroja xwe, her tişt wînda kiriba; bes bila sax bûya... Lê niha li vê çola Sarî-Özekê, her ku nêzî cihê ku wê şivanê garana deveyan bibîne dibû, xofek jî diket dilê wê ku rastî xortekî bêmeji, xortekî ku xwe û paşeroja xwe ji bîr kiriye, bibe. Û amade bû ku xwe biavêje Xwedê ku xortekî wisa ne lawê wê bûya.

Nayman Ana ya ku bi van hestên nakokî rêya xwe dom dikir, piştî ku kendalekî nîzm qulipand, ji nişka ve rastî keriyekî deveyan hat. Keriyê deveyan di hundirê gelî de belav bûbûn, bi çêra gihê û jêkirina serê sitiriyangêr dibûn. Nayman Ana, Akmaya da lezandin û dawiyê da çargavan. Ji hêlekê de kêfek diket

hundirê wê ku lawê xwe bibîne û ji hêla din jî de xofekê xwe bera bedena wê dida ku mîna manqûrdekî çav li lawê xwe bikeve.

Niha kerî li hember wê bû. Lê ka şivan? Şivan li ku ye? Ha, belê waye li wir e. Ji dûr ve rûyê wî xweş nedixwiya. Darekî dirêj di dest de bû. Deveyek bi semer û eşya tê de li cem bû; di bin sîpera şewqeyê ku heta daxistibû nava çavên xwe de, bi awayekî aram, li deveya xwe mêze dikir.

Nayman Ana gava nêzî şivan bû, nas kir ku kurê wê ye, lê hîn fêm nekiribû ku ka rewşa wî çawaye. Xwe ji nişka ve li erdê dît. Rabû ser xwe. Qêrînî pê ket:

-Kurê min! Bexikê min. Ez li her derê li te digeriyam. Ez diya te me!

Lê di heman wextê de jî rastiya nebixêr fêm kiribû. Hêsir mîna baranê ji çavê wê diherikîn, xwe li erdê dixist, hew zanibû dê çawa bike. Xwe avêt nav milên lawê xwe. Law, bêreaksiyon, welê ji xwe re li wê mêze dikir. Di nav hêsirên ku nikarîbûn ew bisekinanda, di nav porên xwe yî gewrbûyî ku ketibûn nav çavên wê ku şil bûbûn de; li rûyê kurê xwe, li xetên wî rûyê ku nas kiribû mêze dikir. Hêvî dikir ku kurê wê, wê binase. Ma tu tişt jê hêsantir heye ku kurek diya xwe nas bike?

Tê bigota qey ev jin her roj tê wî ziyaret dike; Şivan ne jê re got tu kî yî û ne jî ji bo çî tu digirî. Piştî ku hebekî welê rawestiya, dawiyê destê jinikê ji ser milên xwe daxist û meşiya hêla keriyên deveyan yê din ku li torimê deveyan mêze bike ka ji garanê bi dûr ketine ya na.

Nayman Ana, li cihê ku rawestiyabû, bi çogan çû erdê. Destê xwe bir ser çavê xwe û bû îska îska wê. Paşê, dîsa rabû berê xwe da lawê xwe. Law ferq dike ku ew tê ba wî, lê di nav çavên xwe yî ku di bin şewqeyê ku bi serê xwe ve esirand de bû de, bê wate lê dinêrî. Mêze dikir, lê çavên wî vikî vala bûn.

Nayman Ana hat ba lawê xwe û keserek kûr hilanî:

-Wer em li vir rûnên û hebekî ji xwe re biaxivin, got, li erdê rûniştin.

-Te ez naskirîm?

Manqûrdî bi mana "na" serê xwe hejand.

-Navê te çiyê?

-Manqûrd

-Ev nav, navê te yê niha ye. Yê berê çiyê? Navê xwe yî rasteqîn bîne bîra xwe.

Manqûrd bédeng ma. Qet nedixavî. Ji tevgera wî xwiya bû ku dixwest bîne bîra xwe, lê dîsa dixwiya ku diwarekî stûr dibû asteng li hember vê xwesteka wî.

-Baş e! Bavê te tê bîra te? Navê bavê te çî bû? Tu kî yî? Ji kîjan gelî yî? Hîç nebe, cihê ku tu lê çêbûyî, welatê xwe bi bîr bîne...

Na, Manqûrdî qet tu tişt nedizani, qet tu tişt nedihat bîra wî.

-Wax kurê min, çî anîne serê te!

-Jî mirovekî mal û milkê wî, çî tiştê wî hebe dibe ku bê standin, got ji xwe bi xwe re, lê mirov dikare hişê însanan ji wan bistîne, cinayeteke wisa dibe? Hey Rebbê ku riziq dide! Eger tu hebî, te çilo fikirek wisa xist aqilê mirovan? Li rûyê erdê qey tu nebaşî û zilmên din nemabûn!

Tu tevger û refleks li dor Manqûrdî peyda nedibû. Naymana Anayê vê carê jî xwest bi hin rêbazan bîne bîra wî û jê re behsa paşeroja wî kir:

-Navê te Colaman e. Deng tê te? Tu Colaman î. Navê bavê te Dönenbay bû. Bavê te jî tê hişê te? Di zarokatiya te de tîravêjî hînî te kir. Ez jî diya te me, tu jî kurê min î. Tu ji qebîla Naymanan î. Tu fêma dikî. Tu xortekî Naymanî yî...

Manqûrdî, zerre misqal bertek rê peyvên jinikê nedida û bi xemnexwîrî lê guhdarî dikir. Tê bigota qey tu qîmeta van peyvên tune bû.

Nayman Anayê ji lawê xwe yî manqûrd pirsî:

-Beriya ku tu bêyî vir, çi tişt bûn?

-Tu tişt nebû.

-Bi şev bû, ya jî bi roj.

-Ne tiştêk bû.

-Tu dixwazî bi kê re bipeyivî?

-Bi hîvê re. Lê dengê me naçe hev. Li wir yekî rûniştî heye.

-Jê pê ve tu çi dixwazî?

-Mîna efendiyê xwe, min dixwest porê min î hûnandî hebe.

Nayman Anayê destê xwe dirêjî serê manqûrd kir.

-Serê xwe dirêj bike, bê çi anîne serê te, ez bibînim.

Manqûrd ji nişka ve paşde vekîşîya. Şewqê xwe bi serê xwe ve dewisand. Berê xwe bi hêla din vekir, li rûyê diya xwe jî nedinêrî.

Di vê navberê de, ji dûr ve, zilamekî ku li deveyekê bû ku ber wan ve dihat, xuya bû.

-Kî ye ev yê tê? got Nayman Anayê.

-Ji min re xwarinê tîne.

Nayman Ana ket nav telaşê. Ji bo ku kesê Juan-Juaan wê nebîne, li deveya xwe siwar bû û ji wir çû. Ji garanê bi dûr ket, xwe di geliyekî kûr de ku li berwara wî komik komik pelîn hebûn de veşart. Zilamekî Juan-Juanî Nayman Ana li hinda lawê wê dîtibû. Her çiqas bi dû ket jî di hundirê gelî de ew nedît. Gava kesê Juan-Juanî li Nayman Anayê digeriya, di ber wê re derbas bûbû. Kesekî mahdtirş bû. Nayman Anayê bi xwe bi xwe re got: Ev kesina di kîjan şertan de dijîn ku were wahşî û hov in ku bi bêûjdanî mejiyên van kesên ku digrin dişon.

Nayman Anayê, ew şev, li wê çolê, bi tena serê xwe derbas kir. Wê şevê Nayman Anayê, biryar da ku lawê xwe ji vir bibe. Bila manqûrd be, bila tiştêkî fêma neke, dîsa jî li welatê xwe li nav gelê xwe be, çêtir e ji Juan-Juaan re şivantiyê bike. Lawê wê, piştî ku vegere welatê ku lê çêbûye, belkî jî, aqilê wî were serê wî, zarokatiya xwe bi bîr bîne...

Piştî ku bû sibe, Nayman Ana li Akmaya xwe siwar bû, ji dûr ve, ji kêlekê de lê zivirî, xwe gîhand kerfî. Beriya ku nêzî kerfî bibe, ji dûr ve mêze kir ka Juan-Juanî li wir e ya na. Paşî fêma kir ku ne wir e bi navê lawê xwe yî rasteqîn bang kirê:

-Colaman! Silav Colaman!

Ku Manqûrd zivirî û lê nêrî, ji kêfa qêrîn bi jinikê ket. Lê di heman demê de jî fêma kir ku kurê wê ne ku ew nas kiriye ya jî navê xwe bi bîr aniye ziviriye, bi tenê ji ber ku dengê hatibûyê.

-Navê te tê bîra te? Bîne bîra xwe kurê min... got bi lavahî.

-Bîne bîra xwe lawê min, navê

bavê te Dönenbay bû. Ma te ji bîr kir? Navê te jî ne Manqûrd e... Colaman e navê te. Colaman! Me ev nav li te kir, ji ber ku tu bi rê de, di koçberiyê mezin a Naymanan de çêbûyî. Li cihê ku tu lê çêbûyî, me sê rojan qonax vegirtin, me sê rojan şahî lê çêkir.

Evan peyvên hemûyan, tu tişt netanîn bîra Manqûrd. Nayman Ana dipeyivî, dipeyivî lê vala bû, dîsa jî tu tişt nedihat bîra wî.

Dawiyê bi xwarina ku bi xwe re anîbû, zikê lawê xwe têr kir, av pê da vexwarin, jê re lorîn gotin. Manqûrd pir kêfxweş bûbû bi van lorînan. Rûyê wî vebû, nermbûnek şêrîn xwe bera ser hinarkên rûyê wî da. Diya wî jê xwest ku pê re herin gundê xwe, ji vî welatî bi dûr bikeve.

Di heman demê de Nayman Anayê dît ku Juan-Juaanek nêzî wan dibe. Vê carê hîn nêzîktir bû. Nayman Ana rabû, li deveya xwe siwar bû û bi hêla din ve deveya xwe ajot. Lê Juan-Juaanekî din derket pêş wê. Vê carê di navbera her duyan re deveya xwe da çargavan û bi dûr ket. Juan-Juaanekî pê ketin, lê gava fêma kirin ku nagihîjinê paş ve vegeyriyan. Rebena dê wê di ku re zanîbûya ku di vegeyriyê de lêxistineke ku nêzî wî bikujin li lawê wê kirine. Ji hêlekê de lê dixistin, ji hêla din de jî pirsî jinikê dikirin:

-Ez nizanîm, dibêje ez diya te me.

-Naxêr, ne diya te ye, diya te tune! Tu zanî ew ji bo çi hatiye vê derê? Ew jî dixwaze şewqê te ji serê te derê û serê te buxar bike! Ji bo vî karî hatiye vir!

Manqûrdê ku ev peyvên ha bihîstin, ji tirsî rûyê wî zer

bû. Stûyê xwe kişand hundirê milên xwe û bi her du destan, bi şewqê xwe girt, bi serê xwe ve dewisand.

Ji Juan-Juanan ê temenmezî:

-Hadê, êdfî netirse! Ha ji te re evana! got.

Bi vê gotinê re, tîr û kevanek xist destê Manqûrd.

-Hadê nîşanê bigire! Lêxe hela!

Û tîr, şewqeyê ku bi hewa ketibû qul kir û derbas bû.

Nayman Ana, mîna çûkê ku ji hêlîna xwe hatibe tirsandin, di çola Sarî-Özekê de, direviya wê hêlê û vê hêlê û hew zanibû wê çî bike. Ji nişkê ve dît ku her du Juan-Juanî ji kerfî bi dûr ketin û çûn. Pir kêfa Nayman Anayê hat.

Di dilê xwe de digot, ezê kurê xwe ji vir bibim, çî hatibe serê wî hatiye, dêmek qedera wî wisa bû. Diya wî wê ew mîna kolekî li vir nehišta.

Nayman Ana bi van ramanan nêzî kurê xwe bû. Lê li ba deveyan tu kes nedixwiya. Şivan ne li wir bû. Gelo bi ku de çûbû?

-Colaman! Colaman! Tu li ku yî, kurê min? got bi qêrînî, Nayman Anayê.

Kesî bersîv neda, kesê dixwiya tune bû.

-Colaman! Tu li ku yî? Ez hatim, ez, diya te! Tu li kuyî?

Nayman Anayê, gava bi meraq li derdora xwe mêze dikir, haya wê jê tune bû ku lawê wê yî manqûrd di paş deveyekê de, bi çogan rûniştiye û tîrê xwe vezelandiye, xwe amade kiriye ku tîr biavêje. Tîrêja rojê diket çavê Manqûrd, dibû asteng ku tîr biavêje.

Ez û tu

S. Ahmet KAYA

Ez û tu, em bi hev re radibûn
Bi şewqa sibê
Diçûn serê çîyan
Derbas dibûn nav kulilk û binevşan
Bi dilekî fireh
Bi dilekî dilgeş û bawer.
Ked û xwarîna me tev
Me bi hev re digot
Stran.
Li ser evîne;
Bayê nav daran xuş dibû dihat
Dilê me honik dikir...

Dema ku em tev digeriyan
Hesûdî diket nav demsalan
Û payîzê xwe ber dida
Û ji hev bela dikir evîn...
Tu li aliyekî diketî
Ez aliyekî...

Axx! Heyf e!
Kesî em fêhm nekirin...
Evîna ku me tev mezin kirî û pir kirî
Çimkî evîn...

Nayman Anaya ku ditirsiya ku tiştê hatibe serê kurê wê, bangkirina xwe dom kir:

-Colaman! Kurê min!

Nayman Anayê, ji nişkê ve dît ku lawê wê nîşan lê girtiye.

-Bise! Neavêje!

Lê, ji bo vê peyvê hew dem hebû. Xwestibû deveyê bilezlezîne, lê tîra ku hatibû avêtin, bi vizîni di kêleka wê ya çepê de çikilîbû.

Derb kujer bû. Serê Nayman Anayê bi ber wê ve hatibû

xwarê, her çiqas xwestibû xwe bi stûyê deveyê bigre jî, nebû, hat xwarê, li erdê ket. Lê beriya ku ew bikeve, çîta wê ya spî ket ji serê wê. Û ev çîta spî bû çûkek û bi hewa ket. Peyvên ku dawîya dawiyê ji devê Nayman Anayê derketibûn, dubare kir û firiya:

-Tu navê diya xwe dizanî? Tu dizanî ku tu kî yî? Navê bavê te Dönenbay e! Dönenbay! Dönenbay!●

Li ser romana Eyûp Kiran Dewrêşê Evdî

ABDULQADÎR GOK

Di romana li ser destançîroka “Dewrêşê Evdî” de gelek mijarên girîng hene. Di romanê de wêjeya Kurdî heye, şer û qelaciya eşîr û began heye, cî û warên bav û kalên Kurdan heye, evîn û evîndariya Dewrêşê Evdî heye, eşîrtî û bajarvaniya herêma Kurdan heye, bîr û baweriya ola Êzîdî û Mislîmanan heye, erf û edetên eşîra Kurdan heye, tore û tolhildana beg û axayan heye, yekîti û îtifaqiya Kurdan heye... Desthilatiya Osmanîyan û serweriya axan û began di nav Kurdan de yekîtiyê xirab dike. Qelacî û dagerkerî mala Kurdan xirab dike û evîn tu caran mirinê jî bend nabîne. Eyûp Kiran di romana xwe ya li ser destançîroka “Dewrêşê Evdî” de ev serpehatî û bûyerên dîrokî bi awakî hişmendî aniye ziman û ji bo Kurdan dîrok bi awakî romanî li ber çavan raxistiye. De ka em binêrin romana bêhempa ji bo me û ji bo gelê Kurd çî fikreke sosyolojîk û dîrokî dide me. De ka em binêrin, ev romana hişmendîya sosyolojîya netewa Kurdan bi me dide nas-kirin an na!

Di romana Eyûp Kiran a bi navê “Dewrêşê Evdî” de li

ser yekîtiya eşîr û federasyona begên Kurdan disekine. Di romanê de rûpelê 41ê bi awakî balkêş yekîtiya eşîra Milan û Berazan (Deşta Sirûcê) tîne ziman. “Cimata Milan û Berazan di dawîya şêwr û mişêwrên xwe de gihîştin vê biryarê û gotin: “Namûsa me Kurmancan hebe wê bi yek bin, bi dewlet bin, sultanên wan jî wê hebe, edalet wê were welatê me, rêwiyên me wê bi rihetî bi rêya xwe de bimeşin, karwan wê bêtirs herin werin, Koçer wê di nav ewlekariyê de terşên xwe xwedî bikin, cotkar wê bi rihetî çandîniya xwe bikin û benderên xwe rakin. Karwan wê bi dilrihetî di welêt re derbas bibin, barên bazirganan wê bi baweriyeke xurt bê kîşandin. Emê gişkî bi hev re hêsan bibin û ji yekîtiya me re kêfa me wê were”

Destana Dewrêşê Evdî ji dîroka Kurdan nîşan dide ku ew şerê di navbera eşîrên mezin de bûye (Navbera Milan û Gêsan, Şemiran, Tirkmenan), dengbêj bi êş û evîna Dewrêş û Edûlê tîne ziman. Dengbêj şerê di navbera mîr û axan de bi cih û bi war raber dike. Dîroka eşîr û axatîyê,

Dengbêjên ku bi
berfirehî Dewrêşê Evdî
û Edûlê bi lêv kirine;
Baqî Xido, Xefarî,
Osmanê Xanihewşerê,
Bavê Ferîd, Şûkrî
Îzol, Şakiro, Cemîl
Horo, Karapêtê Xaço,
Bavê Salih û gelek
dengbêjên din, beş bi
beş bin jî ev destan
bi lêv kirine. Dema
mirov li van dengbêjan
dinêre, mantiqa
sazkirina kilamê, bûyer
an şexs yek in




mîr û begitiyê bi awakî zindî ji qirika dengbêjan derdikeve. Deng dîrokê nîşan dide, cih û waran nîşan dide. Ev romana li ser dengên dengbêjên ku li herêma Bajarê Riha û herêma Beriyê bi salan dîrokê ji nîfşên nû re dubare dike, hatiye nivîsandin. Deng dibe çavkaniya dîrokê.

Deng, ji bo Kurdan bi awakî zindî xeber dide, xeber dibe dîrok, dîrok ji nîfşên nû re dibe hiş û mêjî. Ji netewan re dibe şîûr û berxwedan. Zanebûna nîfşên nû bi dengê dengbêjan di dîrokê de her tim neqil dibe. Dema meriv li dîroka Kurdan bigere çavkaniyek ji dengbêjî ye.

Dengê dengbêjan çavkaniyeke zindî û bi bawer e. Divê ev dengana hemû bi roman bin, mîna romana Dewrêşê Evdî ku Eyûp Kiran bi awakî balkêş aniyê ziman.

Ji bo vê jî ka em lêhûrbûnekê li ser dengbêjî û destana Dewrêşê Evdî



û Edûlê bikin. Di destana Dewrêşê Evdî de çîrok di nava çîrokan de bi awayekî diyalektîkî hûnandî heye. Tê gotin ku destançîroka Evdî bi 12 kilam û stranên ji hev cihê û her stiran li ser egîdên hevalê Dewrêşî Evdî tîn gotin. Ev destançîroka Dewrêşê Evdî bi rojan belkî bi heftan ji alî dengbêjên bi nav û deng tê stîrîn. Eşq û evîna Dewrêşê Evdî bi rojan encax tînine ziman. Kilama ku bi dûr û dirêjîyê berdewam dike bi 12 egîdên hevalên Dewrêşê Evdî ve tîn girêdan.

Her çiqas di piraniya dengbêjan de, destan bi evîna Dewrêş û Edûlê dest pê bike jî, bes destan ji sê beşan pêk tê û her beşek di nava xwe de, dîsa bi awayê sêcaranî didome û tev bi hev re girêdayî ne. Yanî destan tenê ji Dewrêş û Edûlê pêk nayê. Romana Eyûp Kiran bi serîskaniya Temir Paşayê Millî dest pê dike.

Di destançîroka 'Dewrêşî Evdî û Edûlê' de evîn dixwaze bibe serweriya erdnîgariyê.

Evîn, dixwaze bibe serokê Kurdan û bibe rêberê Kurdan. Yanî tenê di milê evînê de li destanê nayê nihêrtin.

Egîdiya Kurdan ev e ku bi înadî eşq û evîn. Bi înadî 'eşq û evîna bi zor û zilm. Eşq tê maneya egîdiya Kurdan jî. Paşayê Milan ji bo gelê egîdên Kurdan xîtabî dilê wan dike, "Kî fîncana zêrîn ya serbixwîn rake û qebûl bike, li hemberî Gêsiyan, Şemiran û Tirkan şer bike, ezê Edûlê bidimê." Ev bûyer derûniya dilê Dewrêşê

Evdî rind derdixe holê. Ev daxwaza jidil e. Ne berjewendiyêke mal û milkê dinê ye, lê ev ji kûraniya ruhê Dewrêşê tê.

Dem a meriv li destana Dewrêşê Evdî dinêre seranserê xwe li ser evîna desthilatiya netewa Kurd e. Serweriya Kurd wek evîneke dil bi rih û canê egîdan ve girêdayî ye. Hebûna nîrxên desthilatî di her destan û destançîrokên Kurdan de hene. Meriv li kîjan destanê an li kîjan kilaman dinêre li ser nîrx û serweriya gelê Kurd e. Pevçûn û lêdana di nav qebîle û eşîran jî sedemên nîrxên serweriyê ne. Herkes dixwaze bibe desthilatdar. Kes naxwaze kesên din bibe serokê kesên din. Netewa Kurd tu caran desthilatiya zordarî û desthilatiya gelên din qebûl nekiriye.

Dengbêjên Kurdan li herêma Kurdan û li çar parçeyên Kurd lê dijin her tim anîne ziman û dengê xwe yê lezîz îfade kirine. Tesbitkirina erdnîgariya cih û warên Kurdan di kilam û stranên de bi awakî fermî hatiye parastin. Di destana Dewrêşê Evdî de cih û warê eşîrê Kurdan raber dike.

Dengbêjî dîrokeke zindî ya gelê Kurd e. Bûyer, qewimîn, şer, mîrxasî, ziman, erdnîgarî, evîn, destan û gelek mijarên dîtir, bûne mijarên kilamên dengbêjan. Kurd neçar mane ku zargotinên xwe, destanên xwe li hember dîroka kambax ku cî nedaye wan bi devkî bidine jiyandin. Destana Dewrêşî Evdî yek ji wan mîtolojiya rast e.

Pêwîst dike ku mirov di dengbêjîyê de li ser Destana Dewrêşê

**Dewrêşê Evdî, yek ji egîdên Kurdan e.
Bi lehengî şer kiriye û ne bi usûleke layîq şehîd ketiye.
Di wextê xwe de serokê Kurdan e, dema ku dimire jî,
li girê Qermîte yan jî girê Etşanê, di erdê mişkan de,
lingê hespê wî dikeve kolemişkan û bi şûr, rim û
xençeran di xwînê de dihêlin jî, li ser soza xwe ye û
soza wî jê re esas e.**

Evdî û Edûlê bisekine. Dîsa mijareke girîng jî di dengbêjiyê de erk û hûnandina vê destanê ye. Li herêma bajarê Rihayê ev destan bi lehengê Dewrêşê Evdî qewimiye. Ev evîn bûye sedema şer û mîrxwasiyê. Evîn bi xwe re gelek bûyerên nebaş tîne. Evîn û eşq vediguhêze şer û mîrkujiyê an jî vedigere egîdî û tolhildanê an jî vedigere desthilatiya qehremaniya mîr û axatiyê.

Dewrêşê Evdî, yek ji egîdên Kurdan e. Bi lehengî şer kiriye û ne bi usûleke layîq şehîd ketiye. Di wextê xwe de serokê Kurdan e, dema ku dimire jî, li girê Qermîte an jî girê Etşanê, di erdê mişkan de, lingê hespê wî dikeve kolemişkan û bi şûr, rim û xençeran di xwînê de dihêlin jî, li ser soza xwe ye û soza wî jê re esas e. Bajarê mişkan dibe gora Hedbanê û dibe gora Dewrêşê Evdî. Piştî mirina Dewrêşê Evdî Kurd bê serok dimînin. Temir Paşa demeke kin desthilatiya xwe ji dest dide.

Dengbêjên ku bi berfirehî Dewrêşê Evdî û Edûlê bi lêv kirine; Baqî Xido, Xefarî, Osmanê Xanihewşerê, Bavê Ferîd, Şûkrî Îzol, Şakiro, Cemîl Horo, Karapêtê Xaço, Bavê Salih û gelek dengbêjên din, beş bi beş bin jî ev destan bi lêv kirine. Dema mirov li van dengbêjan dinêre, mantiqa sazkirina kilamê, bûyer an şexs yek in. Cih û war, eşq û evîn yek

e, dek û dolap yek in, desthilatî û serwerî yek in. Bawerî û mezheb yek xuya dikin.

Li gor Baqî Xido nefikirina Evdiyê Milhim sedema xwestina Edûlê ye. Eyûp Kiran jî mîna Baqî Xido nefikirina mala Milhim bi xwestina Edûlê ve girêdide. Evdî, Edûlê ji bo kurê xwe Dewrêş dixwaze, lê Zor Temir Paşayê Millî ji bo Êzîdîtiya Dewrêş û mala wan naxwaze qîza xwe Edûlê bidê. Li ser vê xwestina Dewrêş mal û malbata Evdiyê Milhim nefiyê herêma Berazan gundê Elîgor (Elîgor, li herêma qezaya Rihayê ya Sirûcê ye) dikin. Çar salan li gundê Elîgor dimînin. Dewrêş ji eşqa dilî Edûlê dixwaze, lê îmkantune ku bi evîna xwe bigihê. Eşîrên Tirkmenan, Gêşan û Şemiran li hember eşîra Zor Temir Paşa derdikevin û dixwazin derdorên (erd, cih û warên) Milan ji dest bigirin û Desthilatiya Milan dawî bînin. Li hember wan eşîran Zor Temir Paşa bangî eşîrên di bin desthilatiya xwe de dike, lê kes ranabe. Zor Temir Paşa dawiyê Edûlê dike dewrê, ku kî li hember wan dijminan rabe Edûlê diyarî wan bike. Edûl li cimata bavê xwe li bin konê bavê xwe “fincana serbixwîn” digerîne. Eger kesê rake li hember eşîrên dijminan egîtiya xwe bi kar bîne wê Edûlê jî li xwe mehr ke. Destana Dewrêşê Evdî di alî fîncanrakirinê de balkêş e.

Tu egît fîncana serbixwîn rana-kin. Temir Paşa bêçare dimîne bangî Dewrêşê Evdî dike, eger bê fîncana serbixwîn rake wê Edûlê bide Dewrêşê Evdî. Dema Dewrêşê Evdî vê xeberê dibihîze, ji alî Sirûcê radibe, diçe nav eşîra Milan û li bin konê Paşayê Milan fîncana serbixwîn radike. Ev tê vê maneyê ku soza li hember eşîrên dijmin derkeve û bi evîna dergista xwe digihê.

Wê demê jî Zor Temir Paşa ji Evdoyê Şerqî, ji bo li hemberî alîgirên eşîrên Osmaniyan şer bike alîkariyê dixwaze.

Zor Temir Paşa ji Dewrêş re nameyê dişîne, name li civata Êzîdîxana tê xwendin, bes Evdoyê Şerqî qebûl nake û ji Dewrêş re weha dibêje; “Tu ji bo keçekê dikevî cengê” Di vir de diyalogên balkêş di navbera Dewrêş û bavî wî de dertên.

Destebirakê Dewrêş jî tev bi qîmet in. Dewrêş dikeve rê û ‘Edûl tê pêşiya wî û daxwaza ku nekeve şer, wî hişyar dike. Lê Dewrêşê Evdî dibêje; “Ez heta te heq nekim, ez te nagirim.” Destgirtiya Çîlo Îzolî jî tê pêşiya Dewrêş, da ku ji bo ew beşdarî şer nebe, gilî û gazincên xwe dike. Destgirtiya wî, bi çûyîna Dewrêş re ‘Çembera Xaricî’ li dora xwe xêz dike û dibêje; “Ger tu herî cengê û bi te re destgirtiyê min were, ez ji vê xaricîyê dernayêm.”

Niha Zor Temir Paşa texmîn dike ku ewê Dewrêş were û fîncana zêrîn bigire û pê re jî hemû eşîr li pey Dewrêş bikevin. Di encamê de wisa jî dibe. Dewrêş jî wê demê biryara tenê şerkirinê digire bes ji pêşengên eşîran 12 kes heta dawiyê pê re

dimînin. Tê gotin ku Dewrêşê Evdî şeş egîdên misliman û şeş egîdên Êzîdî hildibijêre. Temir Paşa jî ev biryara Dewrêşê Evdî qebûl dike. Ev lehengi-ne her yek ji wan bi dil û can bi Dewrêş ve girêdayî ne û her yek ji wan tevî eşîra xwe, evînên xwe bi awayekî sêcarabûnê tên hûnandin. Eşîra Gêsan, eşîreke Eraban e û nakokiyên wan bi Milan re hene. Ji eşîrê Eferê Gêsi destbirakê Dewrêş e û mêrxasekî bi nav û deng e. Berî ku şer bikin Efer li Girê Qirmîtê bi Dewrêş re şorê dike, naxwaze bi Dewrêş re şer bike û dibêje; “Ev şerê me û Milan e” Dewrêş dibêje ev şer ji bo Edûlê ye û min fîncana zêrîn girtiye. Di çîrokê de, xwîşka Efer, birayê Efer jî bi awayekî diyalektîkê tên hûnandin.

Şer li girê Qermîtê û nêzîkê gundê girê Etşanê dest pê dike. Ev der li erdê Berriyê li alî Serêkanî ye. Dewrêş û danzdeh egîdên hevalên wî dikevin şer. Hevalên Dewrêş yek bi yek dimirin. Di vir de Sadûn û birîndarbûna wî divê li ser bisekinin. Sadûn birîndar dibe û wî dişînin da ku xeberê bide eşîra Êzîdxanan û Edûlê. Li gorî hinek kilaman Sadûn li wir dimire; lê, Sadûn jî şerê Qermîtê xelas dibe. Bi tenê hespê bi navê Hedbanê xebera kuştina egîdan dibe ebra Milan. Eyûp Kiran di romana xwe de xeberdayina îmdadê bi hespê Dewrêş tîne ziman.

Roman li ser kilama destançîroka Dewrêşê Evdî ye. Egîdî û mêrxwasî, evîn û dildarî, heval û hogirî, desthilatî û serwerî, ol û bawerî, pevçûn û lêdan, beg û axatî, kes û bêkesî, destan û destançîrokî bi awakî lezîz ji

DEWRÊŞÊ EVDÎ KULÎLKA BILBIZÊK Û RIM

EYÛP KIRAN



Nûbihar

Hişmendiya bi destançîrok û romana “Dewrêşê Evdî” bi serê xwe serhildaneke mêjî ye. Divê her rewşenbîrê Kurd vê romanê bixwîne û di ber çavan re derbas bike.

alî dengbêj, stranbêj, delal, kilambêj Baqî Xido ve hatiye hûnandin. Kesê li vê destançîroka Dewrêşê Evdî guhdarî bike her babetên jîyanê dibîne û bi awakî zindî hîs dike.

Dewrêşê Evdî ji bo” Tu li hember hevalan dibêy seba xatirê guliyê mor min do bekê raki-riye fîncana serbixwîn ser sîn û tebaxa zêran.”

“Tu dibê seba xatirê gulî yê mor qîza Paşayê Milan, vegera min tenê mal û xwedîyan e.”


“Navê me li alem û dinyayê belav bûyî; go; kurê Evdo yî Şerqê rakir fîncana serbixwîn ser û sîn û tebaxa zêran.

Seba xatirê qîza Paşê Milan bi danzdeh siwaran dakete erdê Berriyê Şergê Biguman.”

Di destançîroka Dewrêşê Evdî de bi qasî danzdeh egîdan tîne binavkirin û li ser danzdeh egîdan bi seetan bi rojan tîne strandin. Taliyê jî “Edûl li ser egîdê nemir Dewrêşê Evdî distrê û evîn û eşqa xwe bi awakî şîmî tîne zi-

man. Ev mêrxwaziya, ev tolhildana Dewrêşê Evdî bi evîneke xemsarî, dilşikestî û bi eşqeke bicînebûyî bi sewta dengbêj û delalan, bi sedsalan tîne lorîn û tîne ziman. Ev evîna bêhempa bi wêjeya (edebiyata) Kurdî û bi romana Kurdî bi destê romannivîs Eyûp Kiran hatiye ber hemêza gelê Kurd. Divê em ji bo eşq û evîna Dewrêşê Evdî û ji bo netew û çanda Kurdan li kilamên destançîroka “Dewrêşê Evdî” derkevin û bila herkes romana Eyûp Kiran bixwîne.

Hişmendiya bi destançîrok û romana “Dewrêşê Evdî” bi serê xwe serhildaneke mêjî ye. Divê her rewşenbîrê Kurd vê romanê bixwîne û di ber çavan re derbas bike. Şiurbûna netewan bi destançîrokan jî vedije. Ez hêvîdar im di demeke nêzîk de li ser vê destanê şano û belgefilm jî çêbibin. Lê divê ev romana Dewrêşê Evdî herkes bixwîne û bi zarokên xwe bide naskirin ●



Di civata Kurdan de rewşa jinan: Zêna

DR. ÖMER ULUÇAY

Jin jiyane, ew dê, xwişk, yar, heval, cîran û berî her tiştî wek mêrekînsan e. Rebbê alemênsan wek hev afirandiye. Di navbera wan de reng, bejn, ziman, beden, gîranî cuda ye. Di vê de hikmetek heye. Ew gotina Kitêba Pîroz e. Lê mixabin rewşa cîhanê di destê mêran de ye. Wana jî jin wek malê xwe dîtine, kirine bin bandora xwe. Mafên ku tên bikaranîn wek bexşîşa mêran e. Ew pîrsek kevn, dîrokî, gewre, giring, her derî ye. Di huqûqa dewletan de, di orf û edetên civakan de, li gorî deveran mafê jinan cuda ne. Di cîhana jinan de, cîhana civaka kuran de roj hilnatiye, cîhan tarî ye. Vê dema nû ev pîrs hatiye rojevê û têkoşîna jinan bi wate dibe, her ku diçe bi hêz û bez dibe.

Di zarokî û ciwaniya mêran de halê jinan dilê peyan tim êşandiye. Mixabin ku derfet peyda bûye, bav û apên xwe zareve kirine, zilm û zexm domandine. Her însan di mala xwe de şahidê van bûyeran in. Raman û bawerîya meşa jiyane ew e ku mêr bixwaze jin çawa kane bibêje "na". Yan jî zexm, zilm hetta mirinê li rê ye. Ji Omer Xeyyam re gotine: "Aha, ew jin layiqa te

ye." Mirovê kamil li hevalan ve gerandiye: "Lê eceb ez jî layiqê wê me?" Kanî însan û dewrana ku gotina vî rindî fam bike û bi kar bîne!? Ev mijar dilê me gîştan diêşîne, lê çi fayde!

Pîrsa jinan ya dîrokî û cîhanî mirov dikane weha debaş bike: 1-Jin û civat 2-Jin û mal/malbat 3-Jin û zewac 4- Jin, kur, bûk 5- Jin û xebat 6- Jin û perwerdeyî 7- Jin û huqûq 8- Jin û jiyana nûjen 9- Jin û bazar 10- Jin, ol, orf û edet 11-Jin, sazî, siyaset 12-Jin û jiyana nûjen 13- Jin û çandinî, jiyana beyar. Mirov dikare van beşan hîn jî zêde bike.

Em komek mêvan û xwendevan, li oda rêberê Weşanxana Nûbiharê birêz Suleyman Çevik li Stenbolê geheştibûn hevûdin. Mijar diketin seyranê, her yekê li gorî xwe pîrs davêtin meydanê. Wek her car mijar belengaziya jinan e. Weşanger Suleyman Çevik, kitêbek ji refan derxist û diyarî min kir, got: "Keko, vê bixwîne, mijar ew e, ji me re şîrove bike". Min spasdariya xwe kir û pirtûk hilgirt. Demek di ser de derbas bû, nebû qismet ku ez bixwînim. Ev demeke ku ez romanên Kurdî dixwînim û dinirxînim. Di nav de

Ev demeke ku ez romanên Kurdî dixwînim û dinirxînim. Di nav de min "Zêna" jî xwend, çend caran berçav kir...

min “Zêna” jî xwend, çend caran berçav kir.

Min telefonî Suleyman Çevîk kir: Em li ser berhemê û bûyerê axivîn, Çevîk tiştên balkêş gotin: “Ew mijar tevahî rast e, nav gund, bûyer rast in. Ca nivîskar jî birayê Zênayê ye. Ew bixaltiyê Rahmetullah Karakaya ne jî.”

Ev agahiya tiştêkî balkêş bû. Nivîskar, serpêhatiya mala bavê xwe û ya xwişka xwe, bi dest û rastiyan êş-kulên dilê xwe anîne ser ziman û kiriye berhem.

Min li bixaltiyê nivîskar, hevalê min birêz nivîskar rojnamerger Rahmetullah Karakaya re telefon kir. Heval, gotinên Suleyman Çevîk pejirandin. Me xatir xwest û telefon girt.

Li dû van agahiyên, ez ji asta xwendevan derketim û ketim zikê kitêbê, nav bûyer û birînan. Jiyana jinê, ya bi êş û elem.

Şair, nivîskar **Mezher Bozan** bi navê Zêna romanek weşandiye (Stenbol, Nûbihar, 2009, 128 rûpel). Zimanê romanê zelal e, sivik e, hêsan tê xwendin. Bûyer li ser bûyerê diqewime. Ristina romanê bi rêk û pêk e. Hevok kin in. Nivîskar ku çî gotiye xwendekar tê digihêje, ku çî nimandiye wê dibîne. Zêde tehlîl û teswir tê de nîn in. Bi carê de tê xwendin.

Kes: Zêna lehenga romanê ye. Li pey wê Beşo tê. Kesên din dibin alîkar. Dê û bavê Zêna, birayên wê. Pîra Hefse jinek bi bext û hezkar e. Hêsina, keça har. Brahîm, ji zaroktiyê ve evîndarê Zênayê ye, soza Zênayê dabûnê. Nemê evîndarê Zênayê yê bêhêvî ye.

Şair, nivîskar Mezher Bozan bi navê Zêna romanek weşandiye. Zimanê romanê zelal e, sivik e, hêsan tê xwendin. Bûyer li ser bûyerê diqewime. Ristina romanê bi rêk û pêk e. Hevok kin in...

Beşo, xwedî dukan e, zewiciye bavê çar zarokan e. Çav berdi-de Zênayê. Bi lece tê kêrkirin, li neweşxaneyê tê dermankirin. Dibêje ku “ez bixwazim çawa nebe?” Sebro, posteyê Beşo ye, nameyan ji Zênayê re tîne. Bavê Beşo xeberê dide bavê Zênayê, “zû, lez ke, keça xwe ji vir bibe û here. Kurê min ê bêbext Beşo, dike keça te birevîne”. Maqûlên deverê, cenderme, polîs, gundî, walî, dadger.

Mekan: Bûyer li devera Mêrdînê diqewime. Mekanên duyemîn di wê deverê de ne: Gundekî berriya Mêrdînê, gundê Zonê, Qoser (Kiziltepe), gundê Hewagê (bi ser Bozova/Ruha), Melezzgirt, Çiyayê Tendûrekê, Mêrdîn, gundê Zinar û Beniştê, Belediyeya Mêrdînê.

Bûyer: Her tişt li ser serê Zênayê diqewime. Ew keçikek biçûk, hişyar, xwedî dilekî bi rehm e. Temîz e, çav hilkiyê, hîni Tirkî û xwendinê dibe. Dê kurran tîne Zêna li wan dinêre, wan dangî dike, ji bilî mijandinê her tiştî ew dike. Zêna û dayika xwe dibin hevalê hevûdin. Nava malê bêdeng e. Bav melayekî fexrî (dilxwaz) ye, bi zekatê ji gund re xizmetên dîni bi cih tîne. Hoce gênc e, lê xwedî ilm e. Dewr ve-

diguhere, dewlet dest dide ser mizgeftan, xizmeta olî resmî dibe. Bavê Zêna jî bû melayê dewletê, malê dibe Hewagê. Di serpêhatiyên Zênayê de jiyana jinan tê ber çavan, ser kaxizê. Pîrsa herî mezin ev e.

Pîra Hefse jineke bi umr û rehmet e, ji dê bêtir zana ye, por û guliyên Zênayê şe dike, dihûne. Pir naajo dinya xwe diguhere.

Di berhemê de gelek tiştên folklorîk tîne nasandin: Sergîn, tepik, kuşkûr, qoq şewitandinên berriyê ne. Rêxa dewar ku li çolê top dikin ew kuşur e. Dewar ku li mal be, rêxê kom dikin, dikin wek herrî, girêkan li ser sivingan dixin ku hişk bibe. An jî wek kozikê çêdikin, yên nû li ser yên hişkbûyî dixin, ew jî li ber rojê hişk dibin.

Rêxa li axur ku nabe tepik, nêzikî malê davên serhev dibe ‘zilgo’. Zivistanê kurik li ser zilgo dileyizin, berf li ser namîne, ji germê re dihêle. Dema ku roj baş bû, jin kurik xwe hazir dikin. Kasnaxên bêjîngan li ciyekî dûz datînin, zibilê ku bi avê bû wek herrî dixin zik qasnax ser silê dikin. Rêxa di qasnax de hevdin digre, tevî qasnaxê dibin cihê rêxistinê bo hişkbûnê. Ew sergîn in. Li gorî deveran navên vana cuda dibin, lê binyad bi vî babetî ye.

Bêrî, taybetiyek e, karê jinan e, Qefle bi qefle hevalên hevsal kom dibin û tev derin bêriya xwe. Bi keyf û henek e, xwedî gotin, stran û dîlan e.

Bênder gerandin bi cercerê (qelmê) dibe. Di binê wî textê berfireh ku bi ga û hespan tê kişandin, bi kevîrên çemaq an jî

bi kêrên devtûj û biçûk dox tê birrîn. Zêna hesretê ji xwe re nahêle cercerê jî digerîne. Xwarin û vexwarin, kinc li deştê û çiya ferq dike.

“Gundî û malbata bavê Zênayê hêdî hêdî hînî hev dibûn û hatinên jinên gundiyan jî dest pê kiribû. Ji diya Zêna û zarokan plr hez dikirin. Jinan kofî didane serê xwe. Ev yek li ba jinên beriyê tune bû. Cilên wan jî piçek cuda bûn. Yên xwedî îmkân zêr jî didan ber eniya xwe. Zêrek mezin ku jê re digotin xazî dî ortê de bû û li bin wê rêzek ji zêrên hûrik hebûn. Li berriyê piçek cuda bû ev yek. Li ser xazî jî rêzek zêrik hebûn. Wekî din li berriyê hûçik jî hebûn. Hûçikên dirêj yên ku li paş xwe girêdidan... Wekî din hema hema mînanî hev bûn jinên Kurdan li herdu ciyan jî. Mêran jî piçek Dada li xwe dikirin. Li beriyê fistanên hetanî erdê hebûn. Di bin van de derpiyên spî û dirêj hebûn. Li ser kirasî şemî û eşal hebûn. Lê li çiyê ne weha bû. Şerwel hebûn. Li ser wan kirasên hetanî çogê hebûn. Gundiyan şewqe didane serên qumaş li her derê li gorî îmkân û derfetên kesan bûn. Yên buha jî, yê erzan jî hebûn. Her kes li gor qeweta xwe bû.”

“Tiştêkî din jî hebû li vî gundî. Zarokên xwe li gorî yê berriyê zûtir dizewicandin. Keçên xwe hê ew duwanzdeh sênzdeh salî bûn didane mêr. Bi hindikayî sê sal dî navbera wan û yê berriyê de hebûn. Zarokan ji ser listikan radikirin û dikirin bûk. Adetek nebaş bû. Lê weha bû. Dawetên wan jî piçek cudatir bûn. Herdu ciyan jî dawetên xwe carinan bi defan çêdikirin. Dema ku li berriyê def û zime

hebaya, xwediyê dawetê ji bin mesrefê nikanîbûn xwe tev bidin.” (r.53)

Her aliyekî li gorî şert û mercan başiya xwe hebû. Keçika xwediyê gund, gelek çetîn bû, digotin har bûye. Ew Hesina bû, bi Zênayê re lec dikir. Malbat li ber keçikê aciz bû û reviya. Lê birayê wê Brahîm tehrekî xwezayî bi Zênayê eleqedar dibû, hezkirinek peyda bûbû.

Gundê Zonê nayê jibîrkirin. Gencekî ji Zênayê hez kir, di xew de ew hembêz kir û reviya derî gund. Pismamê wî çavdêrî li wî dikir, dît, nekanî bibe asteng. Xeber da bavê xwe, bav revî gehiştê û Zênaya dî xew de anî li mala xwe nav zarokên xwe de razand. Wê şevê xortê ku Zêna revandî di hewşa mizgeftê de bi tivingê xwe kuşt. Ew gund bûbû du beş. Dijî hev bûn. Dewletê ew halê wan bi kar tanî.

Mela, mal bir Qoserê, xaniyek li vir çêdikir. Ji Zonê hatin Qoserê. Mela teqîba ewraqên melatiya resmî dişopand. Mal birin Hewagê. Zêna gelek tiştan li vir hîn bû. Li vir çûn serdana mala kalikê xwe li Melezzgirtê ber çiyayê Tendûrekê. Ew der çiya bû. Jiyana vê derê, xanî ne wek berriyê bûn. Qulleteyn, xaniyên binerd, xwarina helise û gîzik ji bira Zênayê neçûn.

Mela, di navbera Qoser û Mêrdînê de çû-hat nebû, mal bir Mêrdînê. Zêde neçû xortê cîran çav/dil berda Zênayê. Nebû ji vî xanî derketin çûn Qoserê. Aşiqê bêhêvî Nemê, dît Zêna nabe ya wî, girt ji Beşo re îxbar kir. Beşo xaniyê kêleka xwe vala kir û da bavê Zênayê. Demek neçû Beşo çav berda Zênayê. Cîranê

xwe Sebo, nameya Beşo anî da Zênayê. Bi malbat biryar girtin, gotin “na”. Beşo tedvîr girt Zêna ji dest bavê girt û revand.

“Cîran tev û hemû malbata Beşoyî li ser serên wan kom bû bûn û kesî newêrîbû ku tiştêkî bike. Çekên Beşo û peyên wî hebûn. Malbata Beşoyî jî hifza xwe ji Beşo dikir. Kesî ji wan alîkarî nekir. Weke ku dilê wan ji Beşo re dixwest. Zênayê berê xwe da derencekan. Lê Beşoyî bi destekî xwe hişk bi perdîsonê Zêna girt û ew bi ser bavê de avêt erdê. Qîje qîja Zênayê bû. Lê kesî alîkarî nekir. Niyeta Zênayê ew bû ku xwe rizgar bike û hilkişe jor û xwe ji wir bavêje. Zênayê xwe vî alî-wî alî gjigijand û ji nava lepên Beşo rizgar bû. Bavê hişk bi sînga Beşo girtibû û ji Zênayê re got:

-Bîreve qîza min.” (r.146).

Çûn gundê Zinarê, melayek dîtin mahra wan birrî. Teqîbata cendirman li ser bû. Çûn gundê Bernîştê. Gundî bi jinrevandinê razî nebûn, giliyê Beşo kirin, ew hat girtin, hat berdadkirin. Hevhatinek deverî/Kurdî çêbû. Zênayê got, “ev qeder e, bira kes nemire.”

Evîndarên bêçare Brahîmî û Zênayê, li ber dadgehê hev dîtin, çav di çavan de serê xwe tewandin:

“Zênayê bêtirs hemû bûyer ji serî hetanî binî da û tiştêk ve neşart. Carekê serê xwe rakir û dît ku xortekî zerî hate ber deriyê qereqolê. Xortî çavên xwe yê tijîhêsir xiste nava çavên wê. Zênayê ew nas kir: Brahîmî bû. Bûbû ta û derzî. Te pif bikirayê, dê li ber pifê biçûya. Ew çend zeif bûbû. Ew çend ji hal ketibû. Bi qasî du-sê kêfikan

li hev nihêrîn. Çavên Zênayê sor bûn. Hemû meriv li wir bûn. Herduyan jî serên xwe tewandin. Brahîmî ew seriyê tewandî di ber de, ji wir bi gavên biçûk çû û ji ber çavên Zênayê wenda bû. Ew hevdu dîtina dawî bû.” (r.167).

Zênayê hemû tişt bi hûrgilî ji dadmend re got. Lê gotina dawiyê bo Beşo got “erê”. Bi çavên şil deftera mahrê îmze kir. Zêna anîn Qoserê, hazirtiya bûkaniyê kirin. Berdela mala Beşo keçik jî li mala wan bû.

“-Em weha difikirin: De xaniyekî bidine we û derhal li ser navê Zênayê çêbikin. Wekî din jî çî mesrefa we çêbûbe, dê ew jî telafî bibe. Hûn hez dikin, dê qelen jî bidine we... Çawa ye?

-Baş e, got mamê Zênayê û berdewam kir:

-Ew tiştên di serî de temamin. Yanî xanî û mesrefa me... Lê em qelen melenan naxwazin. Di berdêvlê de dê hûn jî keçeke xwe bê qelen û bê tişteke bidine xortekî me...” (r.171).

Li gorî erf û edetê, heyeta navberan a kamilan ew biryar girtin. Lewra dema Beşo were berdan dawê dê hel bibe. Sê rojan şûnda texsiyek hat Qoserê, Zêna siwar kirin. Ew birin Merdînê. Beşo, cîranê ew revandî, bûbû mêrê wê.

Tê dîtina ku Zêna yeka masûm e, lê dîsa jî ji bela û musîbetan nafilite. Hebûn, bedewbûna, şîrîn zîmanî, xwedî huner û maharetbûn talûkê zêdetir dike. Ma ew jî qedere? Ew rewşa nebaş, bê dil dê ranebe? Mal û malbat, cîvat dê rizaya keçan jî nepirse, biryara wan dê çî wext bi cih bîne? Em guhdar in, bi hêvî ne●

Cejn û xeyal

Dilşad Mutî

Va îro li alemê cejn e
Herkes dilşad û dûrî hezn e
Çi edalet e, yan jî wezn e?
Di dil de me her ceng û xeyd e

Ceng û hewara me ya di dil
Pêçaye lê perdeyek ji kill
Ne tê gotinê ne jî tê mil
Li Reqîb û Etîdê'm qeyd e

Ji ben û qeydên wê dilberê
Şahehorî û lêvşekerê
Zingarî hilgirte cegerê
Dil me jê re nêçîr û seyd e

Seyyada bi xef, li xeyalê
Li gerdûna şik û sûalê
Li bendê me ji “Bel û Qalê”
Li baxê wê hiş li me şeyd e

Gewde berdan hiş û sewdanî
Melkemot l'cem me bi serdanî
Her hekîmê hat nederanî
Elac û derman, me ne peyd e

Derman, bin hîlala kill bike
Pirsa halî bê ji dil bike
Bila ser ji gewdê hîl bike
Bi wê xweş in em, ew jî feyd e

Feyd e, rimbazê niyet hebe
Bi şûr û rim û hem rextê be
Welew armancî dilê me be
Ew cejn e hingî, li me eyd e

29.07.2005, Freiburg

Bîr û boçûnek çend-alî li ser romana Kurdî

OMER DILSOZ

Di çend pirsan de, me nêrînên xwe li ser romana Kurdî berhev kirin, niha bêyî ku pirsê destnîşan bikim, dixwazim van nêrînan bi we re parve bikim.

Pirsa li ser “qonaxên romana Kurdî” bersivê her di nav pirsê de vedigire. Her qonax, bi serê xwe bi tecrûbe û serhatiya salan, xwedan serborî û ceribandînan kûr û dirêj e. Her qonax, di heman demê de, bi dawîhatin an jî bi sentez, hin gavan jî, wekî antîteza rewta pêşiya xwe hatîye pê. Ango, her qonax di agirê xwe de keliyaye, dûre di xwelîya xwe de xewiniye û piştî jî gihîştîye û xwe daye der.

Helbet, em, wek tecrûbe û ezmûn, di vê gerdûna nivisandinê de, di hemû qonax û pêpelingên vê pramît û derenca wêjeyê, yanî, di vê meydana hiş û jêrhişa kulturî-çandî ya nivîskî de, gelek û gelek dereng mane.

Meydana edebiyata me xirt û xalî maye ji nivîsê, di kîsê me de çî berhev bûye, hema bêje ew du-sê dilopên devkî ên zargotinî ne. Helbet, di ber vê bagera guherîn, pêlavêtin û rewtedana jiyana medeniyet û şaristanîyê de, ji dûr ve dûr ve be jî, “ede-

biyata me ya devkî” bi tîna wan “izman” hesiyaye û di pêvajoyê û heyamên kemilîna binhişîna neteweyî û giştî de, ez dibêjim qey binaxê dagirtîye lê pirs ew e ku çu rêzedîwar li ser vê binaxê nehatine danîn/ nijinandin/ nîmandin.

Ez, gel hindê me ku di van meseleyên weha de, li şûna ku mirov tûkê birînê hilxepêre û wê bixurîne, çêtir e, ku mirov guhê xwe bide gotina pêşyan a ku dibêje, “Tiştê çû nede dû”. Ango, heke îro, me, ji ber bêşansiya tarîxa xwe, nikaribe ji xwe re edebiyateke nivîskî ya xwedan kevneşopîya bi sedan salan bi dest bixin (ku tunebe) gelo, ma qey em rabin benzînê bi serê xwe dakin û ji qehra xwe bişewitînin. Ma hema em rabin, vê valahiya ku encama bi sedan salan e, û di vir de, çu guneha me nifşê nû nîne, ma qey em, hemû hêviyên xwe binax bikin û ji ber ku tune(bû)ye, qey xwe jî tune bikin?!

Li gorî min, pirsê me ya sereke ev e. Helbet, emê zû bi zû nikaribin bi xelkê re qayîşa edebiyatê bikêşin û rabin “berhemên” xwe, bi yê wan re, li gorî giraniya wan,

**Roman, bi ronahîdîtina
xwe pêş dikeve.
Bifikire, tu di binê
çaleke kûr de yî û
hemû derî li ser te
girtine, xwarina te
hinde bi qasî ku tu pê
nemirî, ma tu yê çawa
bi pêş bikevî, helbet
pêş nakevî...**

biwezînin. Ev, ji binî de, xwetu-
nekirin e, xwepûçkirin e, û a herî
kambax jî, xwe avêtina nav lepên
bêhêviyeke bêdawîn e.

Ji bo wê ye, ez dibêjim; hu-
ner, edebiyat, an jî hêza peyvê,
şiyana gotinê ji wê derê dest pê
dike, gava tu ji (tu) nehiyê bibinî
heyiyê...

Pirs, ew e ku çu zeman, ji bo
çu tiştî dereng nîn e, hindî ku di
wê cuhê de, av-jîyan biherike...

Belkî, emê nikaribin, dîrokê
biqulipînin û hemû qonaxan bi
hemda xwe bijîn û tê de tovê
edebiyata xwe li zeviya hişê
milletê xwe bireşînin, erê, jixwe
ev ne mimkûn e jî, lê em dikarin
tiştêkî bikin... sibe, bo sibê û îro,
îroya xwe, li cihê ku edebiyata
cîhanê gihîştîyê, ji xwe re çalekê,
derzekê, kulekekê vekin û tê re
biçin ber bi asoyên ronak ve...

Ango, di nav van çend dez
avantajên mezin de, a rastîn
em hinekî jî bi avantaj in, ku ew
jî, îro, em li ser behr û deryaya
nekeşkirî ya nivîsê ne... xelkê,
zeviya xwe çandîye û berê xwe jî
hilaniye lê zeviya me beyar e, em
dikarin, tovekî wisa lê bireşînin
ku li ser (tu)nebûnê, bibin xwe-
dan hebûneke bêhempa...

Ango, mesela me bikaranîna
potansiyelê ye, ji bo vê jî divê
berî her tiştî em bi wê bihesin...

Ez dibêjim qey ev mijara
cureyên romanê, ji min pirtir a
mamosteyên edebiyatê ye. Ez,
çu pîvanan destnîşan nakim, ji
ber ku, pîvana ku ezê li ber dilê
xwe bikin pîvana “serkeftinê”
tenê dê encama qenaeta min
a di vî warî de be. An jî, divê ez
vegenim nav teknîka vî karî, ji şa-
reza û pisporên edebiyatê yên
cîhanê, çend gotin û ‘pîvanan’



neqil bikim, bi ya min, ev şêwe
nêzîktêdayîna ku nivîskar, gelek
caran bi palpiştan ve dadikeve
meydana gotarê, meydana axaf-
tin û analizê, nêzîktêdayîneke
gelekî bixwebawer, jixwepişt-
rast û xweser nîn e. Ev şêwe
nêzîktêdayîn, pirtir karê akade-
misyenan e, pisporên edebiyatê,
jixwe pîvanên hema bêje “gîştî”
destnîşan kirine.

Lê, ku pirs weha be, “gelo
kêfa min, qinyata min bi romane-
ke çawa tê?” wê demê, ez dika-
rim, ji we re, behsa hin tiştên ku
ji romanekê, tekstekê, çirokekê,
fîlmekê, şanoyekê, fotografekê,
dîmeneke zindî, kêfê dide min û
di hiş û dilê min de, velerzînên
heyecanê tîne pê, darêjim.

Heke di vê xelkê de, em
romanê bidin bertava nimûneyê;
ezê xwe li “kelecanê” bigirim.
Ango, mesele, kelecanpêketin
e, ma heke, berhem, wekî por-
teqaleke av jê dotî, sar û bêtehm

be, heke zimanê wê wekî guve-
guva kermêşan li hişê min bili-
kume, heke karakterên wê, li
ber çavên min zindî nebin û ez
lê negirim li kolanan, heke ez
nebin xemxurê dûvkêşa wê û tê
de wekî surfkerekî ber bi şepol û
pêlên wê wer nebin; heke, tişt
û tiştine ji min, ji bo min, nasê
min, tê de tune bin û dinyayek
tê de –çi binasim çi nenasim- bi
ber çavên min zindî û bi giyan
nekeve, wê demê, ev roman, ne
dibe mêvanê ramanên min ne jî
xweşî û tehm, kelecan û aqilekî,
hêviyekê, ji tecrûbeyan dersekê
dide min...

Wê demê, ezê wê nexwî-
nim... Ew, bi kîjan ziman û bi
kîjan “etîketê” be jî, qet û qet
ferq nake... Ji bo wê jî, berhe-
meke edebî, belkî di serî de, ji
bo “navekî naskirî” têtê kirin, lê
piştî ji bo “naverokeke petî”
têtê xwendin, naskirin û a herî
gîrîng jî HEZKIRIN.

Jixwe heke te hezkirin ji navê rakir, çu tişt tê de namîne... Ez ji “divê”yan hez nakim, lê heke îla ji pêwîst be divêyekê bêjim; bo romanê, berî her tiştî divê Roman bi her awayê xwe bi HEZkirinê bête hevîrkin. Bi zimanê xwe, bi karakterên xwe, bi narîni û spehîtiya xwe, bi nazikî û hûrgiliyên xwe û bi HEZkiriyên xwe...

Roman çawa paşve ma, ez dikarim bi vê pirsê bersiva we bîdim. An jî, “romanek çima paşve dimîne?” Ez, dibêjim qey, gava em behsa romana milletekî dikin û wê radixin ser berika analîzê û didin ber kêr û neşteran, em, zikê tarîxa wî zimanî, wî milletî jî diqelêşin û pirsgirêkê di perspektîfeke gelekî berfirehtir û bi topyekûnî werdigirin nav lepên xwe... nexwe, emê tê de bîmîn û dê li şûna nîrxandin û têgihîştina bi rastiya meseleyê, serûguhên hev bixwin û ji hev re bêjin, difna te xwar e.

Roman, bi ronahîdîna xwe pêş dikeve. Bifikire, tu di binê çaleke kûr de yî û hemû derî li ser te girtine, xwarina te hinde bi qasî ku tu pê nemirî, ma tu yê çawa bi pêş bikevî, helbet pêş nakevî... Ji bo wê, divê zimanê Kurdî, ji çalên man-nemanê derkeve, dî qatên perwerdehiyê ên bilind de bike-mîle û bi bejn û bal bibe, bi dû re, romana me jî, ramana me jî, kultura me jî, dê “riya xwe” bibîne. Gelo ev rê, dê çend pahn û fireh be, ez bawer nakim bibe TEMA Kurdî lê dîsa jî dê her cure bar-hilgir, mirovhilgir û ramanhilgir bikarin tê re bimeşin...

Ango, romanek ji bo ku bi pêş bikeve, divê bi ser bikeve û bibe xwedan rû û siyanet, hela

Li gorî min, romana ku em wek “romana Kurdî” dikarin behsa wê bikin, ji vir de, ji vê kaosa civakî mimkûn e, wekî volkanekê bi ser cîhana edebiyatê de biteqe. Bihêlin, bila biteqe...

ji aliyê çend xwendevanan ve bête xwendin, nîrxandin, rexnekirin (em Kurd rexneyê carina wek rîxne têdigihin mixabin) piştê dê jixwe riya xwe bibîne, em hewl bidin rawestînin jî ew guhê xwe nade tu (çu) kesî.

Ji bo wê jî, ez wisa bawer dikim, bi reşbînî û xwexuriyê, çu tişt bi pêş nakeve. Tiştêk li ber me heye, zimanek, em di asoyên wî zimanî de li xewnên ronahî digerin. Ew, amûrê me yê derbirînê ye, em pê, tevn û tejbê ramanên xwe dijenin û hêvî û xweziyên xwe dihûnin. Dinyaya me di wê derê de ye. Îro, divê em nekevin xema hindê ku ev ziman, va ye ber mirinê ye û ma ez çima xwe pê biwestînim û ew piçeka mayî bî, hema di yek carî de bikujin. Naxêr, a rast, berevajiyê wê ye, ne li ber mirinê, li ber zayînê ye û tarîx, ji bo me, jî îro ve dest pê dike... tarîx, belkî di qeydên me de, tenê deng e/dengbêjî ye, lê tarîx li ba me ZINDÎ ye.

Herweha roman jî zindî ye. Belkî, wekî xeyalekê bê, lê ev ne xeyal e pêşbînî ye belkî, ez berevajî her kesî dibêjim; Kurdî û edebiyata wê, li ber teqîneke mezin e...

Li gorî min, ev nîqaşên wisa gelekî beyhûde û pûç in. Roman,

aşkere ye, çîrok jî... Lê dîsa, ji bo ku merema min bête fêmkirin, tasvîreke gelekî berbelav ez dixwazim parve bikim:

Bifikire, tu di rê de diçî, te mirovek dît; di çîrokê de, tu wî kesî dibînî, diçî balê, silavekê didî, pê re dixwî, vedixwî, tiştê bo te pêwîst jê distîni û di riya xwe de dewam dibî... Lê di romanê de, tu wî kesî, dibînî, diçî balê, pê re rûdîni, diaxivî, her liv û tevgera wî dinimînî, li wir dimînî, dikevî hişê wî, dibî tirs û fantazyên wî û ji balê naçî... aha, ferqa roman û çîrokê ev e.

Li gorî çejna wê ye. Roman, heke romaneke dîrokî be, jixwe dê ava xwe ji destanan vexwe lê heke romaneke modêrn be, dibe ku qet çu têkiliyê bi destanan re çêneke.

Bîrastî ez “miriyê” vê pirsê me. Çima? Ji ber ku em ne mecbûr in îla rewşekê ji romana xwe re peyda bikin. Em ne mecbûr in, nîrekê deynin ser stûyê romana xwe û li ber “(ga) ya xelkê” dabênin. Nexêr, bihêlin, romanê neêşînin, wek di meseleya zimên de, em wê nekin xwêya her girarê.

Romana me, bila di tu qonaxan de nebe û bila di teştê tu “izman” de nehatibe hevîrkin, gelo, ma ku wisa ye, qey em rabin xwe bikujin!? Ez têngagihim, çima em zimanê xwe, ramanên xwe, romanên xwe, hestên xwe, jiyana xwe, “xwe” û dilê xwe, HEZkirina xwe, hinde/evçend tepeser dikin, ev çend diêşînin, ev çend diguvêşin û her wekî em li bendê ne ku xelkek bê, bo me çend gotinan li ser “me” bêje, da ku em bi ya xwe bawer bin, da ku em ji xwe hez bikin, da ku em piştrast bibin ku “Em” bi ya xwe ve, HENE...

Gelo, ev çî derûniyeke hinde li ser “Ne” yê sing kutane û hinde xwe bi “qenaetên yê derveyî xwe ve” radigire.

Ma ku nava me vala, xelk hemû bibêjin tişî ye dê bibe çî, an jî berevajiya wê...

Li gorî min, romana ku em wek “romana Kurdî” dikarin behsa wê bikin, ji vir de, ji vê kaosa civakî mimkûn e, wekî volkanekê bi ser cîhana edebiyatê de biteqe. Bihêlin, bila biteqe...

Ango roman, şoreşeke zihnî ye, ji bo wê jî, ne ji qenaetên derve ve, ji qenaeta xwe ve, li bûyerê, helkeftê, demê, jiyane, hezkirinê, mirovî, jinê, şerî, mêrî, zarokan, mafan, îdeolojiyê, siyasetê, ramanê, cîhanê, xewnê, eşqê, fantazyê, hevşabûnê DINÊRE...

Helbet, ev encamên hin qinyatan in. Ma nexwe, mirov çî, çawa dibîne, wê dide der. Hema bêje ez jî di kategoriyên we diyar kirî de, dikarim texterewana romanên “çavbelek” rakim û lê danim. Lê pirs ne eve texmîna min.

Vêca qey, emê heta çend salan li benda mezinbûna wê bisekinin!... An jî, gava ew romanê bi çarlepki didin meşandin û hêdî hêdî diranên şîrî lê tînin, heta carina hinek di ber re dibêjin, “aaa wettê” jî, ka serencama kîjan psikolojiyê derdibirin? Li gorî min pirs ev e. Dibe ku nexweşiyek be, hin xwe li “tunehiyê” radigirin, hin xwe li “çarlepki” radigirin û hin jî di arafa xwe û xelkê de, ji qehra xwe dikujin.

Ez, di vî warî de, gel hindê me dest ji êşandina vê romanê berdîn. Çi be û li ku be, bila li wê derê be, bihêlin, bela xwe jê ve kin, nexwe hûnê hem xwe û hem jî wê tune bikin.

Hîrê rojê ‘emrî

Mehmed Elî Sadiq

To xo hedernawo bira
Xelas çin o bizan tîra
Ewro nêbo meşto îlla
Merg ha yeno, ‘emr vêreno

Vizêr amey ma na dinya
Ewro karê ma nêqedya
Mêşt, wa ri ma nêbo siya
Merg ha yeno, ‘emr vêreno

Belkî ti bî, belkî zî ez
Kam çî zano kam şino lez
Peyd’ manenî mal, mulk û pez
Merg ha yeno, ‘emr vêreno

19.03.2010

Ji bo pirs “tu hez ji kîjan celebê romanê dikî?” Bawer ke ew jî li ser gavê ye. Li ser psikolojiya min a wê demê ye, wê heyamê ye. Car tê, kêfa min bi romanên fantastik tê, carina jî ez xwe li romanên dîrokî digirim. Te dît, hişê mirovî, ruhê mirovî wê pêlê, tiyê çî be, ew mirovî bi xwe re dibe. Lê wekî jênegerekê, romana ku bi evîn û HEZkirinekê pehtî be, her tim, tercîha min a pêşîn e. Ji dema tê de hez dikim. Romanên dema me, serdema îro, ên herika hişin hestên min xweş dikin.

Bi ya min, roman, danezanên siyasî nînin, belkî bi serve serve xwe gelekî têkîfî civakê nakin,

çimkî, civak bi xwe tê de ye. Roman, hespê troya yê binhişê mirovî ye, keleyê jî hundir ve digire. Ji bo wê jî, roman, civakê na na, civakekê ava dike... (helbet heke ew roman raman be)

Tiştê xweş ew e ku mirov dikare bi xeyalên xwe dinyayê biguherîne. Tiştê nexweş jî ew e ku mirov bi guhertina xwe bawer neke. Helbet, xelatkirin, bo zimanekî cihê serfiraziyê ye, lê ez dibêjim derdê me yê nivîsê, ne bo xelatên nobelê ne, derdê derbirrîn û xwenasînê ye. Ez, dibêjim, Nobel bo me Kurdan, belkî xeyalek gelekî zû be. Lê mimkûn e●

Girî

Cemil Dêlî

Ne tu kes firriyaye
Ne ji jor de ketiye
Lê cejn e
 Tevî kirasê reş dakeve kuçan
 Here destên hemî kezebşewitiyan
Cejna te ye
Himbêz bike tenêhiştîyan
Hêşiran bide hev bike girî
 Bigirî

Bewartiyê neynûkên te rakirine
Û xwe bi hezkiriyê nedayî hezkirin
Sifra girî hatiye ber te
 Bigirî

Bextewariyê rêya xwe şaş kiriye
Celî bûyî carekê
Dirêjî çi dikî girî tê bi destên te ve
Cildirûnê baranê li bejna te girtiye
Xwe bixemilîne bi girî
 Bigirî

Hevdu şiyar kirine birînên te
Jîna tu di malzaroka xwe de mezin kiriyî
Li parzemîneke din
Di nava lepên penceşêrê de
Dagirker simbêlan ba didin
Êşa bira dîtiye te
 Bigirî

Aşbûn navê ji te re
 Hesreta bêhnek hewa
 Tasek ava zelal
 Mirovatiya perçê canê te
 Toqa peran kiriye histûyê xwe
 Mejiyan çolbeyar dîke ronîya lampên
 bazirganan
 Teyr digirîn
 Teba digirîn
 Bi ser erdê de ezman digirî
 Bigirî
Bewartiyê neynûkên te rakirine
Û xwe bi hezkiriyê nedayî hezkirin
Belengazî dibare ji dilqê te
 Bigirî

Cildirûnê baranê li bejna te girtiye
 Li oxira te ye girî
 Lîlît digirî
 Meyrem digirî
 Diz ketine malên wan
 Pêxember digirîn
 Niqiliskên xwe danequrtîne
 Ji roja behra sor qelişî
 Li bin dîwarê girî
 Cihû digirîn
 Bigirî

Hebû tune bû
 Dibêjin bi çend çîyan ji yê qaf bi wê de
 Qewmek û welatek hebû
 Yecûc û mecûcên çavpeqle
 Pirtûkên pîroz di dest de
 Bêhiştî lê belav dikirin
 Cendekên biçûkêd dayikan
 Tevî xewn û çirokan didan ber hev
 Sûret dikişandin li ser
Jî nalîna qesra şîrîn
Li bayîzê xanî digirî
 Bigirî

Kengî mij girtin çavên te
 Avî li ser kom bû
 Kelegirî li ser xwe nenere
 Ev çaw ji agirê azadiyê
 Cildirûnê baranê li bejna te girtiye
 Geş bike vê cejnê
 Xwe biavêje dexlê girî
 Bililîne
 Bigirî

Bêwartiyê neybûkên te rakirine
 Û xwe bi hezkiriyê nedayî hezkirin
 Pêçiyên helbestê xwîn kirine te
 Bigirî

Li tûşê çûye evîna te
 Deng tîn ji konê şînê
 Hevalê wê ketiye ber tekerê zemên
 Li kêleka rê kevokek digirî
 Hêsir xerabiyê dikujuj
 Kela xwe negire
 Ji bêbextiya mezin bi vir de
 Bi her berbangê re
 Melekê serê sibê digirî
 Bigirî

Îskeîskan xwe spartine qirrikê
 Bêhn çikiyaye li te
 Rû nede qurretî û pozbilindiyê
 Bila laşê te bilerize ji girî
 Reben û histûxwar xweziya xwe bînin
 Bêwarbûn û tenêfî bi hev re ketine ser
 milên te
 Hêsirên xwe venemale ezbigorî
 Xelata jiyane ye ev
 Bigirî

Bêwartiyê neybûkên te rakirine
 Û xwe bi hezkiriyê nedayî hezkirin
 Reşika çavên reşbelek wenda kiriye te
 Bigirî

Dil mertalên mêrxasan in
 Halanan hilde
 Bi hebûna xwe ne minêkarê çî kesî yî
 Li dinyayeke beredayî xwedîpîvan î
 Dudilîbûn ne karê te ye
 Sîpan û Stenbol li ser a xwe mane
 Berf dibare li kolanên Zuricha ronîkirî
 Sîngê bide ber pêla girî
 Biazire
 Bigirî

Heger tiştêkî derew hebe îşev
 Ew jî fedî ye
 Cildirûnê baranê li bejna te girtiye
 Li te tê girî
 Meydanê nehêle
 Biqîre bi deh dangan
 Serê xwe rake û bigirî
 Cejna te û girî ye

Zurich, Payiz 2010

W. K. Merdimîn ra şîrî

Sînayîş

Serê herr de, binê herr de,
Ha in perr de , ha o perr de
Her çî vîndî beno şîno,
Sînayîş maneno zerr de

Merdimîn-Êlûle-2010

Zexelî

Ti vanî qey ginaw' ma r' zewt
Tim barê ma zexelî kewt
Heta ma gêraye mîraz
Şarî xo ver d' patîle pewt

Merdimîn-Êlûle-2010

Manayê herfî

Wext vêreno aşm û ser de
Ayet Homay behr û ber de
Eke bi zanayîş nêwend
Vera çîman beno perde

Merdimîn-Êlûle-2010

Tênayî

Seni ke ez têna ameya na dinya
Tiya ra barkerdîşî mi zî ko têna bo
Reye derg o
Bar giran o
Taquet çin o
La, çî heyf ke
Heqbe zî veng û varit o.
Yew hete ra vêşanî û têşanî
Heto bîn ra tênayî
Lingî hey mi dima kaş benî
Gelo lingî hey mi benî?
Nexêr .

Ez vana qey mi lingî xo eştî xo şe le ez ha şîna..

Vengî mi çewî nêşîno

Ne sewtêk ne awaz

Erd wişk o, ezman durî..

Mi tênayî xo rê kerd embaz

Ez vana ya goş nana ser

Sey lorî

Bê vate û bê qal

Gama ke ez qefiliyaya

Tenayî dest pê kena

Mi rê bena hemhal

Hancî zî..

Homa nêkero

Bêhêviyî mi ra durî ya..

Heta ke yew damar leşê mi de biperro

Çimê mi de roşnêk

Fekî mi de qalêk

Mezgî mi de fikrêk

Bibo..

Mabenî xewf û recayî de

Pê Homayî

Ez go teksîr nêkirî..

Belê!

Her ganî têna yeno,

Têna şîno.

Peyniya peyên de..

Merdim û kerdênê xo,

Tik û têna manenî..

Merdimîn-Çele-2009

Di mînaktiya Prof. Dr. Şukriye Resûl de jinên Kurd

ABDULHAKIM GUNAYDIN

Ji temamê dîrokê wisa li me hatiye û ev kevneşopî di roja îro de jî wisa didome. Me tu carî qedrê zana, alim, edîb, hunermend û şarezayên xwe nezaniye û me wekî ku ew heq dikin qîmet nedaye wan. Hetanî ku ew di nava me de mane, hêjayî û qedirbilindiya wan nehatiye fêmkirin û ji hêla xelkê xwe ve rastî elaqedariyeke dilxweşker nehatine. Gîhayê hewşa ku ew lê mezin bûne carê şîrîn nebûye û tama devê wan xweş nekiriye. Nebat û pincarên şîfadar yên ku li çiya û zozanên wan şîrîn bi şaşîti be jî ew jê fêdedar nekirine. Ji kulan re jî be, bêhna şîmamokên bîstanan nehatiye ber bêvla wan, ji derman re jî be xweşiya kulilkên li baxan neketiye pêş çavê wan, bi nêta sedeqê be jî reşê gulên gulzarane neketiye reşikên çavê wan. Ew her demê bêpar, mehrûm û mehkûmê civaka xwe mane. Cihê wan ê di civaka wan de jî cihê séwîyan cudatir nebûye. Rehetiya ku ew té de ji ya gerok û parsekên civaka wan zêdetir çênebûye. Jiyana wan wekî ya


derwêşan û xwarina wan wekî ya zahidan bûye.

Kî dizane, belkî jî ev e raz û hîkmeta wan!

Ku em piştî bi vê esilê derbasî wê fesilê bibin û devê tûrikê xwe hêdî hêdî vekin emê rastî navê Prof. Dr. Şukriyê Resûl werin ku dabaşa gerandîna qelema me ya li ser van reşbelean e.

Min li bernama ku bi munasebeta 32yemîn salvegera wefata Berzanî hatibû çêkirin, Şukriye Xanim nas kir. Li bakurê Kurdistanê cara yekemîn bû ku li ser Berzaniyê nemir bernamêyek dihate çêkirin. Di vê bernamê de ji hemû partî, sazî û komeleyan şexsiyet, rewşenbîr û siyasetmedar hebûn. Di çêbûna bernamê de ked û xebata nûnerê (PDK) Partî Demokratî Kurdistan yê Enqere birêz Omer Mîranî gelekî zêde bû ya rastî. Xanima Şukriye û birêz Felakeddîn Kakeyî jî bi arîkariya wî teşrîfî bernamê kiribûn. Peyama Mesûd Berzanî ya ku ji hêla Felakeddîn Kakeyî ve ji mêvanan re hate ragihandin gelekî watedar û cihê kêfxweşiyê bû ji bo me Kurdên Bakur.

Dixwazim mijara bernamê û qalkirina wê deynîme alîkî û bêtir li ser panelfista bernamê



ya sêyem; Parlementera Kurdistanê ya berê û mamosteya Unîversîteya Selaheddîne Prof. Dr. Şukriye Resûl ku dabaşa vê nivîsa me ye bisekinim.

Şukriye Xanim di sala 1951an de li Silêmaniye hatiye dinyayê. Piştî qedandina dibistana seretayî, navîn û ya bilind ji bo xwendina Zanîngehê di 1968an de diçe Bexdadê, li wir beşa Edebiyatê dixwîne. Ji ber şibihîna paşnavê wê û Izzeddîn Mustefa Resûl, meriv dibêje qey merivantiyeke wan heye. Dema min pirsê vê yekê ji Şukriye Xanim kir, weha got: “Nexêr, xizmantiyek di nava me de tune ye. Lê dema ku min li Bexdayê beşa Edebiyatê dixwend Mamoste Izzeddîn, mamosteyê min bû. Ez li ber destê wî hîni gelek tiştan bûn û pir fêda wî gihîştê min.”

Piştî qedandina Zanîngehê di sala 1972an de ji bo kirina doktorayê diçe Moskovayê. Piştî xelaskirina doktorayê jî li Zankoya Selaheddîne dest bi dersan dîke û niha jî xebata wê ya li vî zankoyê berdewam e. Şukriye Xanim, heta niha mohra xwe li binê 22 heb kitêban xistiye. Berhemên ku wê nivisandine bi pirani li ser mijarên wekî ziman, edebiyat, folklor, siyaset, rojnamegerî, pirsgerêka jinê û hwd. ne. Nivîsên wê yên li ser mesela Kurdan û pirsgerêka jinê di rojnameya Şerqul Ewsetê de ku li Rojhilata Navîn xwedî prestîjeke mezin e, weşiyane. Ev 32 salê wê ye ku li Zankoya Selaheddîne ye. Heta niha 50 heb doktora dane. Ji xeynî karên çandî û zanistî ketiye nav karên politîk jî û 4 salan endamdiya parlamentoya Kurdistanê kiriye. Di parlamentoyê de serokatiya li-

Şukriye Xanim, heta niha mohra xwe li binê 22 heb kitêban xistiye.

Berhemên ku wê nivisandine bi pirani li ser mijarên wekî ziman, edebiyat, folklor, siyaset, rojnamegerî, pirsgerêka jinê û hwd. ne

neya perwerdehiyê meşandiye. Ev tiştên ku me rêz kirin hemû li aliyekî, heke dîrok min şaş neke yekem xanima profesor ya Kurde. Beriya wê, jineke Kurd bûbe profesor nayê bîra min bi xwe. Ji xeynî Kurdî, zimanên ku ew bi wan dizane çar in; Erebi, Farisî, Rûsî û Ingilîzî. Xelata yekem ya ku li Urdunê, ji hêla saziyeke Emerîkî ve li ser navê jinên Iraqê hatiye dayin jî bûye nesîbê Şukriye Xanim.

Wekî ku ji malbateke ilimhez û zana hatiye, niha jî jiyana xwe bi însanekî wekî wê akademîsyen û ilimhez birêz Prof. Dr. Xelîl Îsmail re didomîne.

Wekî me li jor jî behs kir, hevnasîna me ya bi Xanima Şukriye re bi munasebeta bernama Berzanî bû. Şukriye xanim di bernamê de axaftvan bû. Dixwazim ji axaftina wê ya panelê jî çend pasajan bigirim: “Dem ez ji bo bernamê hatim Amedê û li otelê bi cih bûm min li bajarê Amedê nêrî, bê îrada min ron-dik ji çavê min hatine xwarê, ev hestekî ku bi ziman nayê îfadekirin, yekemîn car li Bakurê Kurdistanê, li bajarê Amedê Berzaniyê nemir, tê bibîranîn ev tiştê gelekî xweş e...” “Berzanî tim diyalog diparast

û mirovekî aştxwaz bû. Di nav hemû hêzên ku li cîhanê şerê çekdarî dikin de yê yekemîn bû ku navê terorîzmê li pey neket û kesî ew bi terorîstî bi nav nekir. Heta di jîmanan jî jê re rêz û hurmet digirtin. Dema ku ez di sala 1972an de ji bo mastirê çûme Moskovayê rastî jineke Rûsî hatim. Wextê wê xanima Rûsî çav li cil û bergê min kir, meraq kir û hat ji min pirsî, tu kî yî u ji ku derê yî? Min got ez Kurd im û ji Kurdistanê me. Mixabin ne Kurd û ne jî Kurdistan nas kir. Lê wextê min got: Ez ji welatê Berzanî me, wê demê ez nas kirim û gelekî kêfxweşî nîşan da. Ez dixwazim vî bêjim: Navê Berzaniyê nemir û navê Kurdistanê bûne hevpar. Ne Kurdistan bê Berzanî ne jî Berzanî bê Kurdistan dibe.”

Piştî qedandina bernamê çend roj derfeta me çêbû ku ez î birêz Şukriyê Resûl tevde serdana hin komel, sazî û şexsiyetan bikin. Di wan serlêdanan de jî tim welatparezî, dilsozî û Kurdperweriya xwe derdixiste pêş û tim digot: “Divê em di nava Bakur û Başûr de yekîtiyekê ava bikin û divê em li kelepora Kurdî xwedî derkevin.”

Gotineke pêşiyar heye dibêjin: “Gelo yê pir xwende dizane, an ê pir digere?” Bê şik mirov dikare bêje ku Xanima Şukriye gelek zana ye û xwe bi pêş xistiye. Ji ber ku ew gelek geriyaye û gelek xwendiyê. Bi rastî piştî ku min Xanima Şukriye nas kir, min bawer kir ku divê rê li ber jinên Kurd were vekirin. Ji ber ku derfet hebin dê jinên Kurd karibin gelek tiştên heja bikin ●

Beq û dûpişk

Seyda Ronahî

Rojekê beqek
 Birçî bûbû gellek
 Got; nelazim kelek û gemî
 Ezê derbas bim vî çemî
 Wî alî çem hemî mêrg e
 Zikê min birçî li min dereng e
 Beqê dît ku tê xişte xişte
 Hat sekinî dûpişkek
 Silav vegerand bi tirs beqê
 Got, min xilas ke ji vê teqereqê
 Va cem me a herî kûr e
 Çavê min jî ma zûre
 Beqê got; ez rind zanim
 Di eqil de ne xizan im
 Lêbelê ji te tê tim nerindî
 Çilo bi te re bibe hevaltî
 Dûpişkê sond û top li xwe xist
 Xwe ji xirabiyê dûr xist
 Got, tu dikî bikî bi min çêyiyê
 Ez çilo bikim bi te xirabiyê
 Beqê got, de were ser piştê min
 Te derbas kim ser herdu çavê min
 Beqê dûpişk li piştê xwe kir
 Çem derbas kir mîna ku bifir
 Beqê nêzikî kir li qeraxe
 Li paşê xwe nêrî wî deraxe

Dît ku dûpişkê rakiriye dêl
 Dike bike xirapfêl
 Beqê got; qaşo dostê hev bûn em
 Hele guh bi ser min de bi kerem
 Dûpişkê got; tê xwarê beqê
 Tê warîn û reqeteqê
 Ez dikim bi te dadim
 Neh mufîrkek axû bi te da berdim
 Beqê dît ku nêta dûpişkê xirabe
 Got; çima dûpişk bi mirina min şa be
 Xwe daxist binê avê
 Got; de here xwe xilas ke li vê derê
 Em Kurd jî gellekî xapiyan
 Sêwî û hêsîr man li ber deriyan
 Bixwînin binêrin li dîrokê
 Aqil û hişê xwe kom kin carekê
 Li dostiya me çiqas bela hatine ji me ra
 Çêyî ne lazim e ji kûçkan ra
 Me ew hilgirtine piştê xwe
 Ew bi me vedidine bi kerba dilê xwe




Klasîkan ji me bixwazin!



da xelqî nebêjîtin ku Ekrad
bê me'rifet in, bi esl û bunyad
enwa'ê milel xwedankitêb in
kurmanci tenê di bê hisêb in
Ehmedê Xanî

Nûbihar

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. Büyük Reşitpaşa Cad. Yümnî İş Merkezi No: 22/29
Vezneciler-İstanbul Tel & Faks: (0 212) 519 00 09
e-mail: nubihar@gmail.com www.nubihar.com



“Çû”, lê rêç hîn li wir in

HESEN POLAT

Em dizanin ku ji bo pêşveçûyin û pêşveketina edebiyata zimanekî tenê bi wî zimanî nivîsandin têra xwe nake. Divê ku ew berhem bên xwendin, belavkirin, jê îstifadekirin, îfşakirin, carna jî bên rexnekirin.

Herçiqas peyva rexnekirin bi xwe di serî de bi mirov xweş neyê jî, di pir waran de bê rexnekirinek bi cî de serrastkirin û pêşkevtin pir zehmet e. Rast e, rexnekirineke tund û tûj dibe ku ji pir mirovan re bibe asteng û di navbera mirovan de bibe sedema kîn û nefretê. Di rexnekirinek bi seviye de kêmasiyên berhemê tîn lêvkirin, lê ji aliyê din de xurtî û başiyên berhemê jî nayên jibîrkirin. Rexnekar mîna neynikekê çêyî û neçêyiyên berhemê bi şikleki hostatî dike ku derxîne holê. Bi vî hevlêdanê nivîskar bi xwe dihesa, xwendevan jî di nav berhemên weşayî de zûtir xwe digihîne berhemên baş, ji wan îstifade dike.

Min li vir demekê pêş ve kitêba birêz Enwer Karahan, ya bi navê “Çû” xwend. Kitêb jî aliyê weşanxaneya “Doz” di îlona 2006ê de li Stenbolê ha-

tiye çapkirin. Kitêb 160 rûpel e û ji 40 nivîsar/ceribandinan pêk tê. Herçiqas nivîsarên di kitêbê de wek ceribandin bên navkirin jî, gor dîtina min zêdetir bîranîn in. Di hinek nivîsan de zêdetir nişêtên ceribandîne bên xuyakirin jî, di zêdetir nivîsan de nişêtên bîranîne derdikevin pêş. Min nivîs zêdetir mîna bîranîn dît û tam kir.

Kesên ku dest bi xwendina kitêbê dike, ku dibe bila bibe, bi xeyalên xwe diçe Kurdîstanê û wê dema xwe ya zaroktiyê. Dema zaroktiyên ku di hişê her mirovî de bi aliyên xwe yên pak û delal, di xeyalên mirov de mîna bihuştê/cennetê xemilandî cihê xwe digire.

Kek Enwer bi zimanekî xweş û edebî demên xwe yên zaroktiyê, seyr û temaşeyên xwe yên wê demê, bi kirin û bûyerên wê demê bi qelesa xwe ya dilbîrîn ji me re pêşkêş dike. Nivîskar di 9ê meha nîsana 2003ê de kolanên Stolkomê bi gavkirinê dest bi nivîsê bike jî di serî de xwendevanên xwe dibe welatê derd û kulan, welatê eşq û dilan, dema zaroktiya xwe. Bi gotîneke

Min li vir demekê pêş ve kitêba birêz Enwer Karahan, ya bi navê “Çû” xwend. Kitêb jî aliyê weşanxaneya “Doz” di îlona 2006ê de li Stenbolê hatiye çapkirin. Kitêb 160 rûpel e û ji 40 nivîsar/ceribandinan pêk tê

Bibexşîne

Osman İzol

Bibexşîne ez nezan im
Biparêze ez xizan im
Bihewîne bêdiyar im
Mîn pişta xwe sipartî Te

Penaberek bêxwedî me
Ne zane û ne xwendî me
Bi xwîn û goşt ji herî me
Mîn pişta xwe sipartî Te

Te'z çêkirim j'tinebûnê
Kirim nava vê hebûnê
Nişanek ji vê gerdûnê
Mîn pişta xwe sipartî Te

Parastinê'j te dixwazim
Her demê de tu yî lazim
Hilkeser û bi awaz im
Mîn pişta xwe sipartî Te

din, xwendevanan dibe dema zaroktiya wan; wan û dema wan a zaroktiyê careke din tîne hember hev.

Birêz Enwer Karahan mîna hinek nivîskarên Kurd qelema xwe tenê di çarçoveyek îdeolojîk de nalivîne, heyan dest tê nivîsên xwe bi hemû rengên kulîlkên Kurd û Kurdistanê dixemlîne. Bi xwe mirovekî dîndar nebe, carna araq vexwarîna xwe bilêv bike jî, dengê azana melayê gundê xwe, selaya serê sibê, bimbarekkirina êdiyan jî bi awayekî edebî di nav pelên kitêba xwe de direşîne.

Nivîsa wî ya bi semivîsa "Kaniya Xeman" ez dorpeç kirim, girtim birim bîranînên min ên zaroktiyê û gav bi gav di wan deveran, di çar aliyên gundê min re gerandim. Ne min ew deverên di nivîsê de hatibûn nivîsandin dîtibû, ne jî kek Enwer kesekî ku gundê min dîtî bû. Lê ew xem û xeyalên wî, xem û xeyalên min bûn. Ev jî nişan dide ku di nivîsên

wî de em hatine nivîsandin, ew demên me yê zaroktiyê hatine nivîsandin. Dema nivîs qediya, ez mîna kesekî ji xewneke pir xweşik û delal hişyar dibe, di navbera hestên dudilî de hatim û çûm. Min tu car nedixwest ku ew nivîs biqede.

Nivîsa bi navê "Li Xeribiyê şev melûl in" xerîbiya macîrên/penaberên li Ewrûpa tîne ziman. Wexta dibêje ku: "Şevên xeribiyê sar in. Bihar, havîn, yan jî çile be, qet ferq nake." Xwînek sar xwe berdide nav dilê mirov. Kesên xerîbî dîtine dizanin ku ew behsa çi dike. Wê demê mirov pê dihesa ku hinek tişt tenê bi salixdanê nayên famkirin, ger mirov bi xwe bije.

Dema nivîskar dinivîse ku "Min dît..." behsa bûyerên demekê dike, behsa bûyerên demek li Kurdistanê çi neman neanîn serên mirovan mîna şirîta filmekê di ber mirov re derbaz dibin.

Di nivîsa bi sernivîsa "Bêbextino!" de jan û şewata dilê wî di hevokên wî de dilop bi dilop diçilkin. Rûreşî, bêbextî, bextreşî û qeleşîya kujeran rêz dike. Bi dil û can digazîne û dibêje: "We ne dîn e û ne jî îman e; jixwe ne hedê we ye ku hûn xwedî bext û text û wijdan bin; ji ber ku hûn bi kurtîlên alemê mezin bûne, we tu carî nedîtiye şewqet û merhemet û dengê werdek selawat." (rûpel: 96)

Hinek nivîs li ser bûyeran, mîna "Helepçe"; hinek nivîs li ser mirovan, mîna "Keko"; hinek nivîs jî li ser bîranînan hatine hûnandin. Li ser çi dibe bila bibe, kelîmeyên Kurdî mîna wêneyek wênedarek hoste bi pir zimanekî xweşik hatine rêzkirin. Mirov bi teswîrên xweşik carna wer dizane ku di sînemê de filmek dokumanterî seyr û temaşe dike.

Birêz Enwer Karahan nivîsa xwe ya dawî "Siyar hatim dê peya neçim" nav kiriye. Nivîs û kitêb bi van rêzikan diqede: "Ez wê gavê radikim destê xwe yê rastê û silaveke dawiyê li we dike, bi hêviya silav û selahiyeke teze, heta bi careke dinê, ez dibêjim: Bi xatirê we!"

Ji bona piştdayîna "silav û selahiyeteke teze" divê ku em xwendevanên bi Kurdî xwendî vê silavê bê bersiv nehêlin ●

Stuttgart, 10.06.2010

Di çanda Kurdî de dawet

DILAZAD

dilazadart@gmail.com

Çend gotin

Ji ber ku dawet destpêka avakirina malbatake nû ye di hemû çandê cihanê de cihekî girîng digirin. Dawet rengê netewan e. Ji ber vê ye ku bi hezaran salan e dawetên gelê me li cihanê deng vedane. Bi listikên xwe, bi edetên xwe, bi kevneşopiyên xwe, bi stranên xwe, bi cil û bergên xwe dawetên Kurdan di çanda cihanê de cihekî rengîn ji xwe re girtiye.

Lê mixabin roj bi roj ev rengên Kurdî ji nav dawetên me radibin. Li kêm deveran dawetên ku bêhna Kurdî ji wan tê mane. Li bajarên Kurdan ti cûdatî di navbera dawetên cîran de an dawetên Ewropîyan û ê Kurdan nemane. Dawetên niha li salonên dawetan çêdibin. Bûk û zavê dixine mîna qeşmeran. Ew giraniya bûk û zavê ji rûyên wan hatiye avêtin. Ji bedela govendên me dansên biyanî ji xwe re kirine edet. Dema ku mirov ji dûr ve li dawetên Kurdên îro temaşe dike ti rengê Kurd û Kurdistanî nabîne. Ne stran stranên Kurdî ne ne cil û bergên Kurdî ne ne listikên Kurdî ne...

Di vê lêkolînê de min xwest ez dawetên bi rengê Kurdistanî bi we bidim naskirin. Min nexwest ev çanda rengîn wînda bibe. Ez dizanim tiştê hate nivîsandin nayê windakirin. Bi vê armancê min ev nivîs nivîsand. Di serî de ji bo alîkariyê ji dayîka xwe Latîfayê re dûvre jî ji xaltîka xwe Asyayê re spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Hin edetên dawetên me

Darikê Zavê: Dareke bi gelek şax û bi şekir û bi xirxirka xemilandî. Dema ku bûk gihîşte mala zavê, darikê zavê li serê banekî hildiweşandin. Ew şekir û xirxirkê ku hilweşîyan bi çoşeke mezin didan hev.

Sevîlkê Bûkê: Nava sevîlk bi şekir û bi perê hûr tijî dikirin. Dema ku bûk gihîşte mala zavê li ber piyê bûkê dişikandin. Zarokan xwe davêtin şekir û peran.

Pîşt Dêrî: Dema ku bûkê ji malbavan derdixin ji rexê nasê bûkê ve derî digrin. Ji bo ku derî vekin ji

zava diravan dixwazin. Heta zava peran nede derî lê venakin.

Sersebet: Dema ku rihalê bûkê dibin mala zavê, mirovek li ser sebeta bûkê rûdinê û ji barkêşa diravan dixwaze. Heta diravan bi dest nexin nahêlin ku sebeta bûkê ji cihê wê bê rakirin.

Şekala (Pêlav) Bûkê (ji bo ku bidin zavê): Ji bo xelatê ji zava bistînin pêlava bûkê dibin ji zavê rê. Zava jî ji bedela pêlava bûkê xelatekê dide kesê ku pêlav aniye.

Desmalka Zavê (ji bo ku bidin bûkê): Ji bo xelat ji bûkê bistînin desmalka zavê dibin ji bûkê rê. Bûk jî ji bedela desmalka zavê xelatekê dide kesê ku desmalk aniye.

Serdoşek: Xelata ku didin kesên ku doşeka bûk û zavê dirûtiye.

Kevneşopiyên dawetan

- Cirîd
- Karê Aziban
- Mewlûd
- Hinakirina destên bûk û zavê
- Li ber piyê bûkê şikandina qedehan
- Dema ku bûk ji mala bavê xwe derdikeve ji hêla bav an birayê wê ve qurdelaya sor sê caran li bejna bûkê tê girêdan û tê vekirin. Cara dawî girêdayî dimîne.

- Rêgirtin ji rexê zarokan ve ji bo siwariyên bûk û zavê

- Zerfa Diravan
- Belavkirina hinê li keçikan
- Xelatkirina bûk û zavê
- Sersibehiya bûkê

Çend listikên dawetan

Delîlo, Govend, Hurîzî, Sêgavî, Çargavî, Milanî, Çelpik, Şêxanî, Bagîyê, Şemamê, Bablêkan, Şêrîzdîn.

Çend stranên dawetên me***Kî zava kî zava**

Zerî zavana lo zerî zavana

Wey (*navê zavê*) zavaye lo (*navê zavê*) zavaye

Zavakê şêrîn bira ne wey zavakê şêrîn bira ne

Nebêje min nabe wey lo (*navê zavê*) nebêje
mîn nabe

Sehê naçe tavê wey sehê naçe tavê

Reşkula mala bavê wey reşkula mala bavê

(*navê bavê zavê*) xelat e wey (*navê bavê zavê*)

xelat e

Şev reş e neçe civatê lo (*navê zavê*) şev reş e
neçe civatê

Kî zava kî zava (*navê zavê*) bejin zirav eKî bûk e kî bûk e (*navê bûkê*) hine li neynûk eKî berbûlî kî berbûlî (*navê xwişka zavê*) di cî de

werbê

Kî xêlî kî xêlî (*navê birayê zavê*) tifing bi têlîKî nanpêj kî nanpêj (*navekî nêzikî zavê*) tilî dirêjKî firaqşo kî firaqşo (*navê keçikekê*) çeng dirêjKî cilşo kî cilşo (*navê keçikekê*) dest şûnik**Kekê mîno zava**

Şam û Heleb, Diyarbekir kekê mino zava

Şam û Heleb, Diyarbekir ser xêrê be zava

Min bazara bedlê te kir kekê mino zava

Min bazara bedlê te kir ser xêrê be zava

Min ji bîr kir ûtî nekir kekê mino zava

Min ji bîr kir ûtî nekir ser xêrê be zava

Şam û Heleb, Diyarbekir kekê mino zava

Şam û Heleb, Diyarbekir ser xêrê be zava

Min bazara qundira te kir kekê mino zava

Min bazara qundira te kir ser xêrê be zava

Min jibîr kir boyax nekir kekê mino zava

Min jibîr kir boyax nekir ser xêrê be zava

Şam û Heleb, Diyarbekir kekê mino zava

Şam û Heleb, Diyarbekir ser xêrê be zava

Min bazara hamawîla te kir kekê mino zava

Min bazara hamawîla te kir ser xêrê be zava

Min jibîr kir reşî nekir kekê mino zava

Min jibîr kir reşî nekir ser xêrê be zava

Şam û Heleb, Diyarbekir kekê mino zava

Şam û Heleb, Diyarbekir ser xêrê be zava

Min bazara gomlekê te kir kekê mino zava

Min bazara gomlekê te kir ser xêrê be zava

Min jibîr kir qulpik nekir kekê mino zava

Min jibîr kir qulpik nekir ser xêrê be zava

Hine

Hine hine sed û di caran hine

Hinê di teştê kin

Destê bûk û zavê kin

Hine ji hina Mûsilê

Anîn bi elba hasilê

Lêkin destê sorgulê

Xerîbiyê

Xerîb xerîbiyê

Çola Bişêriyê

Xweî li serê te zêriyê

Xerîbka Xwedê me

Dara devê rê me

Hesreta mala bavê me

Xerîb here were

Çêke tayij û bere

Taştê bixwe dîsa here

Xerîb çûye daran

Li xerîb bûye êvaran

Werîs lê bûye maran

Xerîbka ezmanan

Sabûnka kizwanan

Li ser serê gundî û cîranan

Xerîb ez bi gorî

Teştê tijî morî

Xerîb çûye taxa jorî

* Ev stran li ser bûk û zavê tén gotin. Ev stran bi awayê ku li hev vegezin tén gotin. Stranbêj rêz bi rêz dibêje dûvre guhdar dubare dikin. Bi çêlpikan forma wan tê girtin.

Strana dawiyê (xerîbiyê) ji li ser bûkê tê gotin. Yek kes dibêje û ên ditir bi çêlpikan ritma wê digirin!

Rovî û qerraş*

EVDIREHÎM ÇEKÎN

Rojek ji rojan rehmet li dê û bavê guhdaran hebû qerraşek. Qerraş, her roj li aş dişixulî, genimê gel dikir arvan. Qerraş gellekî feqîr bû, cil û kincên wî bi pîne bû. Qerraş her şev, ji hinek arvan nan ji xwe re çêdikir ji bo taştaya sibê.

Sibehekê lê nihêrî, nanê wî tune. Çend sibeh derbas bûn, her sibeh nanê wî winda dibû.

Rojekê qerraş, xefk li ber nan veda. Sibehê hat ku roviyek ketiye xefkê û li ber xwe dide.

Qerraş got:

-Hey roviyê fennek, tu nanê min dibî ha! Êdî bi xwe, ez te efû nakim.

Rovî got:

-Qerraş min nekuje, ezê bibim birayê te heta mirinê.

Qerraş fikirî, eger rovî bikuje wê rovî bimore, lêbelê rovî nekuje, heta mirinê rovî wê bibe birayê wî û wê alîkariya wî bike.

Qerraş got:

-Belê roviyo ez te nakujim, tu ji îro pê ve birê min î, de têkeve ber aş, bişuxule.

Rovî û Qerraş dest dan hev û şixulîn; gelekî şixulîn mecîdiyek wan çêbû.

Rovî çû ser xanî û bang kir:

-Hê hê, 'elba kê heye bala bi min de, ez û birayê xwe qerraş emê bi 'elban mecîdiyên xwe li hev par bikin.

Gelê gundî man şaş, "ev gelekî dewlemend bûne, haya me ji wan nîne."

Malek ji gund 'elba xwe da wan, piştî rovi ev mecîdiyê hanê xist hundirê elbê û ji wan re şand.

Malka gundî, hat gotin:

-Rovî di bin elbê de mecîdiyê we maye.

Rovî bi wan keniya û got:

-Ez û birê xwe qerraş, em bi elban mecîdiyê li hev par dikin, hûn dibêjin mecîdiyek we maye, bela ew mecîdî ji we re be.

Piştî çend roj derbas bûn, rovî dîsa derket ser xanî bû bang kir, got:

-Hê hê, elba kê heye bela bide min, ez û birayê xwe qerraş emê zêrê xwe bi 'elban li hev par bikin.

Malek gundî 'elba xwe da wan, rovî ev zêrê wanî û bi tenê xist hundirê elbê û da wan.

Malka gundî gotin:

-Rovî zêrê we di bin elbê de maye.

Rovî bi wan re keniya û got:

-Ez û birê xwe qerraş em bi 'elban zêran li hev par dikin, hûn dibêjin, zêrik we maye, bela ew zêr ji we re be.

Gelê gundî bawer kirin ku qerraş û birayê wî rovî gelekî dewlemend in.

Rojekê rovî ji qerraş re got:

-Birayê min tu ezêb î, ez dil dikim ku Qîza Paşê ji te re bixwazim.

Qerraş got:

-Rovî qey tu dîn bûyî, em kî Qîza Paşê kî, paşê qîza xwe ma dide me.

Rovî got:

-Tu dengê xwe meke, ezê Qîza Paşê ji te re bixwazim.

Rovî bediek paqij li xwe kir û berê xwe da qesr û qonaxa paşê. Rovî li hizûra Paşê Qîza Paşê ji Paşê xwest.

Paşê got:

-Belê rovî min fam kir tu û birayê xwe gelekî dewlemend in, ezê qîza xwe bidim, lê çend şertên min hene, şerta min a yekemîn qîza min pêwîst e birayê te bibîne, ku ne bi dilî qîza min be, ez qîza xwe nadim; şerta min a duyemîn qîza min di qesrek di nav daristanekê de wê jiyana xwe dewam bike, şerta min a sêyemîn barê heft deve zêr ez dixwazim, ev ji qelenê qîza min e. Eger ev şertên min neyin bi cî ezê serê we bifirînim."

Rovî got: "Belê paşayê min" û ji hizûra paşê rabû.

Rovî serpêhatiyên xwe yên di hizûra paşê de, hemû ji birayê xwe Qerraş re gotin.

Qerraş tirsîya, got:

-Birayo paşê wê serê me bifirîne, êdî em çî bikin.

Çend roj buhurî, rovî û qerraş ji bo hevdiîna Qerraş û qîza Paşê bi rê ketin.

Li ber rîya wan çemek hebû, rovî got birayê qerraş, ka di vî çemî de serê xwe bişo, xwe paqij bike.

Qerraş cilê xwe ji xwe kir û ket avê. Piştê rovî cilê qerraş kir gulokek û avêt çem, piştê kir hewar, got:

-Hewar e hewar e!, zavê paşê, tev bedil û libasên xwe li ber avê çû.

Xulamên Paşê hatin bedil û libasên paqij ji qerraş re anîn û lê kirin, birin hizûra paşê.

Qîza Paşê û Qerraş hevdu dîtin û pir jihev hez kirin.

Piştê rovî û birayên wî qerraş xatir xwestin û ji hizûra Paşê rabûn çûn.

Çend rojên din buhurîn, rovî ji birayên xwe yên qerraş re got: "Hadê em herin nêçîrê"

Qerraş rahişt tîfinga xwe û wî û rovî berê xwe dan çolê.

Lê nihêrîn, di nav daristanekê de qesrek spî heye, rovî got:

-Qerraş, di vê qesrê de, firar û mehkûmek heye, ezê ber bi qesrê de herim, dema ku ez gihîştim qesrê, tu tîfingê du derban berde.

Rovî ber bi qesrê de meşîya...

Mehkûmê qesrê, rovî dît û got:

-Bisekine! Eger, tu nesekinî, ezê te bikujim.

Rovî got:

-Hey bêaqil, esker bi dû te ye, wê te bigirin, têxin heps û zîndan, ez hatim te şiyar bikim.

Piştî gotina rovî, qerraş du derb berra jor da.

Mehkûm tirsîya, got: "Êdî ezê çî bikim?"

Rovî got:

-Were ez te veşêrim.

Rovî mehkûm bir holîkekê, mehkûm raza û rovî hejîk avêtin ser mehkûm, dûre agir bi hejîkan xist, mehkûm di bin hejîka de şewitî û mir.

Piştê, ji xezîna mehkûm, heft barê devan zêr, ji bo guhestina qîza paşê, ji paşê re birin, bûk guhestin û anîn xistin qesrê.

Qîza Paşê, gelek ji rovî hez dikir, qedr û qîmetên rovî gelekî li cem hebû.

Rovî fikirî, "gelo evqas tişt li birayê xwe yê qerraş kiribû, gelo birayê qerraş ji wî hez dikir yan na?"

Rojekê, serê sibehê, rovî, li balkona qesrê, xwe li mirîti danî.

Qîza Paşê, ji bo taştê, hat ku rovî şiyar bike, lê nihêrî ku rovî miriye.

Kir qêrîn û nalîn.

Qerraş hat got: "Çî bûye"

Qîza Paşê got:

-Ma çî nebûye, birayê te yê devliken, camêr, xweşmêr rovî wefat kiriye.

Qerraş, lingê xwe xist bin zîkê rovî got, "wey la miratî" û kir ku laşê rovî bavêje jêr.

Rovî çavê xwe vekir û got "Hey qerraş hey"

Qîza Paşê got:

-Çîiii! Tu berî min qerraş bûy, ez derim mala bavê xwe, ez hew vedigerim, lewra ez nikarim bi yekî qerraş re bizewicim.

Qerraş efûya xwe ji rovî xwest, rovî got:

-Qerraş ez te efû nakim, lê belê ezê jina te ji te re binim, piştê tu hew min dibînî.

Rovî çû hizûra Paşê û got:

-Paşayê min ê xweşmêr, bûka me min xelet fam kiriye, min ji birayê xwe re negotiye "Qerraş" min gotiye "qardaş", lêbelê bûka me min xelet fam kirîye, hûn destûrê bidim, ezê bûkê bibim.

Paşe destûr da, bûk û zava gîhan hev.

Rovî jî çû bi rîya xwe de.

Çiroka min ji we re xweş bû tîfilek şebeş●

FERHENGÂ VÊ JIMARÊ

aferîde mexlûq.

amaje kirin balkişandina ser ramanekê/fikrekê.

angaşt îddîa.

azeb/ezeb kesê nezewicî.

bengîn aşiqê jixweçûyî.

bestandin girêdan.

bêmeceli bêçareyî

bi vî tehrî bi vî awayî.

birijd biinad.

boş (ji bo av û koma merivan) pirr, zehf, qelebalix.

bûkxane mala bûkê.

cemedan cûrekî şaşikan e ku mêr didin serê xwe.

çaxtê kengî, çi wextê.

çox cûreyekî kurkan.

dabaş mewzû, mehbês.

dangî di zivistanan de li dora gundan cihê ku alif didin sewalan.

darêştin (bi jêr ve) rijandin.

derabe hesinê yan kepengê ku pêşiya pace û dukanan diparêze.

Derpêş kirin pêşkêşkirin û diyarkirina tiştêkî.

dirav pere, dirhem.

gerden sitû.

guncav biisabet, guncan.

hejarcan kesê/a ji hêla fîzîkî ve zeif/zebûn

hele şaşî, xeta.

helwest tewr û hereketê kesan.

heyam beşek ji zeman.

hilxepirandin axivîna/derbûna birînan. *mec.*
bibîrxistina tiştêkî.

hincet behane.

koçk koşk.

koh çiya, kov.

kolemişk axa ku xilt/koremişk ji qula xwe dikole û li ser devê wê kom dike.

kulav cil û binraxên ku ji hiriyê çêbûne.

leheng qehreman.

livîn hereket kirin

merg mirin.

mergistan cihê mirinê.

misoger qetî.

mitrib/mitirb qereçiyên ku di dawetan de li dahol û zurneyê dixin.

nemaze xasma, nexasim.

next qelen.

nijde seriye, birrek ji leşkeran.

niştecih kesên ku li welatekî ewirîne/sekirîne.

nivîn cilên ku meriv di nava wan de radizên.

panav plato, li çayan çihê pehn/rast.

papûr cade.

pêpeling pêlik, derece.

peya mêr.

pisaxa kurên ku ji nijada axayan.

qerraş aşvan.

qeware hecim.

resikîn gîhaştina/şînbûna gîha û daran.

rihal cihêzê bûkan.

sazûmankar organizator.

seh kûçik, seg.

serborî macera.

seridîn simildayina teneyan (ceh û genim û hwd.)

serrût kesê/a ku tiştêk nedaye serê xwe.

sevîlk şerbik, cêrê biçûk ê ji bo xistina avê.

spêhr/spihr asîman.

şemirandin terikandin.

şitexalî axaftin, peyivîn

têbînî jêrenot.

têgih îstilah.

telîs çewalên mezin ên ku ka û gîha dikevê.

ten laş, cerm.

tov tixum/toxim.

vekit rastnivîs, îmla.

wêjeyî edebî.

xêl kesên ku ji bo anîna bûkê kom bûne.

xezam pelê daran ên zerbûyî.

xor roj.

xwedriste kesê ku xwe bi xwe, xwe perwerandiye/xwe gihandiye.

yelmûm çira, meşale.

zareve kirin 1. teqlidkirina bi deng, dublaj 2. teqlîd kirin.

zerya derya, behr.

zivir xeramokî, diji hilû

Ji refên Nûbiharê!












Foto: Yasin Küçük
Ji mozaikên Helepli Bahçeyê/Riha